# TILÛRÊ BÊGANE

*Redwanê Alî*



# TİLÛRÊ BÊGANE

*Redwanê Alî*

*Diyarî ji hevalên xortanî û zaroktiya min, Bavê Nazê û Bavê Goran re.*

# TİLÛRÊ BÊGANE

**ÇÎROK**

*Redwanê Alî*

**WEŞANÊN WELAT**

**Stockholm 1991**

**Weşan: 4**
**TÎLÛRÊ BÊGANE**
**Çapa Yekem**

© Redwanê Alî
**Pergela berg û rûpelan: N. Kirîv**
**Wêneyê berga pêşîn: Dilower Mêqerî**
**Çap: Nya Wiking Tryckeri AB, 1991**
**ISBN: 91-971254-6-6**

## NAVEROK

*Tilûrê Bêgane* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 9
*Muhra Muxtêr* . . . . . . . . . . . . . . . . . . .76
*Civîn* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .81
*Resûl* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .89
*Seyro* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .98
*Xij-xijoneko* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .106

# Pêşgotin

Macir û macirtî di çand û edebiyata gelê kurd de û nemaze di ya devkî de, şexsiyet û mijareke taybetî ye ku bi sedsalan hatiye bikaranîn. Di sitran, destan û çîrokên gelêrî de, meriv viya gelekî vekirî dibîne. Macirî, ji sedsalan û vir de ye ku di jiyana xelkê kurd de xwediyê beşekî xas e. Xêrnexwazên gelê kurd, ji bo ku wan bipişêfin û wenda bikin, çi rê û metod hatine hişê wan, wan ew bi kar hanîne. Ku dîrok rastiyê li xwe deyne, ev gotinên min ê jî çewt dernekevin. Ji ber vê yekê ez ê çêlî hemû rê û metodên xêrnexwazên gelê kurd nekim. Na. Lê ez ê tenê li ser metodekê bisekinim. Dûrxistin: Ji hemêza dê û yarê, ji germiya malbatê, ji danûsitandina gund û eşîrê, ji kultura welêt... dûrxistin. Ev di rojên berê de jî û îro jî her bi kar tê. Ev polîtîkayek e û li her deverê dunyayê jî bi kar tê. Lewra li gor wan dewletên xwediyê vê polîtîkayê, ev metoda ha metodeke maqûltirîn e û nemaze li hemberî rewşenbîran bi kar tînin. Rewşenbîrên ku bi ber vê xezeba dewletên xwe dikevin, ji war û welatê xwe dûr bê pî û bask di xwe de dişewutin û ji bêgavî tiştina dikin. Karûbarên polîtîkî, edebî,

kulturî dikin û li ber xwe didin. Pirî caran jiyana dûrxistinê li ser hunermendan bandoreke geleke hêja vehewandiye û ev bandor jî jê re bûye sedem ku berhemên hêja bide afirandin.

Lê ku em vegerin ser kurd û jiyana dûrxistinê, em ê têbigêhîjin ku jiyana dûrxistina me û xelkê jî ne wek hev e. Du cudayiyên girîng hene: Yek, wek entelektuelekî, wek karmendekî an jî tenê wek hunermendekî, kurd ji welatê xwe ne hatine dûrxistin. Pirî caran ew tev zarûzêçên xwe, wek malbat, wek eşîr ji warên xwe bûne. Ya duyemîn jî, ji bilî çend berhemên kevn û bi dizî, kurd ne xwediyê lîteratureke niviskî ne. Wan nivisandina zimanê kurdî li derveyî welatê xwe, li jiyana sirgûnê (exil) ava kirine. Ku em li ser jora Kurdistanê bipeyivin, ev gotinên min ê baştir ciyê xwe bigire.

Lîteratura kurmancî îro li derveyî welêt di dema xwe ya geştirîn de ye û şax dide. Herçiqas di vê demê de meriv pîvanên berhemên hêja di lîteratura kurmancî de nebîne jî, ew berhemên ku heta nuha derketine, bi me didine zanîn ku hêviyek heye. "Tilûrê Bêgane" vê mizgînê dide meriv. Wek stil, form û hûnandina xwe mizgîniyekê dide meriv ku ew ê bi kurmancî jî berhemên hêja derkevin.

Redwanê Alî bi hunermendiya pênûsa xwe, bi awayekî realîst jiyana maciriya me kesên ji welêt dûr, di formeke noveleke modern de bi lêv kiriye. Ji ber vê yekê jî, niviskar hêjayiyê hemî giramî û berhema wî jî hêjayiyê hemî pesindayinê ye.

Ku di pêşerojê de dewleteke kurd ava bibe, instîtut û akademiyên kurdî dîroka gelê kurd binivisînin, ew ê beşekî xweser jî li ser maciriya kurd binivisînin: Di vî beşî de ew ê ciyekî taybetî bidin "Tilûrê Bêgane" ku tê de zehmetî, qiriktalî û dijwariyên jiyana maciriyê di şexsiyeta «Mircan» de bi ruh û can bûye û hatiye zimên.

M. Alî K.

*"Di jiyanê de meriv tenê tiştê ku jê tê dike,*
*yên mayî ji xwestokên xwe bi xwe re dibe gomê."*
**Îvan Turgenyev**

# TILÛRÊ BÊGANE

## - I -

Li ber duriyaneke ji duriyanên jiyanê westiyayî, baskşikestî, rawestiya ku hilma xwe bîne ber xwe. Çiqasî bi endîşa xwe dûr nerî û bilind rêsa, ewqasî jî asoyê jiyana serfiraz dûrtir ket û bilindtir bû... Pêwîst bû ku li ciyê xwe nemîne. Pêwîst bû ku bide ser rêyekê ku çerxa demê di ser re derbas nebe. Lê jiyan! Ev hilovka ku bi milyonê salan di dil û hişê merov de meyaye, qet tu kesî hemû rewiştên dahatûyên wê bi nav ne kirine. Mircan, ne bi dil ne bi can rêya bêganetiyê, ya ku li ser wê, asoyê xwe di rewrewkek şikestî de didît, hilnebijarti bû. Ew, weke qirş û qafê mirî, pûç û bêgiyan, li ber bayê xezeba bahoza çavsoriyê hilweşiya bû û li zemîneke bêgane termê wî hişk bû bû.

Zuwabûna wî ne weke zuwabûna giliçeke dara mirî bû û

çilmisandina wî ne weke çilmisandina şitleke biçûk ku tu wê ji erdekê biguhêzî erdekî din. Reh û tamarên wî 32 salî bûn, zû bi zû rewa erda bêgane û xerîb ne diçû ser wan. Ew weke dareke bejî ku di rezekî bêxwedî û bêcenan de mezin bû be; her ku darê, bi zagonên xuristî rehê xwe berdida, digîşt û berî xwe digirt, bahozekê ew ji qurm ve dihejand û li ber xwe dibir. Lê weke her ruhberekî jiyanê jî, jîndariyê ew şîn dikir û berxwedana tamaran bi kotekî dom dikir.

Warê nû, jiyaneke nû... û zagonên civakek nû. Ji nû ve lerz û jen di zelûltiya çavan de meyand. Û weke ku di her civakan de, sînorê danûstendinê, hevaltî û hogirtiyê, mervatiyê, piç bi piç zelal û kifş dibe, di vê civakê de jî, li ber çavên wî hişk hatin kişandin û eşkere bûn. Mêvantiyê jî sînorê xwe derbas kir. Dawiya dema rawestanê hat û demeke hişk weke risasê giran û sar dest pê kir: «Ji 10 heta 15 rojan tu ê li hotêla penaberan biqedînî, belaş bixwî, vexwî... Dûre tu ê biçî bajarekî, şeş mehan ziman hîn bibî... Dûre tu ê bibî wek her endamekî vê civakê! Êdî tu û zanebûna xwe, tu çawa dijî, bijî. Dayîra Fransa ciyê biyaniyan rewş weha pê dan naskirinê.

***

Sibeha dawîn bû li Parîsê. Mircan, weke her sibehên van deh rojên dawîn, vê sibehê jî ji xew rabû li ser dengê xirecira zarokên diwaserê xwe yên ku bi wan re li ser qatekî dijiyan. Lê vê sibehê, bi xilafî van her deh rojan, gava ji xew rabû, mereziya zarokan qet qehr pê re çênekir. Pêşiyê bi qasî bîsteke dirêj fikirî, dûre bi dengekî nizm di ber xwe de got: «Zagonên jiyanê çi ecêb û seyr in! Heger ne dengê van zarokan bûya, belkî ez ji xew ranebûyama û negêhama ser wexta çûyîna bajarê xwe?!»

Gava Mircan ev gotin got, di ber xwe de bi xwe keniya û gotinê xwe yên ku her sibeh van çaxan digot, gava ji gurmînî û qajewaja zarokan şiyar dibû, anîn bîra xwe. Weke ku xwe sûcdar bibîne ponijî: «Min ewqasî qehra van zarok û dê û bavê wan hildihanî, va ye îro bi kêrî min hatin... Ma kî dizane ku çi ji jiyanê re divê û çi navê?»

Sibeha dawîn bû li Parîsê... Û sibehên rêwiyan kin in, lê tijî

endîşe û xeyalên sivik in. Sawa ku dilê Mircan dilerzand, saweke taybetî bû. Vê sibehê, çawa biliviya, çi bikira li kelemên van çend rojên dawîn rast dihat, yên ku weke sitiriyan di laşê wî re diçûn. Tiştê biçûk û mezin, girîng û ne girîng, hêja û ne hêja hemû tev radibûn û ew taromaro dikirin. Ji nişkê ve dengê operloyê di hotêlê de kire zimînî. Ramanên bi sitirî birî û ricifeke sivik xiste nava wî: «Kesên ku wê herin Babilonê, ji kerema xwe re seet li nehan, bê derengî dakevin eywana qatê yekemîn!» Bi zimanê inglîzî û fransî operloyê kire zimînî.

Gava dengê operloyê rawestiya, Mircan çeng bû û çik li rasta odê sekinî û bi dengekî bihîstî ji xwe re got: «Lo hema ez ê ji van zarokan xelas bim, hema çi dibe bila bibe. Li Babilonê ez ê devê xwe li gemê bixim, ez nema xwe bi yek mirovî didim naskirin!» Bi lez xwe tev kir û bêyî ku taştê jî bixwe, daket eywana qatê yekemîn.

Eywan vala bû. Tu kes hîna ne hati bû. Mircan li seeta xwe nerî, dît ku ji wexta çûyînê re hîna nîv seet maye. «Wa... Ez navqetiyayî bûm, law!» Di dilê xwe de got û hêdîka bi şermezarî li ciyekî, di qoziya eywanê de rûnişt. Mirês û tevgera wî bû bû mîna yekî beziyayî û qutifiyê ku xwe ji xelkê vedize. Wî serê xwe ranedikir, ne dixwest çav li kesî bikeve ji van yên ku di van deh rojan de nas kirine. Ne dixwest silavê li wan bike, ne jî xatir ji wan bixwaze. Di qoziyeke eywanê de bêdeng merisî. Lê di hinavên wî de hewasê bi sitirî, lerz û jena bêgane aloz vedan.

***

Wexta ku roja pêşîn, dostekî Mircan ew gihand vê hotêlê, di ciyê ciyîn de xatir jê xwest, bi şûn de vegeriya û çû, Mircan xwe wekî dergevanekî xam di nav pêlên deriyekî bê ser û bin de dît... Wê çaxê jî jinikek zerhimî, hestî û çerm, çavpan, dirvê vîetnamiyan pê diket, li ber derî kaxezên wî ji dest girtin, derbasî odekî bûn, mifteyek û sê bilêtên keskê biçûk anî, da dest wî û bi îngilîziyeke şikestî ew serwext kir:

- Oda te li ser qatê hefta ye. Jimara wê 13 ye, -destê xwe ber bi derîyekî ve kir- Ji wir jî pêwîst e ku tu bi asansurê hilkişî... yekî welatiyê te, berî te di odê de ye. Ew ê sistema jiyana

vir bi te bide naskirin.

Mircan giya negiya van gotinan bibihîze, dît ku jinika hestî û çerm pişta xwe dayê û weke robot bi meşeke hesinî jê dûrket.

Mircan piçekî li ciyê xwe rawestiya û li ser gotina jinikê «welatiyê te» fikirî, lê fam ne kir ku mebesta wê çi bû. "Gelo wê ji xwendina kaxezên min fam kir ku ez kurd im? Aya mebesta wê ya ji «welatiyê min» ev bû ku ew jî yekî wekî min kurd e, yan yekî ji welatê ku ez jê têm, e?" Çimkî bûyerên bi vî rengî gelek caran pê re derbas bû bûn, lê bêyî ku bigêhîje tu encaman, ji ciyê xwe liviya.

Li bendî asansurê gelekî ne ma. Lê gava deriyê wê vebû, qîjewîja şeş heft zarokên gemarî, pêxwas, potretilî li pêşiya wî bilind bû. Gava dît zarok di hundirê asansurê de xwe didin hev ku ciyê wî di nav xwe de çêkin, Mircan jî têgêhîşt ku ew dernakevin û berê wan ne li tu deran e. Û wexta dît ku her yekî ji wan bi awakî dixwaze destê xwe bigêhîne bişkoka qatê heftan, fam kir wekî ew ê bibe diwaserê wan. Zarok bi zimanekî dipeyivîn, Mircan tiştek ji wan fam ne dikir, wek ku tirkî, farisî û erebî tev li hev bikin!

Li ser qat, ireaşa zarokan tev dengê mûsîqake erebî pir bilind bû. Te ê bigota tu li bazareke rohilat î. Di nav wê ireaş û dengê bilind de, Mircan li oda xwe geriya. Gava gêhîşt ber deriyekî ku hejmara 13an li ser e, têgêhîşt ku bêfêde ye li derî bixe: Dengê musîqê bi sitranên erebî ji wir dihat. Piçekî derî dehf da, dûre sê caran lê da û gava dengê «Eywa» bilind bihîst, derbasî hundir bû...

Xortekî li dor 30 salî, çavzer, bi bejnûbal, tena «şeyalê» bin cilan ji ser qaryola xwe rabû, dengê teypê piçekî nizim kir û destekî pan û zivir, bi xêrhatinî dirêjî Mircan kir û bi erebiyeke sade got:

- Ehlen we sehlen, inşeleh hema birayê me ereb e?!

- Ez erebî zanim! -Mircan bişirî û bi angoya gotina xwe ya taybetî serê xwe piçekî hejand.

Xortê çavzer, weke ku ji gotina Mircan ya ewil, li tîna bixêrhatina xwe poşmam bibe. Bi mebesta tênegihiştinê, mat-

mayî pirsî:

- Ma tu ne ji Iraqê ye?

Mircan ji texmîna diwaserê xwe fam kir ku wî li ser rewşa kesên «bi erebî zanin» lê bi jêza xwe ne ereb in, tiştina zane. Lê yekser xwest xwe ji rewşa «bersivdar» derxe û wî têxe bin darê pirsên xwe:

- Ez kurd im!... Navê min Mircan e!.. Yê te bi xêr?

Yê çavzer piçekî serê xwe yê bi mijûl xiste ber xwe û bêyî ku li çavê Mircan binêre got:

- Ehlen we sehlen ya exî. Em birayê hev in! Navê min Şadî ye. Tiştê girîng ew e ku tu erebî dizanî!

Dilê Mircan piçekî şeetî, gava piştî hildana navê netewa xwe ji diwaserê xwe bihîst ku «ya girîng ew e ku tu erebî dizanî» û pêre pêre gotina jinika robotî «welatiyê te» di serî de xulxulî. Lê dawiya vê şeetandina dilê xwe, bi xwe re gêhişt wê baweriyê ku zû bi zû û rastiyên jiyana xwe pê nede naskirin.

Çarîkek derbas bû ne bû, Mircan û Şadî, weke ku teqla hevdu texmîn dikirin û li xêzên pêşî yên karakterên hevdu rast dihatin. Her yek ji wan teqnekê rawestiya, mîna ku li ser wan pirs û gotinên hindikî ku ji hev bihîstin, difikirin. Ji nişkê ve, qîjewîja zarokan li ser qat bilind bû û gurmegurma wan nêzîkî derî hat. Şadî bi bihîstina dengê wan, weke rimekê çeng bû, destê xwe yê zivir û pan bi kulmikî heta jê hat li masa pêşiya xwe xist û bi lez dengê teypê heta dawîyê bilind kir û weke ku bi int rabû, wiha jî bi şida xwe avêt ser text û bi dengê bilind mîna di sûkên rohilatê de ban dikin, bang kir:

- Yaho, ma ev jî jiyan e? Kerekî turk xistine oda kêleka me, heft heyşt zarokên wî hene. Ne bi şev û ne bi roj, tebatî nakeve wan, dengê wan ji guhê me dernakeve... Direqisin, distirên, digrîn, hildiperikin dîwaran... Qat hilweşandin ev yên ha!

Di wê rojê de Mircan gelek tişt li ser sistema jiyanê, penaberên hotêlê ji Şadî nas kir. Du sê caran bi wan bilêtên keskî biçûk, ew û wî, bi hev re çûn çeştxanê, nan xwarin... Mircan bala xwe didayê ku Şadî qet behsa ûştê penaberiya xwe nake û dema ku gotin nêzîkîyê li vî babetê dike, ew bi awayekî eş-

kere xwe ji ber dide alî û naxwaze bipeyive. Pêşiyê bi xwe re ket gumanan û texmîn kir ku «hîna wî baweriya xwe bi temamî bi min naniye». Lê ne tevgera Şadî û ne jî gotinên wî rê ne dida ku wêneyekî serast di hişê xwe de li ser rewşa wî û ûştin penaberiya wî çêke. Şadî, ji xeynî babeta «Qîjewîja zarokan» û bê edebtiya dê û bavê wan, li ser tu tiştî dirêj qise ne dikir.

Rojekê, Mircan di rêza çeştxanê de bû, Şadî hat cem sekinî û bi melaqî bişirî:

- Rêz dirêj e, ez naxwazim têkevim dawiya wê, ew ehmeqên bêhiş li dawiya wê ne. Ez naxwazim çav li wan kevim!

Mircan bi nermî pirsî:

- Ma tiştek di navbera te û wan de çêbûye?

- Na, lê ez zanim ku gelekî bêcir in. Ev zêdeyî meheke wan li vir qediyaye. Wan dişînin kuderê, qayîl nabin... Berî ku tu werî vir, bi heftayekê keti bûn greva birçîbûnê, ji ber ku dayirê ew dişandin bajarekî jê re dibêjin Babilon. Lê wan qebûl ne kirin û ne çûn... Hevalê wan li vir, li Parîsê pir in, wan hîn dikin ku bi tu deran ve neçin, ji bo ku wan li Parîsê bihêlin.

Şadî bi dengê nizm gotina xwe dirêj kir, lê Mircan piştî bihîstina navê Babilonê bi wan reweştan, nema bala xwe da gotina wî. Ew di rewşa xwe ya dahatû de, li vî bajarê ku kes pê qayîl nabe, fikirî. Lewra wî di van du sê rojên pêşîn de, ji berpirsiyarên hotêlê nas kiri bû ku wî dişînin vî bajarî. Piştî bîstekê, bi ser -wan yên ku Şadî qal dikir- de zivirî û bi zivirandina xwe re, çavê wî û du xortan li hev ketin. Mircan di jiyana xwe de, bi sedan dêmên bi wan reweştên çiyayî dîti bû. Ji her gundekî Kurdistanê merov dikari bû qeflek xortên bi xisletên wan bi hev de: Dêmên bi ser gewrayê ve, bêvilên beranî û çavên hingivîn bi nerînên matmayî û xemsar...

Mircan du sê caran bi nerînên hûr û awirên nasiyê li wan xortan nerî û bêyî ku şeetandina dilê xwe bi kurdatiya wan diyar bike pirsî:

- Ma ev yên ha, merivên wan zarokên qatê me ne?

- Na! Lê gişt weke hev in! bersiva xwe kurt da û mîna ku di vî babetî de jî nema meraqa wî ya qisekirinê hebe.

Li çestxanê, ew herdu xort hatin ser maseyeke nêzîkî Mir-

can û Şadî rûniştin. Serî bêhnekê, çavê Mircan û yekî ji wan li hev diket. Carekê ji wan yekî serê xwe ber bi Mircan ve kir:

- Tu bi kurmancî dizanî?

Mircan bişirî, lê berî ku lê vegerîne, dengê Şadî ji kêleka xwe bi dengê nizim bihîst:

- Dest pê kirin! Çêtir e ku tu li wan nenêrî û bi wan re nepeyivî!

Mircan awirên matmayî di Şadî dan û bêyî ku mana şîreta wî fam bike, di dilê xwe de got: "Ev ê serpan, pozê xwe dixe îşê min û nigê xwe zêdeyî xwe radide!" lê bi beşerek xweş li xwediyê pirsê vegerand:

- Erê, ez kurmanc im! Hûn xelkê kuderê ne?

Yê kêleka wî, ku hîn ne peyivî bû, bi dengê bilindtir got:

- Em xelkê Kurdistanê ne! Madem te gotinê me bi kurmancî bihîst, ma hewce ye ku em hîna ji te re bêjin, em ji kuderê ne!

Ev dengê bilind bi Mircan hinekî naxwoş hat, dengê ku xort di nav diranê xwe yên şikestî re «s» dikir weke «th» ya inglizî, nexasim li vî ciyê giştî. Lê di dilê xwe de got: «Kurmancê me ne, gundî ne, weke xwe derin!», nerîna xwe li ser wan kêm kir û xwarina xwe xwar.

- Bira! Ev bênamûttê bi te re ne kurd e, ha! Haya te jê hebe! -deng ji hêla wan herdu xortan, dîsa bilind hat.

Mircan bêyî ku serê xwe rake, dengê diranşikestî ji lefza tîpa «s» nas kir. Lê weke ku tu wî di nav ava sar de bikî, mûyê laşê wî rabûn û nema dizanî bû ku ew ê çi lê vegerîne. Piştî bîstekê ji rawestanê, piyê xwe piçekî hejand û li hêla wan nerî, lê bêyî ku çavê xwe têxe çavê wan. Xwarin nema di ber de diçû û guhê wî man miç.

- Mecîd! -xortê din, bi ser yê diranşikestî de rabû- tu tim bi vê bîhntengiya xwe şaşiya dikî!

- Hevalê Felît, ne şaşî ye! Xortekî kurd e, bila hifza xwe ji vî bênamûttî bike! Ew, wî natt nake!

Mircan di gotinên van xortên bi navê «Mecîd» û «Felît» de mijûl dibû û li kêleka xwe, di bin çavan re, li tevgera Şadî dinêrî. Piştî bîstekê, Şadî sêniyên xwe nîvco danîn ser mesefê

û weke mar, bêdeng şemitî û hêdîka derket.

Mecîd û Felît hatin ser masa Mircan, xwe bi hev dan naskirinê û dûre wan Mircan bi xwe re birin oda xwe û çîroka Şadî jê re, ta bi derzîyê ve kirin. Mecîd digot: «Em li Îtalyayê bûn, kar bi dest me ne diket. Me rêberek dît. Bi eslê xwe tirk bû, serê yekî, me 300 dolar dayê ku ew me bê vîze derbasî Fransayê bike. Berî wada hatina me, bi du rojan, yê rêber hat û ev bênamûs anî cem me. Got: «Ew jî kurdekî weke we ye, asîmîle bûye û bi kurdî nizane, ew ê bi were dakeve Fransayê!... Ne wî bi kurdî dizanî bû, ne jî me bi erebî zanî bû, me ji hev fam ne dikir. Du rojan li cem me xwar, vexwar... û gava em hatin vir, me poxê wî dît!...»

Gava Mecîd dipeyivî, Felît jî gotinên wî rast dikir, yan jî mana wan diyar dikir. Gava gêhişt «me poxê wî...», weke bêje «ji vir û weha, nema ji pispora min e» û got: bera îcar hevalê Felît ji te re li ser fen û fûtê wî bêje.

Gava Felît dest bi peyvê kir, Mecîd rêzek taybetî jê re girt û rûçikê xwe kir weke guhdarê çeleng. Gotina wî jî tu carî ne birî. Felît bi giranî dest pê kir: «Em kurdên Kurdistana rojava, şoreşgeriyê çavê me vekiriye... Insan, çiqasî biçûk, bêhêz û bêhêvî bin jî, em şoreşgeran ji wan çêdikin... me zanî bû ku Şadî ne şoreşger e... em pê ne xapiyan, lê me got, kurdekî weke bi milyonan kurdên asîmîlekirî, em ê berê wî bidin rêya xebata miletê wî... Li Parîsê, hevalekî li dernekê bi erebî zanî bû, ew kişf kir... lê me got hema ne casûs be, ker be jî em ê wî bînin ser rê... Ereb be jî ne xem e! Tirk jî û erebê baş jî ji bona azadiya Kurdistanê, xwîna xwe dane!.. Gava em bi hev re ketin greva birçîbûnê -ji ber ku em hemû avêtin gundekî biçûk, me ne xwest em herine wir- ew jî bi me re rûnişt. Lê nefsdenî bû, bi dizî diçû xwarin dixwar û li dor keçikan digeriya... Ku ne ji me bûya, ew niha ji zû de avêti bûn kampekî ku kûçik jî lê najîn.. Ew kûçikê kulûjayê!...»

Mircan wê rojê heta derengî şevê bi Felît û Mecîd re ma. Gava hat oda xwe, dît ku Şadî weke hebaneke mişt, zengiriye... Serê wî di ber de ye û dûmana cixarên wî, hundir dagirtiye... Bêdeng cilê xwe danî û ket nav ciyê xwe, lê ji wê rojê

de, te ê bigota Pierre û Peterê Erinbûrgî(*), bi hev re peyman danîne, û şerê xwe ji bîstekê dispêrin bîstekê.

Mecîd û Felît, ji roja ku Mircan nas kirin pê ve bû bûn dirdirik... Her cara ku reşê wî bidîtana, li hotêlê, li derve, li çestxanê... xar dikirinê, didan tengalê û şîret lê dikirin... «Intelektuelê kurd gerek weha be... û gerek ne wusa be!...» Nema dikarî bû çarîkekê jî bi tena serê xwe bima. Û piştî her derketinek yan jî axaftineke bi wan re, Mircan di çavên rûniştvanên hotêlê de hîn bêtir dihat naskirinê. Kesê ku fortê Mecîd û Felît bihîstin, nas kirin ku: dostê wan, Mircan, «doktor e», «kurdolog e» û deh salan li Bulgaristanê xwendiye!... heta yên ku bi kurdî û tirkî nizanî bûn jî ev herdu gotin li ser Mircan fam kiri bûn...

Mircan di van deh rojan de bû bû weke çûkê şilbûyê ku hêlîna wî li ber lehiyê çû be... Hundir ne dihat tehmûlkirin û li derve şîretan guh jê biri bû. Di odê de, ji bilî roja dawîn ew jî piştî çûyîna Şadî, wî rojekê jî nikari bû, ne serê xwe rakira, ne jî dengê xwe bibihîsta.

***

Mircan di rûniştina xwe de qerimî, lê xirecira zarokan û dengê wan; hilma dijminatiyê, şîretan, hesretên deh salên xerîbiyê, bêriya welat, dê û bav, heval û hogirên zaroktiyê... ew ker û gêj kiri bûn.

Di bin çavan re dinêrî û didît ku di eywanê de, hin bi hin

---

*(*) Du lehengên çîroka Qelûna Leşker e. Ev çîrok, çîroka Ilya Ehrenburg e (1891-1967). Di vê çîrokê de Pîerre'yî fransî û Peter'ê almanî di şerekî ji şerê Cihana Yekem de rastî hev tên. Lê ew şer nakin. Qelûna titûnê dibe sedema rawestina şerê navbera wan. Lê weke du dijminan baweriya wan bi hev nayê. Her yek dixwaze "beriya mirina xwe" hilmekê ji qelûnê bêkêşîne. Berê tivingên xwe ji ser eniya hevdu nadin alî. Piştî ku hilmên dirêj ji qelûnê dikêşînin, wê qelûnê dîsa bi tirs davêjin ber hev. Piştî ku dûmana qelûnê dibile jî, bi mana ku bi hev re şer nekin, ew her qelûna sar ji hevdu re davêjin.*

hevalê «oxira» vê sibehê pir dibin. Ji peyv, tevger û dêmê wan xuya dibûn ku dudu tirk in û dudu jî polonî ne; jin û mêrekî vîêtnamî û yekî afrîqî ye.

Ji nişka ve dengê jinika «robotî» di eywanê de hat, bi îngilîzîyeke şikestî: «bidin dû min!» got û berê wan da otobuseke ku li derve, li hêviya wan rawestiya bû.

Gava otobusa wan ji ciyê xwe leqiya, Mircan di rûniştina xwe de bû bû weke kevirê ku tu bavêjî binê bîrê!... rêyeke nenas; erdekî nenas, berê wî bi ciyekî nenas ve û bi hevalên oxireke nenas re... tu li ku û Babilon li ku!

## - II -

Di xortaniya xwe de, Mircan weke lokê hêc bû, ne barê giran, ne rêya dûr û dirêj çavê wî dişikand û ne jî serê wî dixiste ber wî. Nerîna wî hertim li asoyê jiyana serfiraz bû...

Hîna neh deh salî bû, kevkanî, qewsik, tîr û kevan bi destê xwe çêdikir û zarokê di çaxa xwe re hînî şer dikir. Ji wan re digot: «Divê em xwe hînî şer bibin, û gava em mezin bibin, em ê herin alîkariya Berzanî bikin!» Û di nav hevalên xwe de, di gel ku ne yê herî bi gewde û qelafet bû, lê hertim eyan bû, rêber bû. Carina, gava ku dengê diya xwe ji nav dengê pîrekên taxê bi pesn û fortê xwe dibihîst, erdê ew tehmûl ne dikir; dayikê digot: «Mircanê min, weke teyrê baz e, qelafet biçûk e, lê rêbazekî jîr e!»

Ew di her tiştên xwe de, ji zarokên taxê kifş bû. Ji ber ku di maleke niştimanperwer de rabûbû, çîrokên li ser şerê Berzanî, ji giştan bêtir dizanî bû; ji giştan bêtir sitran û sirûdên netewî zanî bû, û ji giştan bêtir dizanî bû awayê zilamê mezin û xwedî peyv bike. Di malê de, Mircan, mezinê xûşk û birayên xwe bû, yê herî delalî bû... Piştî ku diya wî ew anî, demek dirêj nexweş ket û ji zarokan qut bû. Gava Mircan şeş heft salî bû, hertim diya xwe di nav livînên nexweşiyê de didît. Û carina gava ji lîstikên xwe dihat, dilê dê rehet ne dibû ku ne bi destê xwe xwarinê dayne ber û wî têxe bin baskê xwe. Dê di ber re davêt û digot; «Teyrikê min î baz, ez bi qurbana çavên

te yên reş bim, xwe wilo gelekî qure neke, tu ê çavînî bibî lawê min!»

Dengê Mircan ji piçûkanî de xweş bû. Wî gelek caran tenbûrên teneke, bi destê xwe çêdikir û tev zarokan distira. Hertim jî, gava mêvanên wan dihatin, jê dixwestin ku ji wan re sitrana «Şev Çû» yan jî «Welatê Me Kurdistan e» bêje. Lê heta ku Mircan navlêhildanek ji diya xwe nebihîsta, sitranên xwe ne digot. Carina jî pê naxoş dihat gava ji hin mêvanan gotinên weke: «lawê Inê ye, heta dê nebêje, ew nastirê!» dibîhîst.

Mircan 12 salî bû gava diya wî ezîzê ber dilê xwe veşart! Xalê Mircan, ji birayên diya wî, yê piçûk, di şerê 1967an de (şerê Îsraîl û Ereban) hat kuştin. Mircan ji hemû tevgera xalê xwe, ji bilî ku li tenbûrê dixist, tiştek ne dihat bîra wî. Gava ku ilmê mirina wî jî hat, ji gotinên miezîyan, xirecira çûn û hatinê... tiştek fam ne dikir. Tenê rondikê dê, çavên wê yên hertim şil û gotinê wê yên şînê ku li ser birayê xwe digot, dilê wî dêşand û ew xemgîn dikir. Ew gotinên ha, weke ku tu bi şîşeke sor li ser hişê Mircan dax bidî, tu carî ji bîra wî ne diçûn. Dê wê çaxê digot:

- Xwedêyo!... Xwedêyo!... Xwedêyo!...
Bi van çavan çav qeyas kir;
û ji nav kûştiyên Filistîna şewitî,
Qiloçê egîtê mala bavê xwe,
Ji boqê sinbêla nas kir!
Heyfa min rebena Xwedê nayê,
Li sinbêlê li axa xerîb veşartî,
Heyfa min tê, li zengeloka dengê şêrîn,
Bi sitranên Berzanî,
Ji mala bavê min biliyaye...!

Gava Mircan mezin bû, riya xwe bi awakî xuristî nas kir. Wek çawa tu kes teyr û tilûra hînê firandinê nakin; masîya hînê sobayî û avjenîyê nakin... Wiha wî jî, ciyê xwe di nav refên welatperwerên dema xwe de girt. Lê, hêcbûna ramanan, çirûska hiş; jîrbûn û tîna agirê niştimaniyê hertim li kendalên miçiqî rast dihatin.

Wan salên ku Mircan têdigihîşt, xortanîya wî li hev werdigeriya û zanabûna wî dimeya, qada xebata welatperweriyê li hemû perçên Kurdistanê bû bû çamroxeke bêbinî. Dengê hiş û dilsoziyê di bin nîrê dijminan de, bêhêvî bû bû. Partiyên polîtîk roj bi roj pir dibûn; zelaliya bîr û baweriyan jî pê re kêm dibû. Û nifşê nû, weke masiyên çemê miçiqî, di nav girikê de can didan. Meydan bû bû meydana fenekan û keysperestên jênîksipî. Kurd bi xwe biliya bûn. Tenê berxwedaneke piçûk li Kurdistana bakur, bi kotekî berdewam dikir. Mircan û çend heval û hogirên xwe, çiqasî xwe di ber de radikşandin û hewl didan ku tev wê bibin, lê ji bilî gilî û gazinan di firtona girikê de li ser wan qehremanan, ne dibihîstin.

Bi wî awayî, dîwarên ji pola, roj bi roj li dora lokê hêç dihatin danîn û gava ku jiyan jî nû nebe, merov li şopa xwe ya kevin rast tê. Di wê demê de Mircan, ji nû ve li raman, nerîn û karê ku di zaroktiya xwe de dikir, vegeriya. Bi «lîstika şer» biliya û ji xwe re got: «Ez teyrê baz im, per û baskê min hene û min xwe di nav garana gêjan de xîya kiriye!»

Bi wê dilsoziya zaroktiya xwe, çend hevalên wek xwe li dora xwe kom kir û rêberiya wan kir. Ew û hevalên xwe bi şevan ranedizan, bi çolan diketin, xwe bi çek dikirin... Lê, ew ê şerê kê bikira û yê kê nekira. Dijmin pir bûn, hêz, merîfet û zanebûn kêm bû. Pê re ne gêhiştin ku serê xwe rakin, dengê xwe belav bikin, navê «eşqiya» bi dû wan ket. Û dûre ji hev belav bûn; weke noka ku tu li kevir bixî yek ji wan li ser hev ne man. Hinek ji tirsa reviyan Europayê; hinek li mala xwe rûniştin, hinek vegeriyan partiyên xwe yên kevin...

Mircan wê çaxê di hertiştî de mijûl bû: ku xwe bikûje, hin hevalên xwe yên qels bikûje... Binketina pirsa netewî, binketina dogeşa wî ya şexsî di laşê wî de bû bûn weke birînên vekirî. Diya wî pê hisiya bû. Li ber derî rûdinişt, digiriya û dikewgirand: «Lawê min, tu hîna zarok î, tu bi firê ne ketiyî, ecelê li ruhê xwe neke! Teyr bi baskê xwe, teba bi lepê xwe û însan bi hiş û aqilê xwe, xwe digêhînin miradê xwe. Kurmanc nanê garis in, lawê min... hevdu nagirin. Tu ê di heps û zindanan de birizî! Kes weke xalê te bi ser Berzanî û Kurdistanê

de ne arîya, dawiyê jî berata wî bêserî ji erdê xerîb bi ser me de hat!»

Gava Mircan bi tena xwe dima, li xwe dixist û weke lokê ku tu kêrê bidî hustuyê wî, dikir orîn û diperpitî. Ji bilî tenbûrê û sitranên cengê, tiştekî din ew aş ne dikir. Wê çaxê jî, te digot qey nû hînî lêxistina tenbûrê dibe. Bi şev û bi roj ji destê wî ne diket.

Mircan wê demê ji mal dernediket, ne dixwest çav li nasê xwe keve, yan jî bi kesî re bipeyive. Xwarin kêm dixwar û kêm radiza. Roj bi roj li xwe dişkênand. Diya wî jî, gava bi tenê dima, derî û pencerên oda wî digirt, perde bi ser wan dadikir û diçû, weke nobedaran, li ber derpiyê hewşê li ser cadê rûdinişt. Destê xwe dida ber ruyê xwe, mitale dikir û li ser rewşa kurê xwe diponijî.

Ilmê «Eşqiya» roj bi roj weke xumxumekê, di nav gel de bela dibû. Lê tu kesî tiştekî çepsandî li ser endam û karên şebekê nizanî bû. Tatûleqa ku Mircan ketibûyê, roj bi roj giran dibû. Lê... jiyanê deriyê fereca xwe ji nişka ve, ji dilpakiya wî re vekir. Hevalekî wî yê kevin, «jêniksipî», ji ev yên ku weke qazî-mazî, hemû reng di wan de hene, bi ser xumxumê keti bû. Hat ku ya xwe bi ser ya wî xîne. Bi fort û payebûn jê re got: "Kaxizên xwe yên dibistanê hazir bike û tercume bike, em ê te bişînin Bulgaristanê, xwendinê!» Wê gavê Mircan di dilê xwe de got: «Tu weke gurê ku bi şivan re dixwe û bi pêz re diçêre!», lê jê pê ve çare li ber wî tune bû. Wiha jî bû.

Deh salên jîyaneke dirêj li Bulgaristanê qedand... Lê ew salana ne tenê xwendin û serketinên wî bûn... Xweşî û talî, qehr û hezkirin, polîtîk û axaftinên xwendevaniyê, bûyerên rengoreng, bêrîya welat, hesreta dîtina dê û bav, xuşk û bira, heval û hogirên zaroktiyê... Bi kurtî: Deh buhar û payîz, deh havîn û zivistan, bi gulvedan û çilmisandinên xwe ve, bi ketin û serketinên xwe ve... şopa xwe xweş di raman, bîr û baweriyên wî de hiştin. Lê xerîbî û bêganiyê, asoyê dûr, asoyê jîyana serfîraz, asoyê azadiya sor, çarîkekî jî, ji ber çavê wî ne xistin. Rojên ku Mircan xeberên teze li ser şerê pêşmergên kîjan perçên Kurdistanê bibihîsta, tebatî ne diketê û ranediza. Bi

şevan xewn didît ku tev wan dibe! Û carina weke lokê hêc kef bi ser devê wî diket û bi orîna xwe ya bilind şiyar dibû. Pirî caran di xewnên xwe de difiriya. Dibû teyrekî xerîb; baskhesin, destpola; keldûmana devê wî dibû agir... Çek, sîlahên nedîtî û nebihîstî diketin nav lepên wî. Carina jî, ku rê lê teng dibû di nav newalan re dikişîya û ber bi çiyan ve diçû. Lê ku di şer de dişikiya û diket bin, wê çaxê dikir qêrîn. Pêşmerge lê dihatin hev û ji nû ve haziriya xwe dikirin û êrîşên xwe berdewam dikirin!...

Di salên dawîn de, gava Mircan xwendina xwe ya bilind dikir, rasthatina her gotareke nû li ser dîroka Kurdistanê, jê re dibû weke dohnê ku tu bi ser agir de bikî. Bi wan hêc dibû û hêcbûna wî gur dibû. Carina ev rewş heftekê didomand û jê ne diçû. Wan çaxan rûçikê wî dibû wek rûçikê şêt û dînan. Heger bi roj karekî wî li derekê hebûya, zû diqedand ku zû vegere mal û têkeve mijûl û xewnên xwe. Di wan deman de hevalên wî, ew fam ne dikirin. Gava ku carina bi wan re dipeyivî, gotinên xwe yên «agirî» bi kar dihanî, û ew dibûn ûştê xeydekê, di nabêna wî û wan de. Ji dostên wî hinekan digotin: «har e»; hinekan; «dîn e û şêt e»; û hinekan jî: «xeşîm e, ji konevaniyê fam nake!». Lê gava hêcbûna wî ji ser diçû, dengê hişê xwe dibihîst û ji xwe dipirsî: «Ma ew wek min xewna nabînin? Miheqeq ew di jiyana xweş de, bi jin û zarokan ve mijûl dibin!»

Di salên xwendinê de tevgerên kurdî, li sê perçên, Kurdistanê, bi şêweyên rengoreng şerê çekdarî dikirin. Û «teyrê xerîb» bi wê «şêtbûna» xwe, tev li şerê hemû pêşmergan dibû. Geh li Kurdistana Rojhilat, geh li Kurdistana başûr û geh jî li ya Rojavayî Berjor. Ji perçekî difiriya perçekî din. Ji cem hêzekî diçû cem hêzeke din. Ew li hev dihanîn. Navbera wan xweş dikir. Û heger bi ya wî ne kiri bûyana, dikire qêrîn û hawar, bi ser wan de radibû! Wî di xewnên xwe de jiyaneke sipehî didît, lê di jiyanê de, perçebûn û şerê birakûjî! Gava hinek ji van hêvî û xewnên xwe dajot tev axaftina xwe ya polîtîkî, bi hin hevalên xwe re, di çavên wan de matmayîn dixwend û ken û qerfên wan, bi lojîka xwe, dibîhîst: «Ma ev

sîyaset e!?» Lê teyrê xerîb, her weke xwe dûr dinerî û bilind dirêsa!

Mircan di jiyana xwe de gelek caran dil girt û li xerîbiyê jî gelek caran keçik guhertin, lê evîn ekê tenê ciyê xwe di dilê wî de girti bû, ya ku pê şa dibû ew bû, ya ku pê hêc dibû ew bû û ya ku pê difiriya ew bû -ew tenê jî, dihat hemberî hezkirina wî ji diya wî re. Û ji keçikên ku diguhart, tenê hevaleke wî, Lûsa, ya ku pê re dixwend, hinek ji hêcbûna wî fam kir û dûre pê re dom kir. Bi wê re jî, pêşiyê hogirtiya xwendina bi hev re ew nêzîkê hev kirin, dûre hezkirina Lûsayê ji sitran û tembûra Mircan re peywendiyên wan şidandin.

Mircan jî, qet jin û mal û zarok ne li ser bala wî bûn. Lê mêyetî û dilsoziya Lûsayê ew xist bin darê xwe. Du salên pêşîn ji dostaniya wan, rojekê şer bû û yekê aşitî. Li hev ne dikirin. Lê rojekê te ê bigota ji nişka ve «hêcbûnê» bi Lûsayê jî girt. Mircan wê rojê, wêneyek (tê de, rêzek pêşmergên hêsîr, çavgirêdayî, nîvşipiya, nîvketî, li ber gulê dijmin bûn- dihatin îdamkirin) danî bû ber xwe, bi hêrs û hêcbûn li tembûra xwe dixist. Gava ku tembûra xwe danî, Lûsayê hêsrên xwe paqij kir û bi kelogirî li ber dilê wî da:

- Hûn ê bi ser kevin! Muheqeq hûn ê azadiya xwe bistînin! Min çirûska agirê rastiyê di çavên te de dît- got û hinarûkên xwe yên şil bi dilovanî danî ser milê Mircan.

Ji wê rojê de, Mircan jê hez kir û nema dilê wê hişt...

Sala dawîn Mircan li Bulgaristanê bû bû weke miriyê ku serê wî li tirbê keve. Firandina «Teyrê xerîb» ya bê vîze, dawî hat û hemû rastiyên jiyana tevgera kurdî, hişk li ber wî kom bûn: Ew ê here cem kê û nere cem kê!? Ew ê kê li hev bîne û kê li hev neyne!?... Rêyek tenê li ber wî vekirî ma. Rêya ku xwe tê de bi agirê nava xwe bisoje, ya ku tê de hesretên xwe bikewgirîne, rêya xerîbiyê, ya bêganiyê, ya wendabûnê. Wî jî weke sedan ronakbîrên kurd, berê xwe da Europayê û li Fransayê cîwar bû.

***

Otobus di rêyeke nenas de, di nav erdekî nenas re diçû û birek bêganeyên nenas, berê wan li ciyekî nenas bûn...

Ji nişka ve otobus li ciyekî xalî rawestiya. Yê afrîqî û herduyên tirk derketin destavê. Mircan hinekî xwe di bin mijûlên xwe de xurciland û li dora xwe nerî... Gelo kî dizane bê her yek ji van xelkên nenas bi çi derdî ne? Dibe ku derdên hinekên ji wan, ji yên wî girantir bin. Kî dizane?

Gava herduyên tirk ji nû ve siwar bûn, yekî ji wan awirên çavnasiyê di Mircan da, wek yekî ku bêje: «Çarenûsa me yek e!» Û piştî ku li cihê xwe rûnişt, du sê carên din li paş xwe nerî û bi Mircan re bişirî. Mircan jî bi mana «erê» serê xwe carekî hêjand. Piştî bîsteke kin xwediyê awiran ji ciyê xwe rabû û hat di ser serê Mircan re rawestiya. Dûre hevalê wî jî hat cem. Yê ewil bişirî û pirsî:

- Kurd Iraq? -destê xwe ber bi Mircan ve kir.

Mircan bêyî ku tu gumanan bibe ser van herdu «hevalên oxirê» sonda xwe anî bîra xwe. «Ez ê devê xwe li gemê xim!» Dûre, weke ku li sonda xwe poşman bû be, di dilê xwe de: «Ma xelk hemû Mecîd û Felît in?» got û bi xwediyê pirsê re bişirî û bi kurdî lê vegerand:

- Erê! Kurd im!

Herduya pêşiyê piyê xwe hejandin, dûre xwediyê pirsê, bi tirkî çend pirs ji hevalê xwe kir û "hummm"eke dirêj ji bêvila xwe derxist.

Yê kin li dor 34-35 salî bû, çavekî xwe hinekî dadigirt. Rengê wî ji nêzîk ve, weke rengê pirteqalek ku derderî bû be û efnekê avêti be ser û bêvila wî jî tûj weke ya şojî bû. Tenê pantelonê wî yê ûtîkirî û çakêtê dirêj î modern, ew dihanî fesalê. Hevalê wî, jê dirêjtir bû, gewrekî sipîçolkî û kal bû. Ji dengê wî yê zîxanokî hemû şexsîyeta wî dihat kifşkirinê. Yekî ji ev yên ku meriv çi ji wan re bêje, ew ê tim bikenin û bi matmayî serê xwe bihejînin. Lê ku dengê xwe ne kiri bûya, qelafetê wî û eniya wî ya beş, heybeteke taybetî didayê.

Yê kin:

- Îsim yaho, îsim nedir? -bi dengekî bilind, weke ku tu bi kerrekî re bipeyivî, pirsî.

Mircan bi tirkî nizani bû. Lê di jiyana xwe de weke gelek kurdan, wî jî axaftina tirkî, sitranên tirkî bihîsti bû. Û gotinên

erebî yên ku bi tof di zimanê tirkî de tên bikaranîn, tim dihişt ku hinekî ji axaftinên vî zimanî fam bike.

Loma bi dengekî nizm û bi kurdî:

- Navê min Mircan e! got û dûre pirsî: Yê te?

- Artîxil! -yê kin destê xwe bi qewet li sînga xwe xist; dûre dîsa bi wê şêweyî destê xwe li sînga hevalê xwe yê dirêj xist û got: Emîn! Kurd Zaza!

Artîxil hilmek kûr kişand û li Emîn nerî:

- Ax yaho... Fransa şerefsîz! Çîlelî hayat!...

Emîn serê xwe hejand, dûre destê xwe da pîyê Mircan: Fransa baş nîya, non tê de çino! Ti fam kero?

Di vê rêya dirêj û nenas de, du rêwiyên nenas pê re bişirîn û bûn weke sebreke biçûk. Lê ne şabûna nasiyê, ne jî bişirandina rêwiyan liva wî, di bin mijûlên wî de sivik kirin.

## - III -

Hêvî rewşa jiyanê ye. Heger hêviya meriv şikest, çirûska çavan, geşbûna dil û hinavan diçilmise; şûna awazên jiyanê, şêrînbûna dêmê wê, zelaliya gulvedana wê, rengê reş datîne û her tiştên wê di mirêkek şikestî de tên dîtin.

Gava Mircan bi koma hevalên biyanî re gêhîştin Babilonê, bû bû weke çûkê şilbûyê ku baskê xwe bi dû xwe de bikişîne. Kewên deh salên bêganiyê, gêjbûna deh rojên hotêla biyaniyan li Parîsê, ew ji hawhaw de xisti bûn. Laşê wî sist û giran kiri bû û pojnê wî pir. Te ê bigota ji bilî navê wî tiştekî din pê re ne hati bû Babilonê. Ramanên wî, hişê wî, bi mijûlên ku li şûna xwe hişti bûn, girêdayî ma bûn. Her tiştên jiyana nû, jiyana nenas, rengê wan mijûl û ramanan distendin û her babetek teze, dihat dîtin weke rewrewka di çavê çimandî û şikestî de. Her tişt li ber çavê wî bû bû wek qedereke olî û çarenûseke nivisandî ku meriv baweriya xwe pê hanî be û serê xwe bi koranî, yan ji bêçaretiyê jê re danî be.

Katê roja yekê li Babilonê li pêşiya avahiyeke çarqat rawestîyan, keçeke porfîlikî, ne kin û ne dirêj, esmer, dêmpiçûk, weke dêmê marmarokê, derket pêşiya wan, geh bi

îngilîzî geh bi fransî, xwe bi wan da naskirinê: «Ez sekretera madam Laplasê me, ew îro ne hazir e. Navê min Fatîma ye! Nemînin behetî: ez fransî me, lê bi jêza xwe Cezaîrî me!... Hûn ê dudu dudu têkevin odekê. Serê her yekî ji we, ez ê îro 300 frankî bidimê. Bi wan, hûn ê ji xwe re îro xwarin û hûrmûran bikirin. Heta du rojan betlane ye, ders nîne!...»

Biyaniyên nû, gişt bûn dudu dudu, tenê Mircan û yê afrîqî bi tena xwe bûn. Ew jî herdu bi hev re, di odekê de bi cî bûn. Grûpa nû bi temamî li ser qatê yekê bi cî bûn.

Gava Mircan bi yê afrîqî re derbasî oda xwe bû, her yek ji wan bîstekê li ser textê xwe bêdeng veket. Lê te digot qey her yek ji wan, di vê bêdengiyê de, di rewşa yê din de mijûl dibe. Ji nişka ve dengê tevliheviyekê ji oda diwaserê wan hat. Mircan nas kir ku Artîxil û Emîn in. Yê afrîqî, li Mircan nerî, bi hêrs rabû ser xwe û di hundirê odê de çû û hat û di ber xwe de çend gotin bi zimanê xwe got. Piştî bîstekê dîsa li Mircan zivirî û bi nefsbilindî bi îngilîzî pirsî:

- Do you speak englîsh?

Mircan di zarava pirsa diwaserê xwe de, hinek payebûna xeşîm û pozbilindiyeke ne di ciyê xwe de, dît. Lê bêyî ku hewasê xwe di dêmê xwe de gewde bike, bi aramî nerîna xwe xist çavê wî û got:

- Yes, I do!

Mircan bi wê xurcilandin û nerîna xwe, xwe kir weke yekî ku bixwaze bi awirên xwe bêje: «Ev yên ku dengê wan li pişt dîwêr tên, ez ne ji wan im!» Û te ê bigota bi wê nerînê, kopîyeke ji nefsiya xwe şanî diwaserê xwe kir û jê re da xuyakirin ku şêweyê xeberdana di navbera wan de, divê bi rengekî din be.

Yê afrîqî, weke ku piçekî aramiya Mircan têgêhîşti be, lê nexwaze zû bi zû ji ser ya xwe jî dakeve. Bi miqeresî ber bi wî hat:

- Ka hela em hevdu nas bikin!? got û weke ku cara yekem hevdu bibînin, destê silavê dirêjî Mircan kir.

Mircan mizicî û bêyî ku awirê xwe ji yên wî derxe, got:

- Helbet, pêwîst e... Navê min Mircan e!...

- Yê min Wawîko ye! Ez ji Ganayê me!

Mircan hinekî bi bihîstina navê «Wawîko» bişirî, kenîya, lê xemgîniya dilê wî rengê xwe li ser dêmê wî veda bû. Rabûn û rûniştina wî, nerîna wî, bişirandina wî... bi rihetî dihatin xwendin û famkirin. Vê yekê jî hişt ku bişirandina wî ya bi ken, ya ku piştî bihîstina navê Wawîko, bi dilgermî û dilovanî bête famkirin û herweha pira baweriyê di navbera wan de bête danîn. Piştî bîstekê, mîna ku Wawîko tika bike, pirsî:

- Mirza Mircan!... Ma tu naxwazî em bi hev re herin û ji xwe re xwarin û hûr-mûran bikirin?

Bi Wawîko re çû dikanan, Mircan weke ku nû ji xew rabûbe û nû tê derxîne ku aniha li bajarekî nû ye û rûpeleke nû di jiyana wî de vedibe... Cara yekê bi hişê şiyar li rewşa diwaserê xwe nerî: Mirovekî dirêj, weke çar tilîyan bi ser Mircan diket; bêvila pan û pelixî, lêvên cewdik û daliqî, di dêmekî weke giroveriya hêkê de. Li ser buruha çavê çepê, qelişeke dirêj, wek derba kêrê ku tu li bacanekî reş bixî, dihat xuyakirin. Tenê eniya beş û çavên zexelî, dihişt ku meriv di dêmê wî de hêviya jîrbûneke merovatiyê jê bike. Gava ku Mircan li reweştên Wawîko dinerî, bi xwe re mijûl dibû «Gelo çima ev dehbayê ha aciz bû, gava dengê Artîxil û Emîn ji paş dîwêr bihîst?»

Dema ku ji dikanan vegeriyan, te ê bigota perda teklîfetê ji navbera wan hilat, lê sawa resmîyetê zêdetir bû, nexasim gava ku Wawîko li profesiyona Mircan pirsî. Wê gavê Mircan, mîna ku zarava Wawîko, ya pirsa yekemîn bîne ser zimanê xwe, lê bi zanebûn xwe di ser re bigire, got: «Ez di warê fîlolojiyê de doktor im.»

Piştî vê pirs û bersîvê, Wawîko, rêzeke taybetî ji Mircan re digirt û gava pê re dipeyivî, hertim bi gotina «Mirza» navê wî hildida û beriya ku tiştek bipirsiya, digot: «Li min negire, ez ê pirsekê ji te bikim!»

Warê nû û nenas bû û biyaniyên teze weke gêrikan ling ne dixistin bin xwe. Geh li cada tek ya çarşiyê, geh li dora foyê, geh li korîdor û serşokê, li hevdu rast dihatin û weke ker û lalan bi tiliyan, bi hev re dipeyivîn. Lê yên ku weke hev û di rewşekê de bin, zû ji hev fam dikin. Ji mirêsê wan û «peyvên

tiliyên» wan, dihat naskirin ku hemû jî ji bajêr ne razî ne. Digotin: "Pir piçûk e û xelkê wê li biyaniyan nanerin."

Ji Mircan re, te ê bigota ev rewş ne gelekî girîng bû. Wî xwe matmayî ne dikir. Lewra beriya ku were bajêr, li ser gotinên Şadî, Mecîd û Felît, wêneyek di hişê xwe de çêkiri bû. Û gava bi diwaserê xwe re çû dikanan, rewşxurustî dît û di dilê xwe de, wê çaxê, tenê xwestinek xwest «Hema tenê, kesên ku ez bi wan re bijîm, însan bin!»

Di wê rojê de Mircan du sê caran li korîdorê û serşokê pêrgî Artîxil dibû û her li hev rast dihatin, bêyî ku tu manê bide beşera xwe, Artîxil dimizicî. Serê xwe piçekî diçimand û bi kurdî silav dikir: «Roj baş!", "Beyanî baş!». Û hercar bi vê rewşê, te ê bigota nû hevdu dibînin. Bê silav di ser re derbas ne dibû.

Mircan bi bihîstina van gotinên kurdî, li ser zimanê xortekî tirk, matmayî ne dima. Wî ji xwe re digot: «Yan hevalê wî, Emînê zaza ew fêrî van gotinên xwe yên tekane kiriye; yan jî danûstandina wî bi kurdan re ji wilo firehtir e.» Wî, jê ne dipirsî bê ew çawa fêrî van gotinan bûye. Herçiqas difikirî ku hinekî dilê wî bi van gotinên wî yên kurdî xweş bike jî, sonda xwe ya hotêla Parîsê dihanî bîra xwe û dilê wî sar dibû. Xwe bi xwe: «Hîna li pêşiya me gelek wext heye, em ê bigêhin hevdu baş nas bikin.» digot û xwe radigirt.

Li warê nû Mircan, weke ku hewl bide û rûçikê jiyana xwe rawestîne. Hêdî hêdî hawirdora xwe nas dikir. Zemînqatê foyê, îdare, oda alîkariya sosyalî, eywana televîzyonê û dibistana ziman bûn; qatê yekê: Biyaniyên nû, yên bi hev re hati bûn, li ser diman; qatê diduyan, ji Cezayîr, Tûnis û Mexribê karkerên biyanî hati bûn û tê de diman; û yekheba Fransî jî carina li ber çavê wî diketin û texmîn dikir ku ew derin qatê sisiyan...

Du sê caran çend karkerên welatên ereban didît, lê tu mereqa wî çênedi bû ku xwe bi wan bide naskirin. Ji alîkî ve mirês û tevgera wan; û ji alîkî ve jî gumana ku ew ê wî fam nekin ku merivekî ji welatekî ereb, li Fransayê îltica xwesti be. Lewra temamê karkerên van welatan, bi rewşeke din bûn.

Ji rojên betlanê roja diduyan, li derve dunya ne germ, ne jî sar bû. Sirûşta payîza aram bi meriv re dibişirî... Tavek bi tîn û erdekî bi bêhna giya û pincarê. Bayê hênik, hilma aviya erdê li ber tîrêjên roya devliken didêra û li bêvila meriv dixist, rewa jiyanê dixist nava meriv. Û ku rewa di navê de peyda bû, hêvî, weke kavkuvîlkên piştî baranê serê xwe hildidin. Danê sibê, Mircan, geh li hundirê odê geh li korîdorê û geh li dora foyê diçû û dihat. Gera li ser lingan pê xweş dibû û dilê wî bi awazê sirûştê re lêdixist. Hêdî hêdî çûkê şilbûyî weke ku wêneyê xwe di avê de bibîne, xwe dadiweşand. Bi tena xwe diket bajêr.

Mircan di çûyîna xwe de, tenê pêrgî çar pênc însanan bû. Bi xwe re ket mijûlan: «Bi Xwedê heger bajar ne kavilekî bajaran bûya, bi kêmanî ez ê pêrgî gelek merivan bihatama. Erê... Mecîd û Felît li ser heqiyê bûn..! Lê yê min, ji min re çi divê?.. Ez ê li vir ziman hîn bibim û pasporta xwe bistînim. Bes e! Şeş meh in, bi çi awayî be jî ew ê biqedin!» Di vegerê de xwest têkeve cadeke din, lê her ku digêhîşt kuçên cadeke piçûk û dawiya wê jê ve xuya dibû, dilê wî jê dişikest. Di xwe de mijûl bû: «Dibe ku îro betlane ye, loma kes di kuçan de tune û piraniya dikanan girtî ne!... Lê ma îro çi roj e?... Şemî ye, yekşem e..?» Hewl da ku nas bike ka ev çi roj e, lê dilê wî li encama gumanên wî rûnedinişt.

Mircan di şopa xwe de vegeriya. Li pêşiya foyê tilmekî piçûk hebû. Beriya ku bigêhîje tilmik, xwe bi xwe got: «Heger ne ji vî tilmikî bûya, min ê serê Wawîko, ji aliyê bajêr, di pencerê re bidîta!...»

Li ser tilmik hinekî rawestiya, weke ku wênê nexşê bajêr di serê xwe de bicivîne... Gundekî mezin, cada dikanan, berjor û berjêr di nav re diçe, û li dor 10-15 kuçên piçûk ji aliyê rojhilat û rojava de jê diçin. Li dervayî bajêr, ji hêla rojhilat ve, dehl û zinarên mezin xuya dikin û ji hêla rojhilata jorîn ve, kavilekî dêreke kevnare, dûrî bajêr e... Wekî din jî hawirdor, şûvên dora wan darkirî ne... Piraniya xaniyên bajêr, yek yan jî duqat in, tenê li paş foyê şeş heft xaniyên sê çar qatî hene...

Li ser tilmik bêhnekê rawestiya, li dora xwe nerî. «Erê,

erê... Dawiya emrê xwe, min Babilon jî dît!» Ji nişka ve çavên wî li du reşan ket. Ji hêla sûkê ve keçeke 14-15 salî, bi zarokek 6-7 salî re hêdî hêdî ber bi wî ve dihatin. Keçik hîna bi qasî deh gavekî dûrî wî bû, weke ku ji xwe re tişteki xerîb bibîne, çavên wê ji çavê Mircan dernediket. Mircan jî, bi şabûna ku meriv bi zarokan şa bibe, bêyî tu mane, lê dinerî. Gava di ber re derbas bûn, keçikê meşa xwe giran kir, lê lawik ew circirand. Mircan, bi xwe fam kir ku keçikê dixwest pê re bipeyive, yan jî pirsekê bike. Lê dema serî her du sê gavên ku jê dûrdiketin, keçikê li paş xwe dinêrî û dibişirî. Mircan bi mebesteke din mijûl bû... «Keçik kamil e..!» Awirê xwe ji dû qut ne kir. Piştî 50 gavekî, li ber deriyekî kesk, rawestîyan û keçikê bi mebesteke taybetî, lawik derbasî pêşiya xwe kir û li Mircan nerî. Dûre maçî destê xwe kir û pif kirê. Mircan bi matmayîn bişirî û bê hemdê xwe ji ramûsana bayekî re serê xwe hejand. Dûre bi xwe keniya, serê xwe xiste ber xwe û çû foyê.

- IV -

«Hemû biyaniyên polîtîk, ji kerema xwe re dakevin dersa ziman! Hemû biyaniyên polîtîk, ji kerema xwe re werin dibistana zimên..!» Ji nav zimezima dengê pîrekekê, bi zimanê îngilîzî û fransî, Mircan ev gotinên ha ji operloyê bihîst û dûre jî ji nav ciyê xwe çeng bû. Bi çengbûna wî, diwaserê wî jî ji xew rabû û jê pirsî:

- Mirza Mircan, seet çend e?

- Neh û nîv e!... Ez bawer im, em dereng man. Pele bike, em herin dersê!...

Wawîko serxew bû, dengê wî yê qalind, ji nav lêvên cewdikî kirin çelpeçelp:

- Pele neke! Muheqeq, em ne yê dawîn in. Yan ne, çima di operloyê de, em bi nav ne kirin? Helbet hîna kes ne çûye!

Gava Mircan û Wawîko derbasî «dersxanê» bûn, dersê hîna dest pê ne kiri bû. Li dor 10-12 meriv, pîrek û zilamên biyanî, di hundirê dersxanê de weke şêweyê tipa «U» rûnişti

bûn û du jinikên fransî jî di navîna wan de, şipiya bûn. Pêşiyê Mircan fikirî ku «Gelo çima du mamoste ne?» Lê piştî bîstekê, fam kir ku yek mamoste ye û ya din midûre ye... Yek ji wan gelek sipehî bû û ya din naşêrîn bû. Ya sipehî bi îngilîziyeke şikestî pirsî:

- Hûn yê kîjan odê ne?

Wawîko berî Mircan bersîv da:

- Oda 17a.

- Navê we û welatê we?

Gava Wawîko dîsa berî Mircan bersîva xwe dida, Mircan di xwe de mijûl bû: «Gelo pêşî bêjim, ez kurd im û dûre ji filan welatî me, yan ez ji filan welatî me, lê bi netewa xwe, ez kurd im?» lê beriya ku biryarê bide, jinikê berê xwe da wî û got:

- Tu?

- Ez kurd im!

Jinika tenişţê, ya naşêrîn bi int û şida gotin sitend û bi îngilîziyeke paktir pirsî:

- Welatê te, Mîrza. Welatê te yê ku tu lê çêbûyî? Te fam kir?!

Mircan ma behetî: «Ev ya ha, hîna navê min nas ne kiriye, bi ser min de radibe, dûre xwe serwext kir: «Belkî berî min, hinekan ew xeyîdandi be..!» Lê bi zarxweşî lê vegerand:

- Ez ji Iraqê me, lê ez bi netewa xwe kurd im! got û bi hêmin li çavê jinika naşêrîn nerî. Dûre bi wî şêweyî jî, nerîna xwe bir ser jinika ku ewil pirsî.

Te ê bigota qey ev zarxweşiya Mircan li mereqa ya naşêrîn ne hat, serê xwe xwar kir, herdu destên xwe vekirin û xwe li ehmeqiyeke şeytanî û meqerisyieke kor girt:

- Min fam kir, Mirza, min fam kir, lê paspor...

Negîha ku pirsa xwe bibe serî, jinika sipehî gotina wê birî û weke ku tika bike:

- Janêt! got û bi fransî pê re peyivî... Dûre vegeriya ser Mircan: Kerem bike, ji xwe re li ciyekî rûne Mirza!

Mircan serçimandî çavê xwe li ciyekî gerand û mitale kir: «Xwezî ez kerek bûyama û min ev çend gotinên îngilîzî jî ni-

zanî bûya!» Li kêleka Wawîkoyê ku berî wî rûniştî bû, bi cî bû.

Bi gotina jinikê, ya dawî, Mircan wusa bû, mîna ku tu wî di ava sar de bikî. Bi heyr û matmayîn di navbera xwe û nefsa xwe de pirsî: «Gelo çima ev jinika bi navê Janêt ji min tengizî?... Ew ji navê kurd tengizî yan bi temamê biyaniyan re wiha bû? Na! Muheqeq ew ji kurdan tengizî ye... Yan ne, çima Wawîko bi xweşî derbas bû û tu serêş jê re çênekir?... Bi aqilê min beşera min pê re xweş bû!?» û ji nişka ve lerza nava Mircan tewirî: «A.. Pasportê! Pasporta min ew şaşomaşo kirine. Na xwe loma jinikê pirsî -pasporta- te. Wê muheqeq, beriya ku bê dersxanê, kexizên min xwendine û dilê wan li min rûneniştiye.»

Mircan di wê bîstikê de xwe serwext kir ku ûştê tengizandina Janêtê ew bû ku jê re pêşiyê ne got, ka ew bi kîjan pasportê derbasî Fransayê bûye, lewra ew bi pasporteke ne (Î)î, ji Bulgaristanê hati bû Fransayê. Xwe bi xwe kete ramanê: «Lê madem ku vê bêbavê zanî bû û kaxizên min xwendi bûn; çima bi rehetî li ber guhê min ne xist?!... Min berî niha, hertişt bi rast û ronî di nama xwe ya îltîcayê de ji OFPRA(*)yê re nivisandi bû!... Lê baş bû ez ne hatim provokasiyonê û ez zêde ne axivîm û li pêşiya endamên dersxanê, yên nenas, min hertiştê xwe ne got!»

Mircan, bi her awayî di ber dilê xwe dida û hercarê bi awakî li ser gotinên Mecîd û Felît difikirî: «Ew kesên ku min qerfê xwe bi zanebûna wan dikir... Ji min baqiltir derketin... Heger min ji wan bixwesta bi wan re bimînim, ew ê ji kêfxweşiyê bireqisîyana û ez jî ne diketim vê rewşê!»

Gava herdu jinik bi hev re dipeyivîn, Mircan di bin çavan re li wan dinerî, weke ku hewl bide hinekî ji rewşa wan fam bike: Janêt, jineke navsere bû, bi bejna xwe jî orte bû. Porê wê yê hîtikî, kert-kertî kurkirî bû û du reng bû. Kerta ewil, dirêj ji qatê serî heta ser guhan porekî zivir, zer û lihevgerîyayî,

---

*(*) Rêxistineke firansî ye. Li dijî apartheîdê û ji bona mafên penaberan xebatê dike.*

weke yê bizineke hîtik bû; kerta din, ji jênîkê heta kortika dîza paş hustuyê wê, rengê wî cûn bû û bi tof bû. Mîna pirêza ku nû derasê ji nav dabe alî, dihat xuyakirin. Çavê wê weke rengê gola şelû, ne zer û ne jî hêşîn bû. Lê jinika din, te ê bigota ji wêneyên hunermendên Europiyên sedsala nozdan e. Ciwanbûn û sipehîbûna wê klasîkî bû. Dêmekî şîrî, hinarûkên bi rengê gula pembik, bejinzirav; û porê wê yê zer î şimayî weke gilokek tayê nexşan li paş hustuyê xwe civandi bû. Çavê wê hêşîn, weke zelaliya esmanê sayî.

Mircan piştî ku bi hûrnerînî li rewşa wan meyizand, ji xwe pirsî: «Çawa ev horî û ev cinawir di organîzasyonekê de bi hev re kar dikin?»

Herdu jinikan axaftina xwe dom kirin. Biyaniyan jî guhên xwe miç kiri bûn, geh li wan dinerîn û geh çavê wan yên beloqî, tev pirs û gumanan weke sitiriyan di laşê Mircan re dibûn. Lê ji bilî endîşa Mircan tiştekî din tê de ne dilebitî: «Gelo ev cinawir û ev horî li ser min çi dibêjin? Gelo ji wan ê kî zora kê bibe? Gelo ew heta kîjan qonaxê kurdan nas dikin? Ew bi başî wan nas dikin yan bi xirabî?» Û carina jî ceger dihanî xwe: «Ma ew ê bi min çi bikin? Çi ji destê wan tê? OFPRA bi hertiştî dizane, min derew li wan ne kiriye! Ma ne gerek ev nebixêra Babilonê, tenê ciyê xwendina zimên û xweragirtina li benda kaxizan be!? Tiştek ji destê wan nayê. Tiştek nabe!»

Zêdeyî çarîkekê derbas bû û rewş weke xwe ma. Bizina piyoş dikir pitepit û her carê berê xwe bi Mircan ve dikir û ya sipehî her carê bi hêmen tiştek jê re digot û ew serwext dikir... Di wê rewşê de, tiştek weke nerînên mûlteciyan bi Mircan giran ne dihat. Ew jî di bin nerînê wan de melûl bû bû û nizanî bû ji heyra wê berê xwe bi kuderê de bike. Her ku dem diçû rewş pê girantir dibû û laşê wî hişk dibû. Ji nav nêrînên biyaniyan, tenê nerîna Artîxil pê xweş dihat. Di wê navberê de du sê caran çavên wan li hev diketin. Cara dawîn Artîxil bi mana piştgiriyê serê xwe jê re hejand û bi dengê nizm, di ber xwe de bi "kurdî" got:

-Heyir welleh yaho... baş..! baş... Tirs na!

Mircan bêhneke kûr kişand, di nava xwe de qijirî û bi şe-

wat ji xwe re got: "Xwedêyo! Ew segbav çi ji min dixwaze vê sibeha ha?" Û pê re jî te ê bigota, weke rîsekî zivir li qirika wî hatiye şidandin. Bi xwe re ket gumanan: "Heger ez bipeyivim, dengê min nema tê bihîstin!..." Qirika wî xiliya û serê wî ket ber. Nema karî bû li kesî binêre, û "Tilûrê serjêkirî, nayê êşandin bi rewisandinê!"

Di dersxanê de, ji hêla ku Artîxil lê rûniştî, dengek bilind bû û xwediyê deng bi fransiyeke şikestî, xwe dada herdu jinikan. Gava Mircan serê xwe rakir dît ku herdu jinik li Artîxil dinerin. Mircan bi heyr bîr kir: "Artîxilê şinik, wa ye hinekî bi fransî jî dizane!..." Dilê wî hinekî êşiya: "Heger ev dîkê şinik, xwe tev problêma min bike, wê rewşa min xirabtir bibe!" Lê te digot qey ew ne li ser wî dipeyvin, çavên wî vajovajo bû û tiştek fam ne kir; weke ku ne tiştekî dibîne ne jî dibihîze... Gava di dersxanê de teqereq hat, fam kir ku bû katê bêhndayînê ye. Teqnekî ling girêdayî ma û ji wan gotinên ku Artîxil di êrîşa xwe de bikar dihanî "pour quoi, pour quoi?"(*), di guhên wî de dikirin vizîn.

Wê rojê heta danê êvarî jî rewşa Mircan bi ser xwe ve ne hat. Janêtê hemû wext di hînkirina nîvisandina adressê de qedand. Û madam Laplas jî nema diyar bû. Mircan tiştek ji qerebalixa ser xwe fam ne kir!...

***

"Roja xweş ji sibehê de xweş e!..." Roja pêşîn ji Mircan re, bû weke mestera rojên dahatû. Wî xweş fam kir ku bizina piyoş, ne tenê naxwaze biyaniyan fêrî ziman bike, lê bi her awayî dike ku Fransa û zimanê fransî li ber çavên wan reş bibe. Her ku dem dibuhirî, kezebreşî zêdetir dibû.

Bizina hîtik ê her roj seet li neh û nîv, dehan tev kûçikê xwe ê (carina dudu bi hev re dihanîn dersxanê) derbasî dersxanê biba û gotina wê ya pêşîn, ji dêvila silavê ve wê ê bigota; "Alors, fermez votr lîvre!"(**) Di çend rojên pêşîn de xwen-

---

*(*) Bi fransî ye, tê mana "Çima?"*

*(**)Bi fransî ye, mana wê ev e: Baş e, de pirtûkên xwe bigirin.*

dekaran wusa guman dikirin ku ev gotinana silava wê ne, lê gava ew derbas dibû û ku hinekan pirtûkên xwe hîna ne girti bana, wê xwe bi hêrs dadida wan û bi xwe pirtûk digirtin. Wê çaxê hemûyan mana van gotinan fam dikirin. Û piştî wê, wê ê ji ser dilê xwe, ristek dudu bihaniya ser ziman û ji xwendekaran bixwesta: "Bi dû min de bêjin" dûre "Yeko yeko bi tena xwe vegerînin!" Û yekî ku pê re negêhanda ew hevoka li ser hev bigota, wê ferman dihanî serê wî; "Hûn ji zimanê fransî hez nakin!.. Hûn naxwazin fêr bibin!..." digot û agir ji devê wê diçû.

Carina, gava ku dereng dihat û hinek di dersxanê de ne hazir bûya, wê bi lez berê xwe dida îdarê û bi mîkrofonê, dikir qîjewîj: "Filankeso!... Xwendinê dest pê kiriye! Here li welatê xwe razê, vir ne ciyê razanê ye!" Û ku ew reben bihata, bi saxî ew direwisand û digurand. Di herdu hefteyên pêşîn de, bera du biyaniyan da. Bi ûşta "nexwestina wan, fêrî zimanê firensî bibin!" Wê çaxê jî biyaniyan hemûyan bihîstin ku midûre, madam Laplas, xweha bizina piyoş e û çi bixwaze dike!

Bi vî awayî meha yekê derbas bû, bêyî ku biyanî fêrî tiştekî bibin, ji bilî elfaba fransî, nivisandina adresên xwe û çend gotinên bingehî. Lê te digot qey giştan derseke xweş ji "rewisandina" Mircan ya roja yekê sitendin. Ku bizinê qoloçê xwe li kê rabikira ew ji ber ne difilitî, heger mirêsê xwe ne kiri bûya wek yê Mircan, roja yekê.

Di gel ku piraniya biyaniyan dema pêşîn tiştek jê fanı ne dikirin, lê mirês û rûçikê wê, bê şirovekirin pirs li ber wan dadihanî: "Çima tu hatiyî Fransayê? Te li welatê xwe çi kiriye? Hûn nabînin ku fransî tev betal in? Hûn nabînin ku fransî li hin bajarên Fransa bûne "kêmanî"? Newêrin bi şev ji malên xwe, ji ber serseriyên bêgane, derkevin!?... Çima hûn narin welatê xwe, yan jî welatekî din!?..."

Serî her çendekî dora "rewisandina" yekî dihat. Mircan jî, te ê bigota ji roja yekê ve zengeloka wî hat birîn. Bi carekê re gotin jê çênedibû. Gava di dersxanê de "şer" dest pê dikir, wî serê xwe dixist ber xwe û bi nîvrûhî di rewşa xwe de difikirî.

Dengê bizina piyoş nema matmayîn pê re dixuliqand. Ew hînî hemû fêlbaziyên wê bû. Lê tim û tim pirsek di serê wî de dixiliya û nikari bû ûşta wê bibîne ku "Gelo çima bizina piyoş di roja pêşîn de dest bi rewisandina wî kir?"

Carekê, piştî dersê, Wawîko, weke ku qerfan bike, jê re got: "Sekretera medam Laplas, Fatîmayê îro li te pirsî, te ew dît?"

Tu temahiya Mircan di Fatîmayê de weke yarekê tune bû. Û çawa ku ji karkerên welatên ereban bi saw bû, wiha jî wî xwe ji Fatîmayê vedikişand. Û tu sipehîbûna wê jî tune bû ku ew bi ser xwe de bikişanda. Ji roja pêşîn û pêve jî, tu carî bi direjayî bi wê re ne peyivî bû.

Gava derbasî îdarê bû, Fatîma bi tena serê xwe bû, Mircan xist dilê xwe û xwe bi xwe got: "Ez ê îro jê bipirsim bê çiqasî rehên erebî tê de mane?" Lê keçikê berî wî li rehê wî xist.

- Misyo Mircan!... Aniha bi rastî jî tu bi erebî dizanî? Bibore, ez vê pirsê dikim ji ber ku beriya niha jî, madam Laplas û Janêt li ser vê yekê keti bûn qirika hev! -Bêyî ku xwe tev bide, ji pişt masa xwe pirsî û serê xwe xiste nav kaxizan.

Mircan di ciyê xwe de bû weke ku tu wî bi bizmaran bikutî. Tu bersivên wî yên amade ji vê disergirtina erzşikênandin û pirsa bi guman re tune bûn.

- Matmazêl Fatîma! Ma tu bi erebî zanî? -Bêyî ku tu mebestan di dilê xwe de bimeyîne, weke wê bi îngilîzî pirsî.

- Na! Bi daxawa, ez bi erebî nizanim! Lê te mebesta min fam ne kir! -Zarava wê hat guhartin, piştî ku rehelîna zarava Mircan ji qirika wî bihîst- Mebesta min ji pirsê ev e ku: Heta niha, ji cerga ev foya hatiye avakirin, ji bilî te, ji welatên ereban tu kesekî weke te biyanî ne hatiye!.. Em zanin ku li hin welatên ereban partiyek tenê, Partiya Olî di mixalefetê de ye. Me çend endamên wusa, li Parîsê û deverên din bihîstiye. Lê bes tu, ne zilamekî oldar î, tu ji Bulgaristanê hatiye. Heger tiştek di vê dagoşê de hebe, ji min re bêje, bi ehd ez ji kesekî re nabêjim!

- Matmazêl Fatîma! -Mircan gotina wê bi aramî qut kir- Ez kurd im! Heger tu dixwazî li ser kurdan tiştekî nas bikî, ez

karim navê çend pirtûkan bi zimanê fransî bidime te. Lê heger heta niha, te tiştek li ser wan ne xwendi be û ne bihîsti be, bi daxawa, bi axaftina me ya niha, ez ê nikari bim tiştekî hêja ji te re bêjim...

Mircan gotina xwe dirêj kir; geh ji dîrokê, geh ji coxrafya û geh ji rewşa civakî û polîtîka gelê kurd nimûne dihanîn... Û di dawiya axaftina xwe de pirsî:

- Na xwe ji ber vê yekê mamosta ziman, Janêtê, di roja pêşîn de ew hiner anîn serê min?

- Na! Na! -Bi ken înkar kir. Ez ê ji te re meselê bêjim, got û gotina xwe berdewam kir. Ev xeysetê wê yî kevn e. Ew ji biyaniyan hez nake. Her grûpeke nû ji biyaniyan tên, ew dest bi şerê wan dike, wan çavtirsonekî dike û dûre weke gogê, ji xwe re bi wan dilîze. Kes nema êdî diwêre tê hilde û li ber wê rabe! Te fam kir? Tu guh nede wê. Ew dîneke beradayî ye!...

Fatîmayê gotina xwe li ser Janêtê dirêj kir lê dawiyê bi dilovanî got:

- Tu zanî!... Bila Janêt ji te re nebe mestera fransiyan. Fransî şerîftirîn milet in. Tu zanî ku biyaniyan çavên wan derxistine?.. Cak Şîrak, reîsê belediya Parîsê, di axaftineke xwe de li pêşiya xelkê bajarê Marsîliyayê got: «Heger xelkê bajêr dengê xwe bidin min, di hilbijartina seroktiyê de, ez ê bikim ku xelkê Marsîliyayê kengî bixwazin, ew ê bikari bin ji malên xwe derkevin!»

Mircan wê çaxê di dilê xwe de got: «Janêt ne tenê ez çavtirsonekî kirime, wê qidûmê min jî şikênand! Heger ji nû ve ez serê pisîka jî li ber hilqetînim nema feyde dike!» Lê wî bi carekê re jî destê xwe ji dibistana bizina piyoş şûşt ku bikari be fêrî ziman bibe. Çûyîna dibistanê jî, danê sibehî û yê êvarî, jê re bû barekî giran. Wî tev kasetan pirtûkek «Hînbûna zimanê fransî bê mamoste» kirî û roj bi roj di zanebûna ziman de xurtir bû.

Di wê demê de, Mircan bi gelek tiştan mijûl bû: ku namekê li ser rewşa xwe ji serokwezîr re bişîne; ku ji serok komar re, yan ji organîzasyona OFPRAê re. Lê ji ber du tiştan hertim bêçare dima: Ji ber ku ji wan kesên bi wî re, ji tu yekî jî

hêviya polîtîkî û zanebûnê ne dikir -li gor têgêhîştina wî, piraniya biyaniyan bi mebestên ekonomîkî îltica kiri bûn; û ji ber ku kesên hêviya ji xwe bike û li dora wî rêz bin, tune bûn. Yên li ber çavan dîsa Artîxil û Emîn bûn, lê wan jî çavê wî danedigirtin.

***

Di gel ku Mircan piştî «dersa» pêşîn, bi awayekî hewasbelqitî û bêserî çû oda xwe, lê birîna wî di hundir de bû. Laşê wî giran bû û xwe tev ne dida. Lê te digot qey, yê ku pozê wî ket pirikê Artîxil bû. Wê êvarê, wî çay li cem xwe çêkir, piyalê ji du sê odan da hev û anî li oda Mircan danî. Te ê bigota hatiye miezê.Derî jî li pişt xwe vekirî hişt. Mircan bala xwe dayê ku Wawîko, her orta bîstekê û bîstekê, bêdeng radibe derî digire, lê Artîxil, bêhneke kûr dikişîne û bi int diçe derî vedike, weke ku bayê hundir waca nava wî hênik nake... Cixare ji cixarê vêdixist û tebatî ne diketê. Geh radibû, geh rûdinişt, weke ku keleke giran wî hiltîne û datîne. Rûçikê wî jî bi hilanîn û danînê re dihat guhertin: Geh bi mieztî di ber dilê Mircan dida û gotinên wî yên kurdî zaqif li hev siwar dihatin: «Ne tişt... Devrimci hal devrimci, şoreşgerî tezhîyet lazim... var! Yaho Fransa... Ax! Fransa şerefsîz! Rasîzm valla rasîzm! Baş... Baş tune! Ne tişt!» Carina jî rûçikê xwe dikir weke yekî ku gefa li hinekan bixwe. Wê çaxê, destê xwe yê çepê bilind dikir, dikir kulm û dihanî ber çavê xwe: «Imperyalîzm aynî. Kapîtalîzm aynî... Turkiye, Firansa aynî! Mûcadele li Tirkiya û Fransa aynî...! Em herin pêş Mircan, em herin pêş, dem û dewra me ye!» Welat, azadî, sosyalîzm li benda me ye... Erê weleh...!

Emîn jî li kêleka wî bû. Artîxil çi bikira, weke wî dikir; çi bigota, wî ducar dikir... Rabûya radibû, rûnişta rûdinişt... Te ê bigota siya wî ye. Çawa tevbigeriya siya wî jî wilo tevdigeriya. Tenê cudayiyek di navîna şexs û siyê de peyda dibû. Yê ewil bi hêrs digot û dikir, yê din sist dikir û bi dengê zîxanokî digot. Carina jî gotinên Artîxil werdigerand zazakî -ji bo ku Mircan baş têbigêhîje! Û jê dipirsî jî «ti fam kenê?...»

Mircan wê şevê ne tişt ji xwe û ne jî ji rewşa mieziyên xwe

têdigihîşt. Wî tenê fam kir ku ev herdu ehmeqên ha, heger «herin heyfa sinbêlê wî, ew ê riya wî jî li ser kin!...»

Û carina di hişê xwe de di rewşa Artîxil û Emîn de bi awakî feylesofî difikirî: «Merivê bindest be û ne azad be, tu carî xisletin merovtiyê bi temamî di şexsiyeta wî de peyda nabin. Wê peyvên wî ne yên wî bin, hêrsên wî ne yên wî bin û tu carî bi hiş û aqilê xwe nikari be hikim li tevger û lebata xwe bike... Emîn siya Artîxil e û piraniya hêzên çepên kurdan di dema hazir de siya çepên hêzên netewên serdestên ku şexsiyeta xwe kifş ne kirine û bi hemû awayên xwe di bin tasîra wan de dilivin. Ev ji bo tevgera kurdî, rewşeke pir giran û çetin e. Heta çepê kurd şexsiyeta xwe peyda neke û xwe bi şertê hebûna miletê xwe gewde neke, ew ê nikari be bibe xwediyê tevgera konevaniya miletê xwe.»

Kat bi «miezîyan» re giran diliviya. Her çiqasî Mircan hewl dida ku xwe bi mêvanê xwe xweş bike, yan çepsandina gotinê wan bike, lê bê sûde bû. Di xurcika gotinê wî de tiştek li rewşa wan ne dihat. Ji wan xweşgotinên ku dikir, ji bilî: «Erê, baş, sipas, înşallah!» li tiştekî din rast ne dihat. Te ê bigota zimanê wî ji bilî van gotinan, tiştekî din nikare bikar bîne. Piştî ku kat teqnekî derbas bû, Mircan di çavê mêvanê xwe de nerazîbûnek xwend. Artîxil eşkere dawa qisekirinê lê kir: «Qise yaho!... Dunya, mucadele ha!»

Gava bîstek kin rawestiyan, Mircan ji nişka ve xwe gunehkar dît û pê hesiya ku li hemberî mêvanên xwe kêmasiyê dike. «Gerek e bi kêmanî gotinên ku ew dizanin, bikar bînim! Hema hinekî bi wan re bipeyivim!» Dûre ji xwe pirsî: «Ya Rebî ya Îlahî... Ez ê ji wan re çi bêjim? Çi ji xeynê durişmê bêgîyan û şeht bi van gotinan derdikeve?... Xwezî qe min gû xwari bûya û li pêşiya wan ne goti bûya: ez kurd im!... Ev doza çi li min dikin?... Ez ji ber barana bi roj xelas ne bûm, mezriba êvarê dest pê kir!»

Di wê bîstekê de, mîna ku Mircan hemû merîfet û zanebûna xwe bigivêşe, di hişê xwe de li babetekî munasib geriya ku bikari be bi gotinên xwe yên «tirkî» û kurdî bêje. Li tiştekî rast ne hat: «Way koranî bi çavên we de bê! Ma hûn ker in!

Hûn nizanin ku ez bi tirkî nizanim. Hûn çi dawê li min dikin lawo!?... Hûn bi eşkere ji min dixwazin «qise... qise!» Dûre ji xwe pirsî: «Gelo ev yên ha li ser min çi difikirin niha?» Lê Artîxil nema xwe girt:

- Tu kurd î ha!? pirsî û bi çavekî ku xezeb jê dibarî, awir di Mircan vedan.

Mircan bû weke ku tu wî di ava sar de bikî. Mûyê laşê wî rabûn û nema dizani bû wê bêje çi. Divê bêje «Erê» an «Na». Devê wî ji hev vekirî ma û bi çavên xwe yê matmayî li Artîxil nerî... Tiştekî vî Artîxilî, di wê nerîna wî ya wê sibeha ku di dersxanê de li Mircan nerî, (gava di nav lepê bizinê de) tev tune bû. Hêdîka ji ciyê xwe rabû, derî girt û dîsa bê deng di ciyê xwe de weke berê rûnişt...

Lê Artîxil, te ê bigota hindikek ji taliya miraqê Mircan giyayê û hilma şewata nava wî çûye... Piçekî ji hişkiya xwe danî û berê gotinan guhert, lê dîsa bermeqlubî li wan siwar hat:

- Na!... Ez ne kurd! -destê xwe li sînga xwe xist û şirovekirina xwe berdewam kir- Ez, Turk, lakîn ez û tu heval, yanî kardeş!... Baş... Heval... Yanî yc ıdaş... -destê xwe kir kulm, weke ku di xwepêşendanekê de dirûşman hilde û bi hezaran meriv li dora wî bin!

Emîn behetîmayî keniya:

- Yaho... Aaaa! Yanî yoldaş ti fam kenê?

Mircan serê xwe hêjand:

- Erê! Sipas! -û rûçikê xwe jî kir weke guhdarê ku gotinek jî ji ber nare. Û di nava xwe de qiçqiçî.

Artîxil gotina xwe berdewam kir:

- Kurd, turk aynî memleket... Yoldaş, mucadele kontr-emperyalîzm. Kurd turk fark yok!

Artîxil wê şevê peyv sipart xwe. Biyaniyên ser qat, ku ji wan fam ne dikirin, her carê serê xwe di derî re derdixistin û hilma axaftineke polîtîkî, pir cidî dikirin û Mircan dûa dikir «Xwedêyo ew ê kengî ev ehmeqên ha dev ji min berdin û min rehet bihêlin?!» Lê wî xweş fam kir ku ew bi çi awayî nerazîbûna xwe diyar bike jî, ew ê ne xêr be. Ma, tenê di hinavê xwe de biqiçqiçe.

Mircan di zarava pirsa Artîxil de, ya ku «tu kurd ha!?» bêhawetiyeke har, hov û kor dît. Lê gava dît jî, ku di eynê katê de Artîxil bi hemû hêza zanebûna xwe û lojika xwe, berê gotinan diguhêre, di dilê xwe de got: «Îşev çawa be jî ez ê biqedînim. Lê heta ji min bê ez ê xwe dûrî wî bixim!» Û sonda ku li hotêla Parîsê bi xwe re dabû, di serê wî de lal bû. Dixwest ku tenê «ev ehmeq li parsiyê min nexe, wekî din, çiqasî perwertiya xwe bi tov bi ser kurdan de birjîne, ne xem e!» Û carina jî, xwe bi xwe digot: «Hema pirsan neke!» Ji ber bala wî qet ne lê bû û qet jî mebestên viyalî û wiyalî gotinên tazî, fam ne dikir.

Rewşa vê rojê, di pêwendiyên Mircan û Artîxil de dom kir. Heger «baranên rojê» peşk digîyandin Mircan, «mezrîbên êvarê» bi dilop û şirîn bûn. Û Mircan ma, geh destê wî li ser parsiyên wî, geh li ber ruyê wî... Xwe ji herduyan jî disitrand. Lê...

Jiyana bêgane, bi pêhatinên xwe nenas e!... Çamroxa bêbinî ye, tu çiqasî pê de herî, tu ê tê de wenda bibî... Hertişt tê de ne qamkirî ye. Hertiştên wê, tenê li gor kesên bê tiştek in! Mircan di hokirina xwe de, ku hawê melevanê vê çamroxê bike, roj bi roj, hawên şîrîn, yên gîyanê xwe, yên sixlet xwe winda dikir.

Ji çend rojên pêşîn pêve, wî nema kiravata xwe dixist hustuyê xwe, nema cilê xwe ûtî dikir, nema meşa xwe ya berê dikir! Wî bawer kir, wekî «gerek e per û baskên xwe yên zêde jê bike, heta ku bibe mîna kesên dora xwe!».

Di hefta pêşîn de du sê caran bi Artîxil re diçûn dikanan, xwarin dikirîn, li dora foyê digeriyan... Rewşa wan, ji aliyê derve de hêdî hêdî wek hev dibû. Cudayiyek tenê di navbera wan de xweş diyar dibû: Yê ku dipeyivî tim Artîxil bû û yê ku serê xwe dihejand jî tim Mircan bû. Û jiyana bi hev re, li ser qatekî, di dersxanekê de... çûn û hatin zêde kir. Gotinên Artîxil, yên kurdî bêtir kir û rasthatina Mircan li gotinên erebî, di tirkî de, bêtir kir; sermîyanê wan ji gotinên fransî jî zêde dibû.

Êvarekê, Wawîko xwe li ser textê xwe dirêj kiri bû û Mir-

can jî pirtûka xwe ya ziman dixwend. Ji nişka ve terpînek xurt ji dîwarê wan yê hêla oda Artîxil hat. Wawîko veciniqî, li qûn rûnişt û bi zarekî lomedar got:

- Mîrza Mircan!.. Tu zanî ku ez gelekî qedrê te digrim, lê ku tu rastiyê bixwazî, kêfa min ji van xelkê te re nayê. Ji wan re bêje, bila van bêhawetiyan nekin û bila çûn û hatina wan jî li oda me kêm bibe!...

Mircan xwest yekser wî serwext bike ku ew jî ne mereqdarê wan e. Lê daxuyakirina gotina «xelkê te» bi wî, pêwîstir dît:

- Mr Wawîko! -bi nermî hatê- Berê her tiştî, ez û wan ne ji xelkekî ne. Artîxil tirk e, ez kurd im. Emîn jî weke min kurd e, lê bi kurdî nizane!

- Ez ferqê nizanim, -bi aramî şirove kir- tu merivekî intelektuel î, pir kêfa min ji te re tê, lê ez bi tirkekî re mame, li Almanyayê. Min bi wan re kar kiriye, ez wan xweş nas dikim. Gelekî bêcir in!... Lê ma tirk û kurd ne yek in?... Ma ne hûn bi zimanekî dipeyivin?

Mircan keysa xwe li peyvê xweş kir û nas kir ku gelek jê re divê heta ku diwaserê xwe serwextî rewşa kurdan bike. Lê terpeterpa dîwar dîsa xurt hat û dengê zîxanokî ban kir. «Mircan!»

- Ferq gelek e, Mr. Wawîko -Mircan bi lez got û xwe kar kir ku rabe bi ser gaziya deng de here, lê berê ku derkeve, bi awirê mişt bawerî li Wawîko nerî û got:

- Ez ê ji te re her tiştî şirove bikim! Tenê ez hêvî dikim ku tu niha hinekî bêhna xwe fireh bikî!

Gava Mircan derbasî odê bû, dît ku Artîxil perîkên neqşên rengoreng û rengên celeb celebî, li ser masa xwe kom kirine. Û sê çar plakat jî bi babetên «şoreşgerî» bi dîwar ve kirine. Emîn, destê xwe li hev xist û bi şabûna mindalekî û bi dengê xwe yê zîxanokî got:

- Yaho... Yaho... Artîxil resim. Ecaîb baş yaho!... Ti fam kenê!?

Artîxil bi giranî û heybeta hunermendekî şareza serê xwe ji ser plakata nîvcoya ku li ser masê rakir û bi nîvzîvirandin bi

ser Mircan ve zîvirî:

- Na! Ev gelek ne baş -bi madê tal, serê xwe hêjand- baş Turkiye var, -destê xwe bi hêla pencerê ve kir.

Mircan bala xwe da wêneyan: ne xêzên wan, ne teknîk û ne jî babetê wan, yekî yek ne dixwar, ji hevdu direviyan. «Wêneyên ku zarokên dibistanên nizm çêdikin, ne kêm û ne zêde!» - xwe bi xwe fikirî û di pey re li Artîxil nerî:

- Ma tu li Tirkiyê hunermend bûy?

- Na! Ez Turkiye şoreşger -bi cidîyet got û berdewam kir- lakîn şoreş herşey! -destê xwe bi zirt di ser serê xwe re bilind kir. Dûre destê xwe avêt rojnameke tirkî, navê wê bi xêzên sor û girs hati bû çapkirin, «E.S.» û pelên wê qolapt. Hemû wêneyên plakatên hundir yeko yeko pêş Mircan kir. Li ser wan wêneyên rojnamê, xêzên çarqozî, bi panayî û dirêjayî, tev jimarên kêlekan, di ciyê xwe de ma bûn.

Mircan xwe bi xwe fikirî: «Ev hunermendekî ne tenê efrandin jê nayê, lê nizane kopiyên bi xêzikên çarqozî jî çêke! Diziya hunermendiyê jî jê nayê!» Lê rojname ji dest wî girt û serê xwe xist nav.

Rojname seranser bi wêneyê Stalîn, Enwer Xoce û Ramîz Alîya ve xemilandî bû. Rûpelek jî tune bû ku çavên meriv tê de yekser li gotina Albanya, geh bi tîpên girs, geh bi tîpên hûr û leç, ne keti bûya. Di rûpelekî wê rojnamê de jî, nexşeyeke cîhanê mezin hebû. Tê de hemû dunya bi rengê reş hati bû rengkirin, lê nexşeya Albanya tenê weke deqek piçûk, bi rengê sor bû!

Mircan li ser wî rûpelî bîsteke dirêj rawestiya û bêyî ku serê xwe ji ser rake, pirsî:

- Albanya çend mîlyon e?

Emîn ber ve hat, li nexşeyê nerî û weke şagirtê ku mebesta pirsê, ji ber xwe ve fam bike û xwe li pêşiya mamostê xwe bide xuyakirin, bi dengê xwe yê zîxanokî kir qideqid:

- Kuçuk, yaho, pir kuçuk! -tiliya xwe danî ser rengê sor û dûre bir ser dilê xwe û şirove kir -Albanya pir kuçuk lê qelp dunya... Qelp tûne, însan tûne; qelp war, însan war! Albanya tûne, dunya tûne! Tî fam kenê!?

Mircan serê xwe hinekî bi mana «Erê min fam kir» hejand û di sînga xwe de hummmmeke dirêj bê mane kir xumîn.

Artîxil xumîniya Mircan bi maneyeke taybetî analîz kir:

- Tu çû Tîrana? -bi zarava mamostan ku ji şagirtan dipirse, ji Mircan pirsî.

Mircan di dilê xwe de got: «Tir li ku û das li ku!» lê behetî, destê xwe ber bi xwe kir:

- Ez?! Tîrana?!

- Erê tu tu! -bi bawerî, weke ku wî bi çavê xwe, ew li wir dîti be çepisand.

Gotina «Erê tu tu!», weke gurmîniya taveke buharê di rojeke sayî de, ji nava Mircan anî. Ew pê ricifî û lerzeke sar laşê wî girt. Rûçikê Artîxil jî piçekî ji baweriya çepsandina gotina wî dananî... Mircan xwe ji nişka ve dît weke di hundirê gerzeleke hesinî de û dêm li dêm bi gurekî har re. Xwe piçekî xurciland û keysa xwe xweş kir ku di devê derî re bêdeng derkeve. Lê gurê har qîlê diranên xwe qîç kirin:

- Çima tu na hiz dike qise yaho? Herşey marîfet ha! Ez zane! Tu hevalê Mecîd û Felît, li hotêl ha! Bi ew qise war «erê», bi ez qise «na», çima?.. Pour quoi? -bi zirtî serê xwe hejand.

- Qisên çi heyran? -lêv rehelî pirsî- ez ji te fam nakim, tu çi dibêjî?!

Gurê har serê xwe piçekî çimand, weke ku nêçîrê bide famkirinê «Ez niha te naxum!» û çavê wî bi xedir tev dan:

- Ez zane! Tu Apoçîler! Li Bulgaristan Ûnîversîtê temam. Lê ez jî kurtçe zane. Kurmanc û soran û Rûsçe! Û dixwaze kurd serxwebûn! Ez qise dike, tu qise nake, doxrî dir? Rast dir?.. Çima tu, ez çûn magazîn qise nakî?! Li foyê nakî! Her wext: Erê... sipas... Înşallah! çima? Ez casûs, Emîn casûs?

Mircan behetî ne bû gava Artîxil tuhma partiyetê anî ser, piştî hildana navê Mecîd û Felît. Herweha xerîb jî ne dît ku naskirina wî ya li ser xwendina xwe li Bulgaristanê. Lê di axaftina Artîxil de du tiştên din bala wî kişandin: Çawa vî ehmeqî, heta niha ev tiştana di xwe de girti bû û dernedixist? û pirsa ku: «Ez casûs?» Dilê wî êşiya ku berî niha jî bêhnek

wilo jê kiri bû. Ew jî gava carekê bi hev re çûn dikanan, wê gavê Artîxil bêyî ku pirs jê bête kirin, ser fêrkirina xwe ya zimanê kurdî peyivî û got: «Ez di zîndanê de fêr bûm!»

Mircan, rewş da ber hev û fam kir ku niha çi bêje, ew yê xesirî ye. Lê wî nezaniya xwe ya ziman da ber ruyê xwe û firto firto ji hundir derket.

Ev cara duduyan bû ku hewasê Mircan bi qeremûşkê Artîxil birîn dibûn.

Êvaran, dibû weke mişkê ku xwe ji ber pisikê vedize û veşêre. Hilma Artîxil li kuderê bikira, xwe ji ser wî ciyî werdigirt. Sibehan jî berî hemû biyaniyan ji xew radibû, amadeyiya xwe dikir, ji bo ku li serşokê yan jî li çeştxana qat, çav lê nekeve. Eywana televîzyonê, meşa hêdî li korîdorê û dengê bilind lê herimî.

-V-

Payîzê perê xwe ji ser dêmê erdê da alî û demê bi mirêsên zivistanê aloz vedan. Roj kin dibûn û şev dirêj. Tilûrê şilbûyî dilerizî, baskên xwe yên şikestî bi dû xwe de dikişkişand. Serma bêwaran dijwar bû, xwe berdida ser birîna parsûwan û qeremûşkên hewasan.

Pêşkên baranê û zirpîna meşriban qeşem girtin û nema ra li wan dibû. Dema ku danê êvarê dersa "rawisandinê" xelas dibû, Mircan bêdeng ji foyê dişemitî. Bêhêvî bi dilê sar dilerizî, digeriya û çavên xwe digerand li ser tiştên ku di jiyana wî de tune bûn. Li hêlîneke germ, li çavên bi tîn, li bişirandina dêmên mirovî. Gava ku hinek pêrgî wî dibûn, mîna kûçikê bêxwedî ku bi vî awayê xwe parçek nanê xwe heq bike, bi çav û tevgera xwe dikir kazekaz. Lê li Babilonê ji kûçikên kedîkirî bêtir tiştek tune bû. Tu kesî li kûçikê çavşikestî û bêqudûm ne dinêrî. Hertim jî di çûyîna xwe de û di vegerê de jî, li ser tilmikê pêşiya foyê meşa xwe giran dikir. Carina radiwestiya û çavên xwe digerand "Kanê ew çêlika însanan!" Weke reşikê şevê heta nizani bûya ku tebayê har xilmaş ne bûye, ne diçû lûsê. Ku nêzîkî foyê dibû, ew dibû weke kevjal, bi kêlekekê

dimeşiya û ji bilî ber lingên xwe deverek ne didît. "Hema ez silavê bikim û ew venegerîne! Yan bêje, tu çima silavê li min dikî?"

Mircan pê hesiya bû ku hinek penaber jî, nexasim Wawîko û Emîn, guhertinên jiyana wî dibînin. Ev yeka hîn pê girantir dibû, dema didît ku di dersxanê de dora "rawisandina" Artîxil nayê, û ku hinekî derneg dimîne jî, bizina piyoş bi xilafî awayê xwe bi herkesî re "newqê jê vala dike." Mircan ji xwe re ev belbûn bi du tiştan tefsîr dikir: Yan bizinê hunerên çavên wî dît, gava ku di dersxanê de hêla wî girt, yan jî wê derbên "gurên har" berê dîti bû û xwe ji wan disitirand. Çiqasî ev wêne li ber çavên wî tarî bû jî, lê wî hêviya xwe qut ne dikir, wekî ew ê roja wî bê.

Mircan dengê xwe qet nema dibihîst. Hertim di hundirê nava xwe de bi xwe re dipeyivî û diket ramanan. Bîstikên herî dirêjî ku tê de dengê xwe dibihîst, bi Wawîko re bû. Pêşiyê jê re li ser kurdan peyivî, piştî ku gotinên wî miçiqîn, çend gotinên bêmane tenê pê re man û ew jî dema ku ew ji xew radikir digot. Danê êvarê jî piştî ku dibistan xelas dibû, jê re digot: "Ji kerama xwe re pirtûkên min bibe odê, ez ê herim ji xwe re bigerim." Ew jî ji bo ku li ser derencê an jî li korîdorê çav li gur nekeve.

Wawîko di çavên Mircan de ziravê wî yê qetyayî didît. Û di demên pêşîn de beriya ku Mircan xwe ji teba vedize, jê re bi fort û payebûn pesnê jiyana xwe ya berî niha li Almanyayê dida û digot:"Serên herî mezin, min pêlê dikirê, min bi peran dilîst. Min jin û zarokên xwe bi tamtika xwedî dikir!... Lê niha?..."

Mircan jî ji gotin, tevger û lebata Wawîko wêneyekî serast li ser şexsiyeta wî di hişê xwe de çêdikir: Beriya ku Wawîko ji Ganayê derkeve, çençihekî serserî bû. Li ser karê reş, li ser kirîn û firotina "giyayê kêfê" dijiya. Bi riya hinek nasên xwe digêhîje Almanya rojava. Pêşiyê li wir wekî karkirekî kar dike û dûre jî li karê xwe yê berê vedigere. Li wir dibe xwedî jin û zarok. Polîsên Alman pê dihesin, wî digirên û dixin zîndanî. Piştî ku du salên xwe di zîndanê de diqedîne, dikeve ber

efûyê, wî derdixin û dişînin welatê wî. Ji welatê xwe cara duduyan bi pasport û navekî nû derdikeve. Dibihîse ku li Fransayê serlêdana penaberiya polîtîkî zû qebûl dikin, tê vir!... Lê kaxezên wî zû bi zû ne hatin. Li Fransayê çavên xwe li keçikekê digerand û digot: Çawa be jî ne xem e, kor be, seqet be, pîr û bêdiran be... tenê wî bîne ser navê xwe ku paporteke Europî têxista bêrîka xwe. Û bi hêviya vê hesretê jî, her hefte du caran "loto" dikişand û digot: Keçik hene ku bi perên zêde merivan tînin ser navê xwe. Vê rewşê tenêtiya Mircan kûrtir dikir. Lê herweha jî gotinên penaberan li ser ûştê xewlebûna wî zêde dikir. Mircan di çavên wan de tefsîrên rengoreng dixwend, lê şopa dûvikên ku Artîxil pê ve dikir, di sitiriyên awirên hemûyan de xuya bûn. Wî xwe bi xwe digot: "Ji sedî sed Artîxil, ez di çav vîetnamî û laosiyan de kirime yekî bulgarî. Lê tew ew yên polonî, nexasim ew yê bi navê Xirpofskî, ez: ez sorê sor bûm. Di çavê Emîn de jî helbet ez kirime nasyonalîstekî hiştarî!Tenê ma Wawîko, ew yê ku Artîxil -di gel hewildana xwe pê re- nikare wî bîne ser riya xwe. Ew jî ji ber acizbûna Wawîko bi xwe, ji tirkan û dûrketina wî ya ji Artîxil bû. Lê Wawîko jî jê re bi awakî din bû bû şêr. Nema êdî ne rêzgirtina wî jê re weke berê bû, û ne jî gotinên wî bi tîm bûn. Di gel ku tu carî Mircan hêviyên wî di çavên wî de ne diqurmiçandin. Tenê di nava xwe de carina li ser wî digot: "Wawîkek e û berateke Europî jê re bûye hesret, çi hêvî ê tê de hebe!"

Rojekê Madam Laplasa midûre li deriyê dibistanê xist û bi keçeke 25-27 sale, porzer û kevjal re derbasî hundir bû:

"Nas bikin! Madam Karniyan, navê wê yê pêşîn, Brîcêt e." got, destê xwe ber bi aliyê keçikê ve kir û domand: "Ji îro û pêve ew ê weke xebatçiya alikariya sosyal bi we re kar bike. Ciyê karê wê li kêleka îdarê ye. Ji we herkes ê pirsa kar, staj, jiyana xwe ya dahatû li Fransayê ji wê re bibêje û bi wê re çareyan bibîne. Weke ku hûn jî dizanin -gotinên xwe berdewam kir- ev nêzîkî çar mehên we ne ku li vir diqedin. Hûn hinekî fêrî ziman jî bûn ku êdî li ser tedbîra jiyana xwe ya dahatûya li Frnansayê bifikirin. Hersal van çaxan karûkuşiş bi awayî ra-

dibe. Îsal jî şansê we ev madama ciwan ket..."

Mircan carekê tenê serê xwe hejand û wî û Brîcêtê li hev nerîn. Lê pêre pêre nerîna xwe ji ser guhert. Çavên wî xweber du sê caran kutkutîn. Çavên Brîcêtê yên dindoqî, kerimî û weke yên pisîkan awirtûj bûn. Mircan wê çaxê di dilê xwe de got: "Ku hundir tarî bûya, ew ê şewq jê biçûya!" Kortikên çavê wî jî çermekî bê ruh, weke yên qalimvexurê giyayê kêfê bû. Gava çavên wan bi hev ket, mîna ku tîştekî tûj di çavên Mircan de rabe, wî nikari bû çavên xwe têxista çavên wê.

Piştî bîstekê, mîna ku Mircan hemû pakbûna gîyan û hêza xwe têxe çavê xwe û dîsa lê nerî. Lê weke ku Brîcêt ji berê de bi hunerên çavên xwe biliya be, bişirî û awirên xwe yên tûj hûr kir û di nav mijankan re raserî wî kir.

Çena Brîcêtê dirêj û zirav bû weke çena rovî, lêvên wê sist bûn û meriv digot lêva wê ya jêrîn ê jê de bikeve.

- Min li dosya te nerî. Divê em bi hev re bipeyivin. Li gor dîplomên te, ez bawer im, em ê çareyeke baş bibînin -beriya ku derkevin, berê xwe bi Mircan de kir û got.

Di herdu rojên pêşîn de, piştî hatina Brîcêtê Mircan du caran xwe kar dikir ku here cem. Lê mecal bi dest ne diket. Roja pêşîn reşê Artîxil li korîdara qatê erdê dît. Roja duduyan Xirpofskî û hevalê xwe î polonî li wir bûn. Hercar jî bi şûn de vedikişiya û diçû "gera" xwe. Sibehekê, gava Mırcan weke her roj Wawîko ji xew rakir, Wawîko çavên xwe yên zexel bi mizgînî fûrand, di bin simbêlan re keniya û weke ku qerfekê bike, got: "Do êvarê Artîxil çû Parîsê!" Bi bihîstina vê hevokê, dêmê Mircan bû weke gilopeke lampa ku tu vêxî û vemirînî. Şewqa şabûnê û sarbûna pêkenînê di wî de gêhîştin hev.

Şewqa şabûnê û sarbûna pêkenînê tevayiyê rojê tê de vêdiketin û vedimirîn. Tîn û seqemê, agir û cemedê ew hildihanî û dadihanî û di laşê wî de geh cuda cuda digeriyan û ew dikirin weke du perçên germ û sar ku tu wan bi zorê bidî ser hev; geh jî herdu digêhand hev û ew di bin wan de diheliya. Tevayiyê rojê belawela bû.

Piştî dersê derbasî oda madam Brîcêtê bû, destê xwe î sar dayê û li hemberî wê li ser qiçeqiça nava xwe rûnişt. Çavên

dindoqî û çena rovî li ber çavên wî, geh diketin heyeta pîrebokekê û geh jî xifşê xezaleke çavmezin. Beriya ku dest bi pirs û bersivan bike, madam Brîcêtê hewasa Mircan ya tamsarî bêhn kir. Ji rûniştina wî û bişirandina dêmê serbejêr, bi jîrî xwest rewşê biguhere û got:

- Ev çend roj in ku ez li bendî te bûm, min texmîn dikir ku ez ê pêşiyê li ser dosya te bixebitim!

Mircan berê, xwe bi xwe got: "Viya nîşana xwe li ser min danî bû, ez nas kirime û ji bîra ne kirime!" Dûre bê hemdê xwe germ û sar tev li hev kir, bi fransiya xwe ya qels xwest gotinên qelew bike:

- Xêra dawîn bêtir e!

Brîcêt bi şewq fûriya:

- Çi, çi?... got, serê xwe bi delalî hejand û keniya, weke ku mebesta gotinê li gor dilê wê hati be gotin. Lê xwest ku çepisandin û kûrbûna wê derxe.

Mircan xwe xurciland û tîna mebesta xwe, bi awirên xwe bi guhertina gotinê xurtir kir:

- Min got, xêr di dawiyê de ye!

Weke ku Brîcîtê ji xwe re li sîrkê numereyeke bêhawe dîti be, bi hîkehîk keniya û destên xwe li hev xist.

- Bravo, bravo!... min bawer ne dikir ku ez ê di nava penaberan de yekî wekî te jîr û henekçî bibînim!...

- Tu hînî van gotinên dumaneyî jî bûyî?... Ev çend roj in ku ez li vir im, hîna fena îro ji dil ne keniyame!

Mircan bi rewşeke sarûgermî keniya, lê bi xwe re kete gumanên sar û xwe bi xwe got: "Vêya ji deqeya pêşîn de ez kirim henekçî, lê ez ê bi vî mirûz û zimanê xwe yê qels henekan jê re ji kuderê bînim." Lê hîsên wî yên bi tîn, di dil de tev rabûn û di dilê xwe de got: "Ev ya ha, li vir hîna kesekî hespê wê av ne daye! Ew kewujiye û li hemana ye!... Ma ne wê bi xwe got: Min texmîn dikir ku tu ê yê pêşîn bî ku!... Ma wê ê ji van gur û wawîkan kî kiri be serê xwe? Meheqek keçikê dosya min xwendiye û ji nav giştikan ez di çav xwe re kirime..."

Mircan mijûl û gumanên xwe di ser hev re qulupandin û awirtûjiya tî û birçiyên mêkewan bera ser sîngûberê Brîcêtê

da û hêdî hêdî nerîna xwe şêrîn kir û bir ser qirika tazî û li ser lêvên sist çavên xwe bîstekê girt. Di wê gavê de Brîcêtê jî bi diziya awirên tirsonek hesiya û hewesa Mircan peland. Lê piçekî xwe ji ber masê bi şûn de da û hinekî xwe li ber tîrên awiran sist kir. Lê mîna bibêje: "Pele neke, em li daîrê ne!" Berstika îşligê xwe yê ku heta qurmê pêsîran vekiri bû, piçekî bi ser hev de hanî, destê xwe li bişkovan peland, lê nexwest wan bigire. Bi kişandina bêhneke piçûk:

- Baş e, got û ji nava kaxizên pêşiya xwe yek kişand, da ber xwe û berdewam kir. Beriya hertiştî em ê vê kaxezê dagirên. Na... bi rastî jî min ji bîr kir ji te re bibêjim ku divê ez beriya seet şeşan li nexweşxanê bim. Soza min ji nexweşekî me re heye!.. Ku em îro negêhîjin axaftina xwe biqedînin, em ê sibê temam bikin.

Mircan matmayî pirsî:

- Çi, nexweş?

- Mitîne Mîchel, ma tu wî nas nakî? Ew xortê girs î sempatîk berê di foyê de dijiya.

Mircan bi van pesnan navê xo' tekî fransî ji Wawîko bihîsti bû. Û bihîsti bû jî ku ew yê dîn carina li pêşiya foyê bi kûçikê mamosta ziman re dilîst. Digot: "Kûçik pozê wî dalast û wî jî yê kûçik! Û ji xeysetên vî dîn î ku bi navê Mîchel jî bihîsti bû ku her meriveki dibîne, (nas be, nenas be) lê radiweste, silav dike û heta meriv dev jê bernede ew ji ciyê xwe nameşe!" Lê Mircan bi xwe deqa deqa raserî wî ne hati bû. Mircan matmayî pirsî:

- Ma te kengî ew nas kir? Tenê ev çend roj in ku tu li vir î.

Brîcêtê bi ken got:

- Ev karê min e! Li Fransayê alîkariya sosyalî baqilan, dînan, betalan û penaberan teva dixe bin baskê xwe. Em jiyanê bi wan şêrîn dikin.

Brîcêtê gotina xwe ya dawîn bi lezet got, weke ku maneyeke taybetî têxe nav, "em ê li ber çavên te jî şêrîn bikin!" û bi wî zarî jî pêşniyar kir:

- Ma tu bi min re nayê? Ez ê bi trompêla xwe herime cem!... Ku ew ji rûniştvanên foyê yekî bibîne, ew ê gelekî kêfa

wî were. Gava ku Mircan gotina "trompêla xwe" bihîst, xwe bi xwe got: "Jinik pele nake, lê dizane kuderê çi ye?!..." Serê xwe hejand:

- Erê!

Dema ku Brîcêtê kaxeza Mircan dadigirt, bi her pirseke xwe re pozek dikişand û gotina pirsa xwe di nav melaqî û şelahiya xwe ya mê de dikir... Piştî ki kaxez xelas kir, bi destê xwe î sist pênûs dirêjî Mircan kir û li lêvên wî nerî:

- Vir îmze bike, got û awirên xwe ji lêvên wî qut ne kir.

Mircan berê li paş xwe nerî, xweziya xwe ya weke şîrêzê daqultand û hêdî hêdî destê xwe di ser destê wê re bir û pênûs bi awakî seksî di nav tiliyên wê re bir û hanî, û... îmze kir.

Dilê Mircan di gerzela sîngê de hilperikî û bi şabûneke matmayî mîna çûkê baskokirî ku tu deriyê gerzelê jê re vekî laşê wî sivik bû, azad bû, lê baskê şikestî ew bi bayê azadiyê ne dixist, hilnedigirt û bilind ne dikir.

Wexta bi Brîcêtê re li trompêlê siwar hat, serê wî di ber wî de bû. "Gelo ev biyaniyên har ê çi bibêjin? Ma ew ê çi bibêjin? Ew ê bibêjin, gava pisik ne li mal e, mişk malxwevan e! Wa!... Tu bi Xwedê dikî, ma li ruyê dunyayê ji min pîstir kes heye? Ma ji min bênamûstir kesek heye? Ku ez ne pîs bûyama, ez ê ji zû de li tenişta Brîcêtê siwar bihatama û dibe ku pêwendiyên me jî ji nuha jî gelek baştir û xurtir ba. Dilê tirsonek bi sîngên gewr şa nabe! Lê ahd û wahd be li ber Xwedê ku ew bênamûsê şinik xwe têxe riya min, ez ê lêxim... Ez ê çavên wî birijînim. Dunya çi ye? Dunya bîstikên jiyana serbilindiyê ye. Bênamûsî û sernizmî ne jiyan e!"

Gava trompêl hêdî hêdî di pêşiya foyê re digindirî, Mircan di nava mij û dûmana ramanên xwe de bû û ji nişka ve gurmîniya defê ji dilê wî hat. Çavên wî bi wê keçika biçûk "çêlika însanan" ket û te ê bigota ji pêlên awirên mindalî û bi kîn, çemek kete pêşiya trompêlê û herikandina wê giran kir. Di tirompêlê de Mircan ji cara pêşîn bêtir nêzîkî wê bû û rewiştên dêmên wê yên nişmî di hişê xwe de civand. Wêneyekî ji van wêneyên horiyên biçûk yên ku di ser serê Hz. Îsa re sîngvekirî û bi bask... Brîcêt bi cêritî jî ne dihat fesalê.

Dema ku trompêl di wir re derbas bû, Mircan bişirandineke mirî hanî ser dêmê xwe, sar û bêgiyan di ber re derbas bû. Piştî ku piçekî jê dûrketin, hinekî xwe xurciland û di neynika pêşiya trompêlê re lê nerî. Keçikê mûyek jî ji halê rawestina xwe ne guherand. Di ciyê xwe de hişk bû bû û çavên wê bi trompêlê ve man. Di neynikê de ji Mircan re hat sewirandin ku keçikê destê xwe bi kulmikî jê re bilind kir:

- Ma tu wê nas dikî? Ji nişka ve Brîcêtê dengê xwe kir, çen û çavên roviyane di neynikê re hatin ber çavên Mircan.

Mircan bi awakî nebawer:

- Na, got û gotin zivirand. Dibe ku wê ez şibandim hinekan.

Çavên roviyane li dora babetê çîrvîtik berdan, serê xwe di neynikê de hejand û got:

- Dibe ku tu naxwazî ji min re bibêjî.

Mircan keniya û bê deng destê xwe di paş kursiya wê re bir ser qevdeke porê kevjalî û li wir hişt.

- Atansiyon! Em di nav bajêr de ne. Tu wusa dikî ku em birîndar biçin nexweşxanê.

Nexweşxane li derveyî bajêr bû. Gava ku ji bajêr derketin, Mircan bi destê Brîcêtê yên li ser vîtêsê girt û bi hejandin got:

- Ma tu naxwazî ez hinekî bajom?

Brîcêtê bi kenê xwe re mîna bawerî kir ku bi rastî jî mebesta Mircan hajotina trompêlê be, hajotina xwe giran kir û hêdîka li kêleka rê rawestiya.

Dema trompêl rawestiya, destê Mircan yê çepê di nav por re gêhîşti bû ser guharê wê. Brêcêtê çavên xwe yên bêgîyan melûl kir û bi dengekî nizm got:

- Were ciyê min, tu bajo.

Mircan xwe ber bi wê kir, heta kaboka wî ya lingê rastê kete binê hêta wê ya qalind û nîvziviradî, wek ku bixwaze ricifîna di nava xwe de sist bike, bi herdu destan dêmê wê hanî hev û serê wê hêdika hejand:

- Xwedê tu ji min re ji kuderê anî! got û bi van gotinên xwe re devê xwe gîhand hinarûkên wê û daket lêvan.

Brîcêtê desteki xwe danî ser hêta Mircan û yê din di nav porê wî re bir û anî. Dûre devê xwe ji devê wî dûrxist.

- Tu tirsonek î! got û bi ken berdewam kir. Hîn di roja pêşîn de di nav penaberan de çavê min li te bû, lê tu di ser min de ne dihatî. Ez li vir tenê me. Gelekî nerihet dibim. Di foyê de merivên baqil dîn dibin. A ez jî weha... heta niha we çawa ev wexta qedand!

Gotina ku «tirsonek î» lerzeke sar bi Mircan xist, ricifîna wî lê zêde kir û mûyên laşê wî rabûn. Gava Brîcêt dipeyivî, ew xwe bi xwe difikirî û ditirsiya ku tiştek bi wî re dernekeve.

Di nav diranên xwe yên rikrikî re pirsî û got:

- Brîcêt! Ev hundirê trompêla te çiqas sar e! Ma şofaca te tuneye?

Brîcêt keniya, dûre bi herdu destê xwe destên wî dan ser hinarûkên xwe û guvaşt:

- Rebeno, te sar e! Ma ev çend roj in ku tu li ber sermayê ye? Te çawa deh sal di nav berfa Bulgaristanê de qedand? Bi rastî jî... ma tu dizanî bê ji Babilonê re dibêjin çi?

- Na!

- Dibêjin, «Sibîrya Fransayê!» Te hîna sar û sermayên vir ne dîtiye... Bayên wusa radibin ku carina xaniyan jî li ber xwe dibin!

Di gel ku Brîcêtê gotin hinekî guherand, lê bi gotina «serma Bulgarîstanê» xwe li hilmeke din girt. Bi wê gotinê re jî neqrîskê li nava Mircan xist. Ji alîkî ve wî xwe lomand ku keçeke weke agir di nav lepê wî de ye û ew hîn jî jê re dibêje min sar e; ji alîkî ve jî ramanên wî li eksê xistin. «Di nav berfa Bulgarîstanê de ez dilgerm bûm û niha jî li ser sîngûberê te sar û sermayê girtiye ser laşê min!» Lê wî fahm jî kir ku wext ne ew wexta ye ku qayişê bi wê re bikêşe. Destê xwe yê çepê di binçengê wê re kir, xwe bi şûn de da, ew bi ser xwe de bi şûn de li ser kêlekê qeliband. Desteki xwe kire nav pêxîlên wê, serê xwe xiste nav û destê xwe yê din di ser navikê re, du bin doxînê re ber bi jêr bir. Brîcêtê berê çîpên xwe hinekî dan hev, lê dûre heta ku jê hat çîpên xwe ji hev kir û bi destê xwe yê ku keti bû bin wê, alîkariya wî kir ku bişkokan veke. Û di

wî ciyê teng de, xwe mîna marekî li hev digerand û bi hêta Mircan ve ber bi jor diçû.

Laşê Brîcêtê sist û nerm bû. Çiqas ku Mircan ew di nav lepê xwe de dida ser hev, ew biçûk dibû û dibû weke kulorekê. Lê serê wê kulorê ne ditebitî. Xwe dirêjî «çûkê» nav lingên Mircan dikir. Her ku Mircan serê wê bilind dikir û devê xwe dixiste devê wê, wê serê xwe ji kulorê dirêjî «çûkê» wî dikir.

Û ji nişka ve wêneyê Artîxil bi hemû hovîtî û hiştarîtiya xwe ve hate ber çavên Mircan: «Tu bi eva imperyalî re çi dikî, ha!» Laşê wî sist bû û xwe hinekî ji Brîcêtê vekişand. Gava ku Brîcêtê bi awakî hişk pîpikên çavên xwe bera ser pîpikên wî yên di xewnê de da, bi intîn li qûn rûnişt, heta ku jê hat destê xwe li gîdona trompêlê xist û :

- Mêrd(*)! got û ev peyvika hişk ji nav diranên xwe yên zingarî derxist.

Mircan serê xwe bera ber xwe da û gotin ji devê wî derneket. Piştî gavekê Brîcêtê bi qerf di ber re havêt û got:

- Tu nexweş î, ez ê te li cem Michel bihêlim!

Li cem Michel gelekî dirêj ne kirin. Brîcêtê berê jê re hinek hûr-mûr kirî bû. Gava ku kîsê hûr-mûran da dest, kîsekî kaxezîn ji nav derxist, bilind kir:

- Ev sêvên ha, Mircan ji te re kirîne, bi bişirîn got, li Michel nerî, dûre berê xwe bi Mircan de kir û gotinên xwe yên bi Michel re domand. Lê ew tiştên din, min bi perên te ji te re kirîne, Mîchel!

Dûre kaxezek ji bêrîka xwe derxist û da dest Michel. Mircan di kûraniya baweriyên xwe de qet yeqîn ne dikir ku vê comerdî û marîfeta şox ji Brîcêtê bibihîse û bibîne ku ew sêvên xwe bi navê wî diyariyê Michel bike. Ew li ser vê ciwanikiya wê difikirî, lê dema ku Michel kaxeza hesab ji dest wê girt, bi kawik û kûranî lê nerî, «bazirganiya Îsmayîlê dîn» hate bîra wî û di pey re jî lerzekê bi laşê wî girt. «Hema ev qehpika li

*(*) Bi fransî ye. Sixêfek e ku di demên acizbûnê de, bi mana "pîs, gû" tê gotin.*

ber Michel dawa min li ser serê min negerîne... sirên ku têkevine devên dînan, dibin sosirmet!» Lê te digot qeyê Brîcêtê jî wusa dûrtir dinerî.

Michel jî şêtekî entîke bû. Ji van yên ku destên merivan ji wan nabe. Ken û henek ji her deverên wî dibarî. Ji bilî çavên wî yên bi mij û dûman, weke yên masiyan, yan jî hertim girover û vekirî, bêhna tiştekî şêtbûnê jê ne dihat. Wî çêyiya «sêvên Mircan» jî bîr ne dikir û her serî bîstekê li Mircan dinerî û digot: «Mercî, tu hevalê min î!» û dûre jî vediniciqî. Carina destê xwe li çoga xwe dixist û bi îngilîzî digot: «YES!»

Du sê caran Brîcêtê bi qerfî jê re got:

- Navê wî Mircan e, ne «Yes» e.

Lê deng ne diçûn çavên bi dûman. Wî her weke xwe digot: «Oh!... yes!»

Di vegerê de çavên Mircan sist û serê wî giran bû bû û ji ber dernediket. Nema destê xwe di paş kursiyê re davêt porê kevjalî. Tîreke sincirandî, weke şîşeke sor dilê wî dikewgirand û serma hewasê baskokirî ew hildihanî û dadihanî. Di ciyê xwe de merisî, serê xwe xiste bin baskê xwe û deng jê ne hat. «Ax, mêrd! Tu ne zilam î! Rebeno!... Te sar e!... Tu nema bi sîngên gewran şa dibî, belengazo, tu êdî pûç bûyî! Bayê sar bi te ketiye... Dewla te nema avê digire, kawiko!... Ez nexweş im, bi Xwedê ez nexweş im! Ax!... xweziya min bi nexweşiya Michel! Xwezî ez bi wê nexweşiyê biketama û tu carî jî rihet nebûyama! Tenê min ev pêkenîna bi mêraniya xwe nebihîsta û neketama vê rewşê!»

Brîcêt jî mest bû bû, lê ne ji hizirandina daxdana pozê Mircan. Çena li ser «hêlînên çûkan» mezin bû bû, şerm û fedî nas ne dikir. Wexta hatin li wî ciyê ku di hatinê de lê rawestiya bûn, vegeriya ser Mircan û gotê:

- Ez, te li vir daynim, yan te bibim cem hevala te ya biçûk? Tu fêrî wê bûyî?! Di nav kenekî qehpikî re çipîsk li bêvila daxdayî xist.

Mircan carekê tenê serê xwe weha ber bi wê rakir û dîsa vegerand bin baskê xwe. Ne dizanî bû bikene û ne jî bigirî.

Mircanê hewasbelqitî, bi tûk tifla pêkenînê; ji hemû pirti-

ka xwe rewisandî dimerisî û hêdî hêdî ji xeysiyetên xwe rût dibû... Weke tilûrê ku bêbask û bênikil bimîne. Tebayê bê lep û qîl... Lê jiyan! Ev şêrînbûna ku bi milyonan salan di hiş û dilan de meyaye, tilûrê bêgane jî hîn dike pirikandina ber mişkan û şêrê bê lep û qîl jî lîstika simbêlan... û însanê ku di jiyanê de bê çav be, bê ling û bê pê be, bê cî û war be, bê ehl û cîran be, bê heval û hogir be... ku bê sebr û hedan be jî, tenê giyanek di laş de bigere, tu carî destê wî ji jiyanê nabe.

Mircanê çerizî bi bizmarên nava xwe vegeriya gerzela parsûyên xwe û di nav koma mijûlên tûj weke agir de bê hedan arîya... «Cîran berî war, hespa kihêl berî siwar û mirad nabin bi xwestokên nîvçe û taromar.» Lê ne diwaser, ne war, ne xwestokên jiyanê... Rê û rêwanî ji wan re li ber çavên wî çênedibûn. Wext bi rewşa xwe ya seqemî geriya û di çavên Mircan de weke risasê giran û sar.

Brîcêtê her roj penaberek li trompêla xwe siwar dikir û bi wan re diçû ser «karê wan», yan jî li karê xwe digeriya. Pêşiyê yeko yeko bû, lê dûre li ser cotekî rawestiya... Wê, Wawîko û Xirpofskî bi hev re siwar dikir... Artîxil jî ji Parîsê vegeriya û bi hatina wî re «amblêmeke şoreşgerî» nû li ser deriyê wî xuya bû.

Piştî çendekî bi lêxistineke nezan, dengê tembûrê ji oda wan dihat, reyandina gurê Manco bi sitrana kurdî «Herine Pêş» dibû. Rewisandin bi quloçê bizina piyoş li dar bû. Marmaroka Fatîma ji Mircan madgiran bû. Roj bi roj zimanê penaberan bi fransî dirêj dibûn, lê dêmên wan diçilmisîn û ronahî di çavên wan de ne dima. Bêçaretî, biyanîtî, betalî û hejartiyê weke kulmeke qijnik girti bû ser çavên wan û mijank jî ji ber ne difilitîn. Hedana wan keti bû pelûleke herî mezin.

Foye bû bû weke garana tebayên har, kor û birîndar. Bi hevdu diketin, serê hev dişikandin. Yek nema ku şûna qîl û diranan di laşê wî de reş ne bû be, yan jî wî di yekî de gez ne kiri be. Di hemû pevçûn, gezkirin û serêşand de, reyandina gurê har bi ser ya giştan diket. Navê wî ji ser zimanan ne diket. Roja ku penaberan miaş digirtin (her deh rojan carê

300Fr) haritî, hovîtî û îraeş di derî û penceran re derdiket û digîşt erşan. Vexwarina ereqê, êvaran kîn di hişên tarî de disincirand û foye dibû agirê dojehê.

Mircan di gera xwe de serbest bû bû. Wî tevayiyê bajêr kolan bi kolan, kuçe bi kuçe tev dabû û her dever buhust bi buhust nas kiri bû. Û ji bo ku xwe ji ber çavên xelkê bajêr bide alî, ji xwe re ciyên cûrbecûr kifş kiri bû. Ciyên wî jî li gor teqs û hewê bûn. Ku dunya sayî ba, wî dida swe riya Troya ku di nava çiya, dehl û zinaran re diçû; ku baran, berf û şilî bûya ew diçû dêra Sant Verleta xirabeya ku li xewleyî bajêr bû. Dêr bi hewş bû. Dîwarê hewşê li hawirdorê gornên kevn digeriya. Bi carekê re şop bi ser ne diket. Riya herdu ciyan jî li rohilatê bajêr ji duryanekê diçûn. Dema ku mircan dida ser riya çiya û zinaran, dehl û daran, hertim li ser zinarekî bilind kateke dirêj radiwestiya, ba li bin baskên wî dixist û bi yadîgariya zaroktiya xwe difiriya. Wê çaxê jî hertim sitranek li ser zimanê wî bû. «Xwezî dîsa zar bûma!» Navê wî ciyî kiri bû «Ciyê ku lê dibine teyr û difirin.» Wê çaxa ku diçû dêrê û nava goristanê, pirî caran di qoziyeke şevreş de rûdinişt. Yan jî ku baran ne bi zirpîn bûya, dikete bin quba gorneke ku şiklê wê weke holikekê... ji her aliyî de vekirî bû. Lê çi di dêrê de, çi di binê quba gornê de, li vî ciyî her li ser jiyana xwe ya dahatû li Fransayê difikirî.

Sibehekê, gava ku bizina piyoş weke hercar bi derengî derbasî dersxanê bû, tev du kûçikên xwe, li gor xwiyê xwe bi lez got:

- Pirtûkên xwe bigirin.

Artîxil ji ciyê xwe çeng bû, li seeta xwe nerî û bi hêrs pirsî:

- Seet çend e, madam? Karê te di çendan de dest pê dike?

Madam wusa bû mîna ku tu şivekê li nava çavên wê bixînî. Di ciyê xwe de hişk, reş û şîn bû, te digot qey qolincan ew girt. Dûre jî heya ku jê hat, ji nişka ve destê xwe li masa pêşiya xwe xist:

- Tito! got û bi ser kûçikê xwe de rabû, kûçikê ku herdu pençên xwe dadihanîn ser masa pêşiya wê.

Lê Artîxil da ser pişta wê û bi serhişkî ji binê hedana xwe

ya hişk derxist û got:

- Ez bi te re dipeyivim, ne bi Tito re!

Ji derveyî xwiyê xwe î bi xwendekaran re bi nermî hatê:

- Misyo Artîxil! Ku tu ne razî yî, tu çima li vir mayî? Tu li vir çi dikî? Kê bi destê te girtiye? got û pir bi aramî xeber da. Wusa ku te ê bigota însaneke din e û ne Janêta hetikî ye. Wê çaxê hemû penaberan guhên xwe miç kirin. Mircan jî di dilê xwe de got: «Xwedê ji min re li hev anî. Ez ê niha dilê xwe li vê bêbavê rihat bikim û naxoşiya di navbera xwe û Artîxil de rakim. Ku ew sîxur be jî, kelemên wî ê ji pêşiya min kêm bibin, û ku bi rastî jî ehmeq û satore be, ew ê jê re bibe derseke hêja.»

Mircan devê xwe mişt kir ku bi piştgiriya Artîxil dakeve qadê, lê Artîxil xwe ne girt. Bi lojika xwe berê xwe da şirovekirinê:

- Na!... tu li ser pişta me miaşê xwe ji OFPRAyê distînî! Em dizanin!... lê çima pirtûkên hemû penaberan tuneye?

Bi vê şirovekirinê, te ê bigota mamosta ziman rengê ehmeqiya Artîxil ji zû de têgêhîşti bû. Wê yekser rişma Artîxil berda û ji şer daket gilî û gazinan:

- Na, mebesta min ew e ku hûn baştir hînî zimanê fransî bibin, got û mîna ku tew tiştek ne bû be, bi xweşî ji qadê derket.

Penaberên guhmiç man heyirî, ne tiştek ji gurbûnê û ne jî ji vemirînê fêm kirin. Yên ku weke Mircan keysa xwe li peyvê xweş kiri bûn, nola ku tu aveke sar di ser wan de bikî. Ne kesek gêhîşt agir dade û ne jî serê problemên xwe li ser bikizirîne. Ev hevperikîna wan weke tava baraneke havînê bi zirpîn dest pê kir û bi lez şopa xwe li erdê wenda kir.

Tavên havînê bi dû hevdu de hatin. Lê nema tu heyr bi yekî re çêkirin. Tevayiyê penaberan mîna ku deng û bahsên av û hewayê ji radiyo û televiziyonê bihîsti bin, bizani bin ew ê tava havînê çawa dest pê bike û şopa wê ê çawa hilê!

Necidîbûna Artîxil, hêrsên wî yên vala ji hemûyan ve xuya bû. Hemûyan jî kefa pûç ya pêlên deryayê dîtin û çavên wan danegirt. Giştan jî fêm kirin piştî ku ji Parîsê vegeriyaye ev

zirzîtiya wî ya bi mamoste re xurt bûye. Lê hemû kesan fêm ne dikir bê çima bizina piyoş newq jê vala dikir.

Piştî tava havînê, carina dengê Artîxil bi tirkî dihat, ji Emîn re ûştên şerê xwe tefsîr dikir: «Devrimcî... Turkiye... Fransa... ayni, emperyalizm mucadele dewrimci ayni!»

Rojekê piştî tava sivik ya havînê, di dersxanê de êdî serê Mircan gêj, sincirî û çelqiya bû. Di wê rojê de jî nameyek ji hevala xwe ya Lûsayê girti bû. Hevala wî tê de lome dikir û digot: «Ji dema ku tu ji vir çûyî, ji bilî nameyeke xwe te ji min re ne şandiye. Ev bû nama min ya pêncan ku ez ji te re dişînim. Lê ez dizanim ku ev nama min jî wê bê bersiv bimîne! Wê rojê li derve bayekî sar û xurt, weke bayê xezebê dihat.

Ev cara pêşîn bû Mircan bawer dikir ku bi rastî jî dirûvê Sibîryayê bi serma Babilonê dikeve. Ba, gulolîkên berfa weke lep, li hev dizîzikand. Merivan nikari bû ji ber çavên xwe vekira û ber xwe bidîta.

Gava ku Mircan wê rojê weke hercar derket gera xwe, bîsteke dirêj li ber derî rawestiya. Vizeviza bayî ji hundir de derî li ber dihejand. Berf li derve li ber bayî radi bû, dibû weke pêlên deryayeke çelqyayî, erd û ezman ji ber kifş ne dibû.

Bêyî ku Mircan li dora xwe binere, berstuka sakoyê xwe ber bi jor bilind kir, bi heymen lê bi heybet û bi herdu destan çengalê derî vekir. Lê ba ew zîzikand. Bi dengekî bihîstî xwe bi xwe: «Wexta gerê ye!» got û serê xwe î sincirandî derxiste derve. Berstuka wî xweber qulipî û weke yekî ku ruh pê ne şêrîn be û xwe bavêje nava şer, berê sînga xwe vekir û bi hêrs gavên xwe avêtin. Di ber xwe de: «Wext, wexta xezeba baranê ye, katê xwekuştinê ye!» got û da nav berfê.

Mircan bû bû wek yekî ku bi cinikan bikeve û serê xwe li dîwaran bixîne, hemû hêza giyanê wî leqiya bû û hişê wî taromaro bû bû. Di foyê de bayê kîna çavsoriyê rabû bû û serê wî disincirand. Li derve bayê reş, xezeb û koranî bi hev re dixiste çavan.

Şepalên baranê, ba û berfê der û hundir li binê guhên hev dixistin. Mircan çiqas dixwest ku çavên xwe têxe pêlên xezebê, lê bê fêde bû. Weke birîna devê şûr di serê wî de vedibû,

di nav por re xeteke zirav dihate kişandin û di serê wî de perçe perçe dibû. Ew li vî alî û wî aliyê kolanê dipirpitî, diket û bi dîwaran ve radibû. Lê wî rêya xwe ji ber kiri bû û bê serî ber bi duriyana xwe ve çû.

Gava ku ji bajêr xewle bû, bahozê ew hildihanî, dadihanî û dizîzikand. Geh xwe qilûz dikir û geh bi çarpiyan diçû. Lê ji ser pişta bahozê venekişiya. «Hey erdê bêgane, jiyana bênamûs! Çavan li xwe veke, lok li ser pişta te ye, lok! Lokê ku ji bayê çavsoriyê hêcbûyî, lok!...»

Çavên xwe vekir û nas kir ku li duryanê ye. Lê dawiya herdu rêyan jî jê ve ne xuya bû. «Hey bahoza çavsor û serhişk, te duriyana min jî ji dest min girt. Ez ê îcar bi kuderê de herim?!» Û mîna ku bixwaze hinekî hilma xwe bîne ber xwe û rewrewka ber çavên xwe kifş bike. Lê bahozê rê ne dayê, ew hejand, zîzikand, hejand, zîzikand... Bi kotekî bîsteke kurt herdu lingên xwe yên weke darên pûç di berfê de çikand û serê xwe carekê tenê li ber bahozê bilind kir. Lê vê carê dev lê ne digeriya ku ji xwe bipirse: «Ez herim ciyê teyrê xwe, yan ez herim û têkevim binê quba gorna xwe!» Bahoz li bendî bersiva pirsa bêdeng ne ma, darê bêqurm di erdê bêgane de li ber xwe bir. Hejiya, hejiya û bi ser dev ket. Û mîna ku tu kêrê bidî ser hustuyê wî, carekê tenê orîneke bêhnfetiskî û lerziyayî tal û dirêj jê çû: «Yaaddêêêê!»

Orîna lokê hêc li erd û eziman belav bû û li hawirdorî rewrewka sipî, ya asoyê nêzîk, zûrîniya dengê gur û kûçikan, maremara bizin û mîyan li hawakî di guh de arîyan. Tariyê xwe bera erdê dida, çend qijalek ji ser darekê firiyan, kirine qîjeqîj û bi bayî re çûn û vizîna bayî berdewam kir.

Bi qasî çarîkekê deng jê biliya. Dawiya sakoyê wî ji paş ve li ber bayî diçû, geh diqulipî geh bi ser de dihat û weke baskê teyrekî mirî li ba dibû. Berfê digirt ser laşê wî. Serê wî di nav gola xwîna wî ya sor de giran û bêlebat ma bû.

Mircan çavên xwe di nav xwînê de vekir û dengê diya dilovan di guhê wî de çingiya: «Teyrikê min!... Bila hişê te li serê te be, lawo!... Teyr bi baskê xwe, teba bi qîl û diranê xwe, û însan bi hiş û aqilê xwe digêhin ya xwe! Rêya xwe nas bike!...

cîran beriya war, hespa kehêl berî siwar, û mirad nabe bi xwestokên nîvçe û taromar!...»

Serê xwe yê giran bi derbên şûr hêdîka li ber vizîna bayî rakir, dest û lingên xwe piçekî anîn ber xwe, bi hemd şilbûna dêmê xwe peland û hanî ber çavên xwe. Hêsir, xwîn, xwîdan û berf tevlihevî bû bû... Lêvên wî ricifîn û kela girî ew hilanî... «Dayê... dayê ma ez ê bi kuderê de herim! Dayê ma ez ê çawa xwe ji nû ve bigêhînim hemêza te... Yadê, ma çi bi serê me hat!?» Weke ku encamê hemû derdên xwe di dogeşekê de gewde bike, rawestiya. «Ma ez gazinan ji kê dikim? Ax serokên kurdan!... Xwedê ji we hemûyan re nehêle! We hêviya min qurmiçand! We ne hişt ez bi miradê xwe şa bibim û ne jî hêviya xwe bibînim. We xewnên min jî li min herimandin... heta kengî hûn ê weke qertelan li ser beratê me hevdu bicircirînin?!...»

Hêstiriya cinikan, girî, hêcbûna gêjbûnê, ba û bahozê... ew taromaro kiri bû. Hêdî hêdî geh bi çarpiya meşiya, geh rabû xwe li ber bahozê qilûz kir, weke ku hat wusa jî bi şûn de vegeriya.

Gava ku di ser tilmikê re bihurî, bê hemdê xwe li hêla deriyê kesk û mezin nerî, tiştek jê ne xuya bû. Di wê gavê de Mircan di dilê xwe de got: «Çû, çû... nema ez bi awayê berê didim ser wan rêyan!» Tiştê ku dilê min bixwaze, ez ê yekser bikim, rêya şeref û serfîraziyê yek e. Û dûre jî ew gotinên Danton, ku di pirtûka hînkirina ziman de pê re derbas bû bûn, hanî bîra xwe: «Mêranî, dîsa mîranî û tenê bi mêranî meriv bi ser dikeve!» Ev gotinên ha, du sê caran bi deng li xwe vedigerand û hişk gavên xwe davêt. Mîna ku bi serketinekê şa bibe û rêyeke nû li ber duriyana jiyana wî vebibe.

Tebayê çarqat di nav berfê de ma bû û bi zelûlî şewq ji pencerên çavên wî diçû. Gava Mircan bi derencê ve hildikişiya, dengê tembûreke bi lêxistineke nezanî sitrana «Herine Pêş!» bihîst û weke vingevinga mêşê li ber guhê wî ket. «Ev sîxur lawê sîxuran bi tembûra kurdî distirê!... » Weke ku tiştekî di nava wî de biqetete, bi dengekî nizm xwe bi xwe got: «Ax... tembûra min... canê min di nava lepên vî gurî de ye!»

Lez bi lez berê xwe da serşoka qat. Xwîna bêvila xwe, qeşmûşkên serçavê xwe şûşt. Ji bilî şeqitandina eniyê, tu nîşanê ketina wî ne xuya bû. Ew jî bi hemd porê xwe bi ser de hanî û berê xwe da oda xwe.

Gava mifta xwe di derî de gerand, dengê intînekê di nav dengê musîka Wawîko re kete guhê wî, xwe bi xwe: «Ez îro berî wexta xwe hatime!?...» got û derî dafand. Bi vekirina derî re hilmeke giran mîna ku hilma pîsî, araq, giya û cixaran tevlihev bû be, girte serçavê wî. Şewqa lampa ser masê jî, pêşgîr pê de kiri bû, şewqa wê bi zor hundir rohnî dikir. Ji nişkê ve di qorziya hundir de çavên wî li komek goştê reş î biriqandî ket. Mircan heta demeke dirêj jî behitî ma û laşê wî bû weke hêlkanê, te ê bigota erd di bin de dilerize, çavên wî beloq û bêhiş vekirî man. Her ku ber bi komê dihat, wêneyê goştê reş li ber çavên wî bêtir zelal bû. Mîna ku di xewnekê de be, bêhiş ji xwe re got: «Wey lê, ev sisê ne, lawo!» Çavên wî didît lê hişê wî ne pê re bû: (Xirpovskî li erdê ramedandî bû, balgeh û betaniyên ku di bin hêta wî ya sitûr de, ew kiri bû weke tîpa «L» bi bermeqlûbî, zik û berzika wî ji erdê bilind kiri bûn. Brîcêt li ser «zilamê» wî rûnişti bû, xwe dabû ser kabokên xwe, bi tîpa «L» ya bermeqlûbî re dirêj bû bû û paşiya wê belbelotanî bû bû. Wawîko jî, ji paş ve ew hemêz kiri bû.

Sê seriyên bêruh ji nav goştê ku ji şehwetê heliyayî bi aliyê wi de zivirîn, awirên mirî bê mane û matmayî tê dan. Weke ku tu heft xenceran li ser hev lêxî, xwîn di laşê wî de heta demeke dirêj rawestiya! Hêdî hêdî bi lingê xwe yên rehelî paşûpê vekişiya û derî li dû xwe girt. Lê beriya ku derkeve dîsa xwe li ber derî kevjalî kir, zîrqîniya deriyê diwaserên wan hat û pêla hilma meyxweşiyê ji deriyê wan jî fûriya. Mircan serê xwe ranekir, lê reşikê di derî de ji sola wî nas kir, gava gotinên bulgarî: «Şto takoye silova rêka po tûrêtskî?» bihîst, serê xwe rakir ku xwediyê gotinan, Artîxil bi xwe ye. Veciniqî û dengekî rehelî dengekî bêmane jê derçû: «Hahooo!...» Piştî bîstekê bi nerîneke şêt li Artîxil nerî, weke ker û lalan serê xwe je re hejand û bêyî ku bizani be bi kuderê de here, der-

ket. Instinkta wî xweber ew kişand gera ku ew hînî wê bû bû.

Li derve ba hinekî şikesti bû. Berfeke hûr û nerm tenê li ber şewqa lampên kolanê dadihat. Ji bilî serma û seqemê, hewasê Mircan bi tiştekî din mijûl ne dibû. Gera xwe bir serî, heta ku weke her roj dema razana tebayê mezin hat, serê wî di ber de xwe gîyand ciyê xwe û di hundirê xwe de hat cûtin.

## - VI -

Jiyan, ev gotina ku bi mîlyonan sal di dil û hişê însan de meyaye û tu kesî; ne pêxemperan, ne jî feylesofan û zanan... hemû reweştên wê bi nav ne kirine. Sînorê xwe yê hişk di nav hebûn û tunebûnê, sax û miriyan, beden û giyan re dikişîne, guman û baweriyên rengoreng jî bi xwe re dibe û tîne... Lê merivên ku jîndar bin û xêza sînorê mirin û mayînê di hişê wan de weke rewrewkê be, navên rengoreng têne serê wan; ji wan kesan re, yên ku di jiyanê de kes wan fêm nakin, dibêjin: «Sewsî» yan jî «Şêt û dîn» û ji hinekan re jî; ji wan yên ku «dimrin û radibin» re dibêjin: «Filankeso du dunya dîtiye!» yan jî weke yekî ku ji nav gornê rabû be û jiyan pê tal bû be.

Rewşa şêtbûn û sewsîbûna Mircan, rewiştên van cenaban giştikan di xwe de gewde dikir û ji hemûyan jî kifş û cuda bû. Ev ne şêtekî di nav baqilan de bû... Lê çelqiyayekî sewsî bû ku gav û seet bi dev û diranên tebayekî mezin dihate cûtin.

Serê wî hertim xilyayî û di ber de, te ê bigota qirika wî bê hestî, reh û gavên wî yek dijiyanê de û yek di bîreke tarî û şevreşê de ye. Sewsîbûna Mircan wêneyekî xerîb dihanî bîra wî. Wî hertim xwe mîna tilûrekî bêgane didît, bi dêmê însanekî ku ji ber bahozê bireve, bê serî di bîreke xirabe de werbûbe, serê wî gêhişti be binê bîrê û li dîwarên wê keti be. Lê nîvruhî, eciqî, pelixî, hestîşikestî, di binê bîrê de ber xwe dibîne û dora xwe nas dike. Xewra binê bîrê bê hawe fireh bû û ava wê nizm bû. Li dora xwe, hestiyên dewaran, beratên pisik, bizin û kûçikan dibîne. Lê ew ji tiştekî dora xwe jî nerihet nabe, ne ji bêhna beratan, ne ji gemar û pîsiya ku ji wan diherike, ne ji kêzik û gêrikên ku derin û tên, ne ji kurmê ku li ser

ser, çav û guhên beratan diçin û tên... Tirsa wî tenê ji mar û dûpişkên ku bê hawe mezin bû bûn, hebû. Gava çav li wan diket, mûyên laşê wî radibûn, vediciniqî, dilerizî û çavên wî beloqî dibûn. Û di jiyanê de heta ku şiyar nebûya, xwe neda hev û sê çar caran destê xwe li eniya xwe nexista û negota: «Berde, berde!... wa ye gur, pisik û bizin, herine wan!» wêne ji serê wî dernediket û bi xwe şiyar ne dibû. Carina ji dêvla van gotinan ban dikir û dikire qîreqîr: «Yadêêê!» û li ser dengê xwe wê çaxê şiyar dibû.

Gava Mircan diket kûraniya mijûlên bîra şevreş, weke ku xilmaş dibû, deng dibihîstin û carina otomatîkî li wan vedigerand. Lê dengê wî li alîkî bû, nerîna wî li alîkî û peyvên wî jî bi awakî din. Mana wî jî di bîrê de dirêj dikir, yan kin dibû, li gor ciyê rûniştî û kesên li dora wî. Hertim jî piştî berdana dûpişk û maran, bi kulmên ku li serê xwe dixist, yan bi qêrîna «Yadê!» dêmê wî vedibû, dihat guhertin, mîna ku tu çarşefekê ji ser bidî alî. Nerîn û peyvên wî jî wê çaxê hevdu digirtin.

Gava ku Mircan du sê caran di dersxanê de, di bîrê werdibû û piştî kulman bi ser xwe ve dihat, wê çaxê ken û qerfên mamosta ziman û penaberan bi xwe dibihîst. Bi xwe re dikete gumanê ku ew ê xwe wenda bike; tu tama dersê di bin zimanê wî de ne ma. Xemsar jî ket ku ev wendabûna wî ê jê re bibe sedem ku foyê berde.

Di wê demê de kaxezên wî yên penaberiyê bi bersiveke pozîtiv hatin û rûniştina xwe ya deh salan li Fransayê sitend. Mircan wê çaxê ji xwe re got: «Ji vê munasebetê çêtir tuneye. Ez qevdek gul bikirim, ji midûra xwe ya horî re diyarî bikim û jê bixwazim ku bila ew min ji dersê miaf bike!» û wilo jî kir.

Gava Mircan tev gulan derbasî oda midûrê bû, dît ku Brîcêt jî li wir e. Silava xwe kir û destê xwe da midûrê tenê.

- Ev gulên ha ji we re ne, bi munasebeta hatina kaxezên min.

Madam Laplas ji ber rabû, gul ji dest girt û bibişirîn gotê:

- Gelek sipas, misyo Mircan! Ez pir şa bûm ku kaxezên we hatine. Lê ev gul ne hewce bûn. Te çima xwe nerihet kir?

Mircan ne wêrî bû ku li ber Brîcêtê problema xwe ya xewê

ji ji midûrê re bi lêv bikira. Lê Brîcêt bi xwe ji wê derê şemitî û derket. Madam Laplasê pirsî:

- Misyo Mircan, mirûsê te gelekî hatiye guhertin. Ma problemên te hene? Bi rastî... got û bi ken berdewam kir: Bi rastî jî min ji Janêtê bihîst ku tu carina di dersxanê de radizî û xewnan jî dibînî. Ev rast e?! Ma di odê de hinek te nerihet dikin? Na xwe tu baş ranakevî?

Mircan nerihet bû ku Brîcêtê li ser zimanê wî vir û derew li hev hanî be, yan jî xwesti be ya xwe bi Mircan bike, wek ku ereb dibêjin: «Li min xist, girîya û berî min çû giliya.» Lê mîna li ramanên xwe ne ewle û ji xwe ne bawer be ku bikari be dûrûdirêj bipeyive, kin birî û got:

- Na, tu problemên min tunene! Di xwendina ziman de ez gelekî diwestim. Ez bi tena serê xwe li ser pirtûk û kasetên hînkirina ziman dixebitim û hertim dereng radizêm. Loma ez carina di dersxanê de xilmaş dibim. Ku te îmkan hebe, ez dixwazim ku tu min ji dersê miaf bikî. Ji bo axaftin û zû hînbûna zimanê fransî, ku cî hebe ez dixwazim di odekê de bi yekî fransî re bijîm.

Piştî hefteyekî Mircan ji xwe re digot: «Duayên rebana diya min qebûl bûne û Xwedê li min hat rihmê!» Ew ji dersê miaf bû, Brîcêtê jîji ber «danûstandina zêde» ji karê wê dûrxistin. Michel jî ji nexweşxanê reviya, hat foyê û dilê Mircan xweş dibû: «Ez ê bi Michel re bijîm, di vê foyê de ji wî çêtir kes tuneye!»

Gava Mircan cara duduyan çû ba madam Laplasê ji bo jê bixwaze ku tev Michel di odeyekê de bijî, ji mirêsê wî û rewşa wî ya psikolojîk û xwestokên wî, madam Laplasê yekser fam kir ku ew xwe ji ber bizina xweha wê, tebayên har û hiştarî dide alî. Michelê dîn jî pê ve bû bû dirdirik û bi kuderê de biçûya digot: «Ez qebûl nakim ku kes bête oda min ji bilî ew yê ha!» (Destê xwe dida porê xwe!) Heger hinekan bi qerfî jê re bigota: «Hemû serreş in, kîjan ji wan?» Michel digot: «Xwediyê sêvan, oh yes!.. yes!»

Piştî çend rojan Mircan û Michel ketin odeyekê. Oda wan li ser qata duduyan bû. Hîrehîr û qîreqîra qatê yekem ji guhê

Mircan dûrket. Êdî nema bi ro di bîrê werdibû. Lê diwaserên wî yên nû, kesên ku bi deh û bîst salan di nav diranên tebayên mezin de hati bûn cûtin: Karkerên Maxreb, Cezayîr û Tûnisê bûn. Hinek ji wan di tewla xwe de gêj û hinek şemûs bû bûn, lê ji bilî zîtikên li hewa tîştekî din nema ji wan dihat. Gezkirina pidûyên bê diran bû. Êvara pêşîn tûnisîyekî çavşaş, emrê wî li dora 50-52 salî, dêmê wî weke hinareke pelixî, pentelon kesk, îşlig sor û çakêt jî hêşînê vekirî, bêyî ku li derî bixe û silavê bike, bi ent û pêt derî vekir û xwe rakişand Michel:

- Gû lawê gû! Ez dizanim bê tu çima hatiye ser qata min... Tu hatiye ku hevala min ji min bîstînî! got û weke bablîsokê li hundir çû û hat.

Tiştên ku Mircan li ber çavên xwe dît, mîna ku li dunyayeke din sarî kete nav wan, ew ji hev qetand, lê rê li ber ew î tûnisî ne dibû; ne erebî dizanî bû û ne jî fransiya wî fransiyeke baş bû. Bi zimanê xwe î taybetî têra xwe zirt û sixêf kir: «Tu mêrê çê bî, tu ê pê re bipeyivî!» Bi vê gotina xwe ya dawîn re şîrqînî ji derî hanî û derket.

Yekî din jî emrê wî li dora çelsalî, ew jî çer ku ji kar dihat, xwe ji ber neynika serşokê ne dida alî û her bi dengekî bilind distira: «Eyeretnî bî-seîbî we hewe wîqaro.»(*)

Yekî din jî cezayîrî bû, jê re digotin «Jina hefsa», heger li ber wî behsa çi bihata kirin: Dizî, peran, bazirganî, pîrekan... Wî hertim wusa dest bi axaftina xwe dikir: «Jina min weha digot, jina min weha dikir!...» û bi dengekî bilind digot: «Hemû jî ji min ne rihet in, ji ber ku jin û zarokên min li welêt hene!» Hemû jî di oda xwe de, yan jî li xwarinxana qatê xwe bi dengekî bilind limêj dikirin û her yekî ji xwe re azan dida. Giştikan jî, li ser çi bi hev re bipeyiviyana, gotina wan ya pêşîn «Ya zubî»(**) bû... Roj tune bû ku şer û sixêf bi hev re nekirana. Bi kurtî: her yek ji wan bi derdekî bû, her yek bi awakî dîn û şêt bû bû...

---

*(*) Bi erebî ye. Bi mana "Porê sipî ji min re kire eyb" e.*

*(**) Bi erebî ye. Gotineke argo û bi mana "ewkê min" e.*

Ji hemûyan dilê Mircan bi yekî ji wan dişewitî: Emrê wî li dor 45 salî bû, jê re digotin Seydî. Belengazo betal ma bû, miaşê betaliyê distend. Jina wî tev çar zorokan bi dû yekî keti bû. Ew jî ji sibê heta êvarê di xwarinxana qatê xwe de rûdinişt, destê wî li ber ruyê wî û her diponijî. Her serê kêliyekî digot: «Istaxfîrullah, la-îlahe-îlellah!... Xwedêyo tu jê re nehêlî!» Karê wî her limêj, nifir, duakirin bû.

Gava ku Mircan çav li wî diket, ji alîkî ve dilê wî pê dişewitî û ji alîkî ve jî dilê wî bi jiayana wî xweş dibû. «Qet nebe ez rojê carekê duduyan xwe wenda dikim, lê ev belengazê ha ji sibê heta êvarê kurm di çav, ser û guhên wî de diçêrin.»

Ji bilî van serpêhatiyan û «têwerbûna» bîrê ku pirî caran bû bû bi şevê, jiyana Mircan bi Michel re roj bi roj xweştir dibû. Ew û Michel diketin ser xeysetên hev, ji hev fam dikirin û rewşa wan weke hev dibû.

Michel xwedî televizîyon û teypeke mezin bû. Miaşê wî li dor çar hezar frankî bû. Sibehan dema ku radibû, xwe derman dikir, hembra û bodra di xwe dida û dadiket bajêr. Kolan bi kolan, kuçe bi kuçe digeriya û li ber her deriyekî ku limek li ber hebûya, radiwestiya, ji wan re qala dermanê xwe dikir, yan jî li gor xwestina wan li ser lingekî direqisî. Xelkê bajêr, piçûk û mezinan ew nas dikirin, jê hez dikirin û lê dihatin rehmê. Êvaran jî wî televizîyon û teypa xwe bi hev re vedikir, kovara seksê dadihanî ser sînga xwe û xwe radimedand. Lê wî li hemûyî jî ne dinerî û guhdarî jî ne dikir. Yekser di xew ve diçû.

Piştî çend rojên jiyana xwe ya bi hev re, ew î tûnisî çû ku îcaza xwe li welatê xwe biqedîne. Bi çûyîna wî re keçeke fransî weke birmîlekê, diranfirk, fahş û porê wê di nav çavên wê de, bêyî ku li derî bixîne hêdîka kete hundir, tiliya xwe danî ser devê xwe û li Mircan nerî: «Huşşş!» got û li ser pêçiyan, weke ku here diziyê derbas bû û li kêleka textê Michel rûnişt. Hêdîka bi hemd li doxîna wî xebitî.

Mircan, pêşiyê geh di bin çavan re lê dinerî û geh pişta xwe pê de dikir. Lê mîna berxeke ku bi guhanê beratekê bimije, keçikê jî bi xafiltî «zilamê» Michel dimêt. Piştî demeke

kin, wusa jî bê deng û hêdî ji hundir derket. Beriya ku derî li pey xwe bigire, li Mircan nerî, bi gotina «merci» devê xwe bêdeng bir û anî, pê re bişirî.

Ev wêne sê çar caran dihat dubarekirin. Carina Michel dikete rewşeke wusa, mîna ku li ber xwe dikeve û fedî dike. Di demên weha de, çavgirtî balgeha xwe davêt ser Mircan: «Serê xwe têxe binî!» digot, lê dîsa bi mirîtî di nav lepên keçikê de dihat mêtin. Ev hemî tiştên ha nema êdî Mircan matmayî dikir. Tenê di dema pêşîn de tiştekî mûyê wî çîp kirin. Êvarekê reşê Brîcêtê li foyê dît!? Pêşiyê ji xwe bawer ne kir ku ew wêne rast be. Wusa guman kir ku dîsa di «wendabûna» xwe de dîti be. Lê êvarekê gumanên wî têkçûn û şûna wan baweriyeke zelal danî: Li dor seet nehê êvarê Artîxil û Brîcêt bi hev re li deriyê wî xistin û derbasî hundir bûn.

Gava ku Mircan çav li wan ket, ji nişka ve veciniqî û ricifî mîna ku nava wî hemû ji ciyê xwe derkeve û dilê wî ji qefesa sînga wî li pêşiya wî li erdê bikeve...

- Behitî nemîne, em hatine ku dilê te xweş bikin! -çena rovî û çevên tîtikî li kêleka gur bişirîn- Me nameyeke direj li ser rewşa jiyana penaberan û pêwendiyên wan û îdarê nivisandiye. Me hemû nijadperestî û hovîtiya Janetê şirove kiriye û kêsbaziya xwenga wê ya «mulayîm» daye xuyakirin. Divê hemû penaber îmzên xwe bavêjin ser ku em wê ji OFPRA û serokwezîr re bişînin.

Gava ku Brîcêt dipeyivî, gurê Manco çav li Mircan dizewûrand. Mircan berê hêdî hêdî xweziya xwe dadiqurtand û di pey re jî hêrs dibû. Pişti ku Brîcêtê peyva xwe xelas kir, bîsteke direj rawestiya, çavekî xwe bi ser yê din de bir û ji nişka ve birûsk ji ber çavên wî çûn. Mîna gurmîna ku ji tava ewrê reş û giran bê, ji nava wî bi orînî gotinek derket: Derkevin, derkevin!... Derkevin, derkevin... derkev!...

Bi dengê Mircan re derî û pencere hejiyan. Çavên Brîcêt û Artîxil bel man, weke çavên du mişkên zelûl ku serê wan bi hev re têkeve xefikeke hesinî. Artîxil xweş fam kir ku di vî hundirî de deng bi ser dengê Mircan nakeve. Bi destê Brîcêtê girt, paşûpê bûn û bêdeng derketin.

Bi derketina wan re bîstik bi bîstîk, seet bi seet û roj bi roj navê Mircan û rewşa jiyana wî di devê rûniştvanên foyê de weke benîştê daran pûç dibû. Gotin bi du rengan dihatin gotin. Mircan jî bi riya karkerên ser qata xwe re dibihîst: Hinekan li ser wî digotin: «Ew şêtekî beradayî ye.» û delîlên wan jî jiyana wî ya ku bi Michelê dîn re bû. Û hinekan: «Ew ne dîrokzan e... Ew sîxurê madam Laplasê ye.» û delîlê wan jî ew gulên ku wî diyariyê wê kiri bûn, bû. Di qatê de hemû penaberan dixwestin ji ber bazdin. Mircan jî bîstik bi bîstik, seet bi seet û roj bi roj bi bihîstina van gotinan hêc dibû û «wendabûna» wî kêm dibû. Lê êdî ne li foyê û ne li bajêr çavên wî li reşikên Artîxil û Brîcêtê diket.

Hewa roj bi roj xweş dibû û meşa li ser lingan pê xweştir dibû. Mircan nema diçû gera xwe ya nixumandî. Duriyana ku diçû; çiya, dêr û mezel ji bîra kir. Hemû gengaziyên jiyana xwe dixist şêweyê şêtan. Gera wî jî pirî caran bi Michel re û li sûka bajêr bû. Rewşa wî jî bi vî awayî li ber çavên xelkên bajêr kifş dibû û dihat naskirinê. Jê re digotin: « Dînê bêgane, hevalê Michel!» Artîxil û Brîcêt jî piştî van gotinan, nema bêhna wan li bajêr dihat; ew nependî bû bûn. Xelkê digot: «Brîcêtê, Xirpofskî li kêleka xwe siwar kir, çûn û nema vegeriyan!» Û li ser Artîxil digotin: «Geh bi dizî tê foyê, geh li mala karkerekî tirk, li xewleyî bajêr radizê.»

Carekê di nava bajêr de Mircan û Artîxil rûberû rastî hev hatin. Mircan hêdî hêdî xwe jê xafil dikir û ber bi wî dihat. Ne dixwest riya xwe ji ser wî bide alî. Lê Artîxil serê xwe xiste ber xwe, çivek da xwe û bi rehwanî meşiya.

Mircan da dû û bi kurdî dengê xwe xweş kir.

- Artîxil! Ez tiştekî bi te nakim, dixwazim bi te re bipeyivim.

Artîxil êvarekê tenê li dû xwe nerî û mîna kûçikê ku hestî di qirikê de bimîne, bi awakî bêhnfetisî kuxuya û di ber re jî bi frensî got:

- Ez weke te ne dîn im!

Mircan çivê wî lê rast kir û li ber deriyê foyê ew girt. Lê Artîxil mîna mişkê ku ji nav pençên teyr bişemite, bi melomi-

larî û dijwarî xwe gêhand derencê. Lokê hêc li pêşiya wî xist. Gava ku ji jor de lê nerî, Artîxil rawestiya, herdu destê xwe danî ser serê xwe û çavên xwe girtin. Weke ku Mircan xwe ji ser xaniyekî de bavêje xwarê, herdu lingên wî bi çerpîn li gerzela sînga Artîxil ketin û orînî bi Artîxil ket. Herdu bi hev re ketin xwarê. Lokê hêc di ser de bû. Ew da ber tep û pêhnan: «Sîxur lawê sîxuran, tu ê îro ji ber min bi kuderê de herî?» Cara dawîn bi qevdeke porê wî girt, bi qasî bihustekê ji erdê bilind kir û heta ku jê hat ew li erdê, li derencê xist. Laşê Artîxil bê lebat li erdê dirêj bû. Mircan bi qasekî xwe bi xwe fikirî: «Gelo ew ê dîsa rabe, yan bi carekê de mir?» Lê encam çi bûya jî, êdî jê re ne girîng bû. Di ser xwe re nerî, dît ku rûniştvanên foyê yeko yeko serê xwe di ser derabên kêleka derencê re dirêj kirine û li wan dinerin. Kesî ne diwêrî bû xwe nêzîkî «dînê beradayî» bikira. Dema Mircan bi şêweyê şêtbûnê bi derencê ve hilkişiya, hemûyan xwe ji ber dan alî.

Piştî vê bûyerê, Mircan êdî ne bi «cinikan» diket, ne jî di «bîrê» werdibû. Lê qet ne dihat bîra wî jî ku bikari be ji nû ve xwe vegerîne Mircanê berê.

## - VII -

Li bajarê Babilonê bi du sê celeban nav pê keti bû. Hinekan jê re digotin: «Dînê porreş», hinekan: «Dînê hevalê Michel.» hinekan jî digotin «Dînê bêgane.» Lê şêtbûn û dînbûna Mircan bi reng û rewşeke taybetî bû. Ew meriveki çelqyayî û wendayî bû. Di civakê de bi tena xwe bû, tev xelkê bû û nependî bû... tilûrekî ku ji refê xwe ma bû û saxekî bêgîyan bû. Loma jî hemû navên ku dihatin ser wî, xwe li rewşa wî dixwarin. Şêwe û awayê jiyana wî ya buhurî di civaka nû de jê re dibû mestere, ne ji kirinên wî re û ne jî ji gotinên wî re. Ew bû bû weke melevanekî westiyayî li pêşiya deryayeke nenas ku ji pêlên wê yên şepal û dijwar çavên wî nebire. Wî xwe li qelsiyê danî bû. Ne li gor hişê xwe, ne li gor hezkirina dilê xwe, ne jî li gor bîranînên jiyana xwe ya serfiraz û zaroktî gavên xwe davêt. Xwe li pêşiya keftelefta jiyanê qulûz dikir, we-

ke xiltekî kor di erdê ber kendalekî avmiçiq de, bi zexelî şûna xwe çêkir. Bayê jiyana serfîraz nema li bêvila wî dixist. Berxwedana tamaran sist bû, serê xwe bi arzû û bê arzû li ber jiyanê nizm kir û daxist. Jiyanê ew li gor zagonên «şêtbûnê» hemêz kir, hêdî hêdî ew ji per û baskên wî kir, ji mejî û zanebûnê, ji şêrînî û bedewiya kirinên serfîraziyê dûrxist. Tenê carina hişê wî dihate serê wî û bi xwe mijûl dibû. Wan çaxan jî ji xwe dipirsî û davêt aqilê xwe yê çelqyayî: «Sewiya xwendina ku min kiriye, dîplomên ku min sitendin, serokê vî bajarî bi xwe jî ne gêhiştiyê!» Lê pêre pêre jî bi tirs û poşmanî li xwe vedigerand: «Ez ji şerê berxwedana jiyanê derketime, êdî mafê min tuneye ku ez xwe derxînim hemberî ciwamêrên qada şer!» Herweha pişta xwe bi daxwaz û îrada xwe dida kendalê miçiqiyê ku bi xwe hilbijarti bû.

Gumanên ku carina pê re peyda dibûn, bi carekê re ew bêhiş dikir. Geh ji xwe bawer dikir, geh ne dikir. Gumanên bi hişekî şiyar roj bi roj di jiyana wî de kêm dibûn. Weke peqên ku bi ser avê dikevin û çawa peyda dibin, weha jî zû wenda dibin, ew jî wusa bû. Ne dixwest bi «aqil» bijî, herweha jî dixwest ku hinek rişmekê têxin hustuyê wî ku bi dû xwe de bikişînin. Bi vî awayî carina ji xwe dipirsî: «Xwezî pasporteke kûçikan» li vî welatî bidana min! Ma kûçikên wan tev ne bi pasport in? Wî êdî tamajiyanê seh ne dikir, lê qehremaniya giyanî jî têr ne dikir ku bi xwe xwe bikuje.

Hogirtiya wî ya bi Michel re, di sewiya wendabûna wî de, çareyeke xweristî bû. Pelûlika dawîn bû ku pê ve hildikişiya sewiya jiyanê û raserî hilovka xelkên wê yên «durust» dibû. Gava çend caran bi Michel re li ber deriyê dikan û malan digeriya û xelkê ji Michel dixwstin ku ew awayê dîk û hespan bike, wê çaxê Mircan bi çend gavan xwe vedikişand, ji dûr ve li «spektakila» hevalê xwe temaşe dikir; piştî demekê şûşe û dermanên ku ji bêrîkên Michel de diketin, berhev dikir. Bi vî awayî êdî zêde ji hevalê xwe dûrnediket, li pêşiya wî radiwestiya û weke xelkê wî jî jê re li çepikan dixist. Lê dawiyê çare nema. Xelkê ji wî jî xwestin ku ew jî tiştekî bike û jê re gotin: «Hevalê Michel, ka tu dikarî çi bikî?» Û ji hevdu jî dipirsîn û

digotin: «Ev dînê bêgane çima alîkariya Michel nake?»

«Sêtê bêgane» pêşiyê li ber xwe diket û tiştek di hişê wî de ne digeriya. Ji bilî hilperikîna «çaçanê» tiştek nizanî bû.

Lê carekê ji nav ezûmata ku li wî û Michel vehewiya bû, li taxeke bajêr, çavên wî bi keçeke 15-16 salî ket. Wê çaxê mîna ku Mircan xwe di xewnekê de bibîne. Lê ji xwe ne bawer bû ku wî berê ew dîti bû, yan ne. Dêmê keçikê bi wî re bişirî.

- Tu, dînê bêgane, rockê bireqise, rockê!

Ji nişka ve te ê bigota kaniya dilovanî û evînê di dilê wî de vebû. Heta bîsteke kin jî hişê wî li hev geriya: Erê, ev «çêlika însanan» bi xwe ye, ji min dixwaze ku ez kêfa wê bînim. Mircan serê xwe xist ber xwe, lê ramanên wî yên ciddî dom kirin: «Ez bi kêrî tiştekî nayêm. Tew hilperikandin jî ji min nayê!» û li ber çavên wî weke «tabloyeke bi jiyan» wêneyên hilperikandinên ku di jiyana xwe de dîti bûn, gewde bûn û sûretên wan li ber hatin vegirtin. Hilperikandina Antonio Gades, pîremêrên çiyayê Qafqasî... ji hemûyan paybilindî û hostetiya livandina piyan hilbijart.

- Tu, tu! Çima tu jî weke Michel nareqisî?

Mircan bi zivirandinê, dêmê horiyê û bi bihîstina dengê wê yê şêrîn û zelal wusa bû ku weke tu berxekî di ser de şerjêkî, ji fediyan sor bû. Ji nişka ve te ê bigota «zarokê ku benê lingê xwe biqetîne» hêdî hêdî ber bi Michel hat, di dilê xwe de: «Lo hema ez ê dilê vê horiyê xweş bikim!» got û bi Michel re li ser çepikan hilperikî. Û xwe di nav «tabloya bi jiyan» de dît, ya ku berê di serê wî de digeriya.

Hilperikandina Mircan hêdî hêdî rîtma xwe digirt, gur dibû. Wusa ku te ê bigota tevayiyî merivên dorê li wî temaşe dikin, liveke bê mane ne dikir. Hemû giranî, kubarî, marîfet û hostetiya xwe dixist livandina endamên laşê xwe. Carina sînga xwe berz dikir, hilma xwe diçikand û bi hûrmeşîn radibû ser tiliyên xwe. Carina jî destê xwe yê rastê di ser serê xwe re dikire weke mertal û yê çepê jî weke şûr dibir û dihanî, bi mêranî dikişand ber xwe, yan jî destê xwe yê rastê li ber kembera xwe mîna ku bi qevda xençerê bigire, hişk radigirt û bi qehremanî serê xwe bilind dikir û bi pêyan reqseke sivik û

ciwan dikir. Ew hilnediperikî bi qeysir ku di jena bîstikên mêranî û qehremaniyê de dijiya. Û di jiyanê de hinek lîstik jî hene ku çiqas sexte û nejêza bin jî heşmetiya wan bi merivan xweş e. Mircan ew bîstika di heşmetiya bişirîna dêmê «çêlika însanan» de vedigevizand, şa dibû û hinek ji wê jiyana xwe ya miçiqî jî temsîl dikir.

Çepik her bi her xurt dibûn, hilperikandina wî û Michel zîz dibû. Ezûmat jî li wan hati bû hev û her bi her zêde dibû. Mircan carina ji nav wan nerîna xwe li ser dêmê «çêlika însanan» radiwestand, hêrs û qewet ji awirên wê digirt. Carekê ji nişka ve, çavên wî ji nav ezûmeta ku li wan vehewiya bû, li çavên zilamekî çavzer ket. Piştî bîstekê ew î çavzer weke di «tabloyeke bi jiyan» de dîti be û pê re bi xeyala xwe qise kiri be, sûretê wî li ber çavên Mircan xweş hat vegirtin. Lê Mircan ji ramanên xwe bawer ne kir. Bi liveke hişk û awirekî tûj serê xwe ber bi aliyê ew î çavzer de kir û bi hişka dengê wî bilind bû:

- Na, ev ne Şadî ye! Ka Şadî? Kê ji we ew dîtiye?!

Bi vî dengê Mircan re dengê çepikan xurtir bû û dengê «çêlika însanan» bilind hate wî:

- Eferim, bêganeyê ciwan! Wilo, wilo! Bravo, bravo!..

Mircan hilperikîna xwe guherand û kir weke meşa «korrîda»(*) û bi hişiyarî çavên xwe ji nav ezûmatê li Şadî gerand. Û weke ku di xewnekê de be, dengek li ber guhê wî ket:

- Ya girîng ew e ku tu erebî dizanî!

Lê wî sînga xwe berz kir û destê xwe bi şûrikî bir û anî û li serê çavzer geriya. Lê ji nav çepik, fitefit û qîjewîja zarokan, te ê bigota destekî pan û zivir li defa sîngê wî ket û gurmînî ji nava wî anî. Mircan bi carekê re bû weke ku di «tabloyeke sar û bêjiyan» de rawestiya be. Liva wî sar bû. Lê wî ne ji xwe bawer kir û ne jî ne kir. Ji nav ezûmata xelkê derket û li perê dora wê sekinî. Bi hişê xwe yê çelqyayî ket gumanên taromar:

---

*(*) Gotineke bi spanî ye û tê mana* "meşa ga *yê ku di şer de sînga xwe ji rimê nade alî*"

«Mafê zarokên me jî hene ku zaroktiya xwe bibînin... ma ew zarokên ku bi wan re li hotêla Parîsê bûn, kurd bûn?! Ew bi çi zimanî dipeyivîn?...» Û ji nişka ve zaroktî û lîstikên wî yên «şer» di serê wî de weke «tabloyeke kevn û bêreng» tev li hev bûn. Û ji wan bîstikên ku di hişê wî de digeriyan, di bîstikeke kin de bi lome ji xwe re got: «Xwezî dîsa zarok bûma! Xwezî ez mezin ne bûma! Ku mezinbûna meriv ne di nav xelkê wî de be, ne bi wan re be, tu carî diyar nabe. Û zanebûna bê armanc, wendabûn e. Ax gelo nuha Mecîd û Felît li kuderê ne? Çi dikin? Gelo ew, yên mîna min çelqyayî jî venagerînin ser rê? Berê wan nadin welatên wan? Lê êdî gilî û gazin jî fêde nakin. Çi ê ji dest wan belengazan bê? Ew ê hertim çewtiyan bikin ku şareza û xwedî dîplomên weke min ê ji wan dûrkevin, û weke min dîn bibin!» «Daweta» li dora Mircan û Michel ferikî. Weke hercar dan kêleka hev û vegeriyan mala xwe.

Bîstikên «hişiyar» roj bi roj di jiyana Mircan de zêde dibûn. Hercar jî di demên weha de, ji xwe pirsina dike: «Ji bo ku ez ji vê rewşê derkevim, divê ez çi bikim? Ez kî me û çi bi serê min hatiye? Ku meriv serê xwe li ber zehemetiyên jiyanê nizm bike, pêlên jiyanê jî wî ji qurm ve radike û li ber xwe dibe. Merivê ku haziriya xwe neke, ku li pêlên wê siwar be, ew ê li ber tofanê here, li tu erdî şîn nabe û bi durustî jîndar nabe!...» Wî her xwe bi xwe digot: «Min çiqasî xwe ji wan pêlan da alî jî, wan her bê rehm ez avêtim vî alî û wî alî. Demek ji min re divê ku ez bi rê û daxwaza xwe ciyê xwe hilbijêrim. Ji bo vê yekê jî rojekê berî rojekê divê ez ji xwe re pasportekê derxînim, û xwe bigêhînim welêt. Bi vê daxwazê, carekê da kêleka Michel û çûn belediya bajêr, li wir Mircan ji jineke karmend re:

- Ez dixwazim ji xwe re pasportekê derxim! got û qerta xwe danî ser masa ber wê.

Karmenda ku ji dêmê Mircan nas dikir, beriya ku li qerta wî binere, bi zarekî qerfane lê vegerand û di nav kenê xwe re pirsî:

- Tu pasporteke çawa dixwazî?... Ji bo çûyîna ser hîvê, yan

ji bo gera Babilonê?!

Mircan wê gavê xweş fam kir ku xwe bixeyidîne jî û xwe nerihet jî bike, tiştekî bê sûd e. Wî di nav kenê xwe yê tamsarkî re lê vegerand:

- Hema yeke çawa ji dest te derbikeve! got û serê xwe bera ber xwe da.

Jinikê bi wê laqirdiyê jî dosyayek danî ber xwe û dagirt. Ji nişka ve dîsa bi kenekî hebhebî re:

- Ez profesiona te çi daynim? Ma te di jiyana xwe de tu kar kiriye? pirsî, kenê xwe hinekî din jî qubetir kir û berdewam kir: Ma dîplomên te hene?

Mircan bîsteke dirêj rawestiya, sar bû, cemidî û bê ruh ma. Keleke girî ew hilanî, qirika wî hat girtin û çavên wî xwe ji ber xwe mişt hêsir bûn: «Bi vî navê şêtbûna ku bi min ketiye, ku ez jê re bibêjim, di warê kurdolojiyê de ez doktor im, gelo ew ê bigirî yan ew ê bikene?» Di wê gavê de rewşeke xerîb ku tu carî dijayetiya ken û girî wusa tevlihev ne bûne, bi wî girt. Lê êdî ne ken û ne jî girî jê dihat. Bi orîneke şêt qirika wî vebû:

- Ez doktorê kurdolojiyê me! Ez doktorê kurdolojiyê me!... Hûn bawer dikin, nakin... bi kêfa we ye!

Bi borebora girî pişta xwe bi wan de kir û derket. Hemû karkerên dayirê serê xwe di ber de zivirandin û matmayî bûn. Lê hîna xwe ne gêhandi bû devê derî, dengê hevalê wî Michel kete guhê wî: «We çima hevalê min xeyidand? Ew rast doktorê sêxologiyê ye ha!»

Rewşa Mircan ma weke berê. Bi oreor pêlên kela girîyekî nedîtî jê diçû.

# MUHRA MUXTÊR

Ji şevên havînê şeveke sayî bû, qursa heyvê di zikê ezmên de weke dêmê keçeke bedew û devliken, şewq û nûr jê diçû. Şewqê topraxa gund û ser bêndera hemû kifş dikir. Te digot qey bona eşqa dilê wî ev zelaltî, şewq û nûr li esmanê gundê wan giyane hev. Silo, per û baskê wî tune bûn ku bifiriya. Lê kêfa wî tamsarkî bû, geh bi xwe re dikeniya, geh jî sar cemidî dima û wehs dikir... Rê li pêşiya wî vebû... ma ku xwe hazir bike û bi rê bikeve, «Partiyê bi xwe, xwe daye ber!... Lê gelo, partî ê çawa min bigihîne Bêrûtê?» -Carina ji xwe dipirsî û sar dima. Ev ne pirsa yekemîn bû ku Silo nikarî bû bersiva wê bida, lê her ku rê li ber teng dibû û xeyala wî dihat girtin, wî digot: «Ez ê ji çi bitirsim, partî bi karê xwe dizane, ev ne karê min e, ez xwe di her îş û emûran de dibelînim!»

Gava Silo gêhîşt malê, kêlîkê li ber dikê rawestiya û li ehlê xwe yên razayî li ser dikê nerî, bêdengiyeke giran e! Hemû di xewa şêrîn de ne, tenê bavê wî, hinekî dikir xirtexirt. Li kêle-

ka wî jî, xûşka wî ya biçûk lihêf ji ser çû bû. Silo hêdî lihêf kişande ser xûşka xwe û di ber xwe de fikirî: «Heger niha ew şiyar ba û bizaniya ez ê herim Bêrûtê, wê ê xwe çen bikira himêza min û bi zimanê xwe yî şêrîn bigota»:

«- Tu ê ji min re lîbanek sol bînî!»

Silo, bala xwe da hemû neferê malê û di dilê xwe de tiştên ku wan ê wesiyet kiri bûya, dihanî bîra xwe; di ber xwe de jî jimart: Hibriya hevrişîm ji diya min re; çakêtekî eskênc ji bavê min re; cotek solên panîbilind ji xûşka min ya mezin re...

Silo, bi hemd cilê xwe danî, tu kes bi xwe şiyar ne kir û xwe xist nav nivînan... Lê ma ew ê xewa kê bê? Balgeh di binê serê wî de ji kevir hişktir bûye. Xwe diqulpîne vî alî wî alî, lê bê fêde ye... «Heger Xwedê got erê, ji niha û sê çar rojên din ez ê li Bêrûtê bim!...»

***

Beriya ku Silo vê êvarê vegere malê, ew li civîna partiyê bû. Berpirsiyarê komika wan, tevî hemû endamên xwe civiya bûn. Berî niha bi demekê, Silo nameyek şandi bû ji komîta navçîn re ku alîkariya wî bikin, wî bişînin Bêrûtê, bona bikari be xwendina xwe bibe serî û di ber re jî ji xwe re karekî bike. Niha jî di vê civînê de, yê berpirsiyar bersiva wî da û jê re got:

- Partiyê xwe da ber te, ew ê te bigêhîne Bêrûtê û li wir heval pir in, ew ê ji te re texsîr nekin. Hema te xwe gêhand Şamê,tu gêhay Bêrûtê! Li wir hemû tişt hazir e!

Silo jî wê çaxê pirsî:

- Ez ê bi pasportê derbas bim yan bi «Şehada Tarîfê?»

- Na, -yê berpirsiyar lê vegerand- ev ne karê te ye, tu xwe bi çi hawî digêhînî Şamê, bigêhîne. Ji wir û pêve, ew êdî karê partiyê ye!

Wê çaxê Silo di dilê xwe de got: «Na xwe divê sibe Şehdak xwe ya tarîfê nû, binivîsim, muhra muxtêr lêxim ku ez xwe pê bigêhînim Şamê!»

Di komika partiyê de, ya gundê wan, ev heye serê sê çar mehan ku hercar nîqaşeke germ çêdibe li ser anîna lawê muxtêr û qebûlkirina wî di partiyê de. Silo û endamên komikê yên din li alîkî li dij disekinîn û berpirsiyar li alîkî dixwest

ku Lazgînê kurê muxtêr bibe endam. Yê berpirsiyar digot: «Bi anîna Lazgîn, gund li ber me vedibe, em dikarin êdî Newrozên xwe eşkere çêkin!»

Navbera Lazgîn û berpirsiyar jî gelek xweş bû, lê navbera endamên komikê û Lazgîn, gom bû. Di bin re, gotinên civînên wan digêhîştin Lazgîn, wî jî hîn bêtir gef li wan dixwar, lê nikarî bû bi eşkere şerê giştikan bikira.

***

Serê Silo li ser balgehê nahewe, xwe diqulipîne vî alî, wî alî lê bê fêde ye; çavê wî narin ser hev. Xwe qulipand ser piştê û çavên wî zuq man li ezmên... Dêmê heyvê bi şabûn dimizice, lê şabûn, her bi tirs e di dilê wî de. Weke zarokê biçûk destê xwe ber bi heyvê û sitêrka dirêj dike ku wan têxe nav lepê xwe û li hêla din ricifiyeke weke ya çûkekî şilbûyî ramanên wî, direhilîne. Hewasê wî û bîranînên wî pêre pêre tof dibin û ditewirin.

«Erê çûyîna Bêrûtê ne hêsan e, ne lîstik e! Lê dîtina bextiyariyê ji çi re ye ku ne di nav zehmetiyan re be?.. Bi sedan kes berî min çûne, kar kirine, pere girêdane û halê wan xweş bûye... ma ez ne weke vê xelkê me?... na, na... her yek bi sedemekî dere, ez ne ji bo peran derim, ne ji bo ku peran girêdim!..»Silo di ber xwe de fikirî: «Armanca min ya yekem, xwendina xwe bibim serî; lê ku Xwedê li hev bîne, ez ê potina jî ji ehlê xwe re bişînim!

Ji nişkê ve çavê wî li sitêrkekê ket...«Tu ji xwe re binêre... çi şewq jê diçe, kî dizane, belkî ev sitêrka bextiyariyê ye? -Silo dilê xwe xweş dikir -hema bi Xwedê ev cara yekemîn e ku li vî ciyî, ez vê sitêrkê dibînim... Ha... ha... ha! ket, ket... (bi dengê bilind got) sitêrka min ya bedew, sitêrka bextiyariyê. Xwedê!... dibe ku ez jî weha xweş bi rê de herim û dûre wusa bi lez bême xwarê û bikevim?... Na, na... ew ne sitêrka bextiyariyê ye, ew sitêrka xezebê ye, wa ye Xwedê ew bi ser mala muxtêr de xist! Ew li aliyê wan ket. Gelo kî dizane, belkî ew bi rastî jî sitêrka bextiyariyê be? Hevalê me yê berpirsiyar jî îro pesnê mala muxtêr dida, pesnê Lazgîn dida!? Gelo kî dizane, dibe ku ew jî bextê Lazgîn bû, bi ser mala wan de çû?

Ma belkî berpirsiyarê me jî dawiya şevê here mala wan û hemû tiştî ji wî ehmeqî re bêje, û bêje ku Silo dixwaze here Bêrûtê!? Bi Xwedê, heger ew bênamûsa bibihîze, ew ê ji hesûdiyê bibehice.»

Silo li xwe qehr anî û di dilê xwe de dikezirî: «Ax!... Ez ê çi bikim!? Gerek min ji berpirsiyar re bigota.» Lê her û her ew li ser qerarekê û biryarekê ranediwestiya. Her gavekê û gavekê tiştek dixwest. Ku li gor xwestina wî bibûya, diviya bû çax û dem teqnekê bi şûn de vegeriya, an jî ne liviya... Ev çend û çend car Silo siqêfa ji xwe re dide û xwe şermezar dibîne. Tu karekî ku wî kiri be û dûre poşman ne bûbe, tuneye. Û carina jî, ji xwe re dibêje: «Heger ji destê min bihata min ê aqilekî din ji xwe re danîya, hema tim û tim poşman im!»Diya Silo jî carina wilo jê re digot: «Tu heftdilî yî, teqlomeqlo yî!» Lê sûcê kê ye? Kê ez wilo perwerde kirime? Ax!... -bîhneke kûr kişand û li kêleka xwe nerî- Gişt sûcê vî xenzîrê ku dike xirexir, sûcê bavê min e, bavê min!» Silo xwe bi xwe difikirî û hêdîka xwe qulipand ser kêlekê, li xirexira bavê xwe guhdarî kir... Piştî bîstekê, dîsa li xwe vegerand: «Çi sûcê vî rebenê kal heye?... Wî ez çêkirim, xwedî kirim, ez dam xwendinê... Ma hîn ez çi jê dixwazim?... Hemû bav jî vi tiştî ji zarokên xwe re nakin, wî rojekê jî ne hişt ez herim ber berxan, yan karekî giran bikim... Bav per û baskan bi zarokên xwe ve nakin weke ku tu kes teyran hînî firandinê nake û tu kes masiyan hînî sobayê nake, tu kes merovan hînî jiyanê jî nake! Heger mirov, bi hêz û qeweta xwe, xwe serbest û şareza neke, tu hêz û qewet, serbestî û şarezayî... pê ve nake.»

Serê Silo giran bû, çavê wî qerimîn. Destê sibê, dunya zelal bû ne bû, bêhemdê wî çavê wî çûn ser hev û raket.

Sibehê, gava ji xew rabû, roj hati bû nîvro. Bi lez şehada xwe ya tarîfê nivisand, da destê dîya xwe û got:

- Yadê, vê kaxezê bibe mala muxtêr, bila muhrê li jêr xîne!

Piştî kêlîkekê, diya wî vegeriya, kaxez di dest de û çav mişt hêsir. Gava wê kaxez da destê Silo, gulolîkek bê hemdî wê bi ser de ket:

- Ha ji te re lawikê min... Sêwlekê Lazgîn ne da!

Silo, reş û şîn bû, hêrsekê ew hilanî, yekê ew danî, lê te digot qey lingên wî bi mîxan bi erdê ve hatine kutan... Deqekê bêhna xwe girt, birûsk ji ber çavê wî çû û weke şîrqîniya ji ber tavê diçe, bi huner û gotin ji hinavê wî derket:

- Ka edalet? Ne dewlet nifûsê dide me, ne muxtar muhra xwe li kaxizên me dixe!... Em kî ne, ji kuderê hatine?...

Diya Silo hêsrên xwe paqij dikir, xûşkên wî jî, xwe dabûn dora wê, hemû sar û cemidîn, kirtînî ji wan ne dihat. Demek bihurî, Silo cixarek pêxist û agirê niftikê da qoziya kaxeza xwe. Gava agir gêhîşt şûna hêsrên diya wî, te digot qey ew agirê biçûk bû pêtîkî mezin û qiçeqiça şewitandina... rîbana sor... hibriya hevrişîm... çakêtê eskinc... Û sola panîbilind... ji guhê wî dernediket û li ber çavê wî hinek ji daxwaza dilê wî tev wan dişewitî.

# CIVÎN

Gotinên ku wê şevê Şêrzad bihîsti bûn ji bîra wî ne diçûn. Her kêlîkê radiwestiya, pirtûka xwe digirt, dixist binçengê xwe û gotinên wê şevê û çîrokên ku tê de bihîsti bûn, yek bi yek dihanîn bîra xwe... Ev roja duduyan e ku ew bi vî cûreyî nikare du xêzan li ser hev ji pirtûka xwe bixwîne! Ger pirtûkê vedike jî, gotinên wê şevê, di serî de dixilxilin, li ber rêz dibin û şûna tîpê pirtûkê digirin, nikare ji bin bandora manên wan derkeve.

Taqekirdin (îmtîhan) nêzîk dibe, rojên berî wê jî, girîng in. Şêrzad berî wê şevbihêrkê, her roj, danê sibê û êvarê radihişt pirtûkek xwe û diket ser riya sînorên tenan û dixwend. Gundiyan hisreta xwe bi lawekî wekî wî jîr û jêhatî dihanîn. Carina gotin jî li ser derdiketin «Camêr dixwaze yekemînê dersxana xwe derkeve!» Ew jî, ji cerga ku ji bajêr hatiye gund, bona xwe hazir bike ji taqekirdinê re, tu karî nake ji bilî xwendinê. Kêm caran dere nav gundiyan. Heger carina pêrgî

wan dibe jî, gelekî li wan nasekine. Hema ku ji mal derdikeve, devê pirtûka xwe vedike û wê nagire heta vedigere û digêhîje devê deriyê malê.

Lê ev du roj in ku xwendin ji ber naçe. Ku pirtûka xwe vedike, nav û gotin û ciyê ku di wê şevbihêrkê de bihîsti bû, dihatin ber çavên wî. Û ew niha carina ji xwe re dibêje: «Dunya li kuderê ye û ez li kuderê me, min xwe ji hemî dunyayê qut kiriye û daye ser pişta xwendinê, bê gûman gelek ji şevbihêrkên wilo xweş di ser min re buhurîne.»

Hertim ku derdiket, serê xwe ji ser pirtûkê ranedikir, te bombe jî li ber biteqanda, çavê wî ji tipên pirtûkê dernediket, lê îro tiştekî nû di serî de dixilxile, li hawirdorî xwe dinêre, li şopa xwe ya her roj, li ser rê dinêre. Hat bîra wî, «Gelo gava ez bê serî li vê riyê diçûm û dihatim, çiqas tiştên xweş li dunyayê diqewimîn?» Hêdî hêdî dimeşiya û bi çavên xwe yên zelûl li hawirdorî xwe dinêrî... tu dibêjî qey ev cara yekemîn e zad û dexla, kulîlk û giyayên rengoreng dibîne. Dengê çûkan û zîqezîqa sitranên beratan ku bilind bilind dirêsin, baskên xwe li ba dikin û tu dibêjî qey dipeyivin... Sitiriyên kerengên bihurî bi ser simbilên geniman ketine...

- Erê... Erê. -Şêrzad di ber xwe de got- Her tişt tên guhertin ku merov nerîna xwe li ser wan qut bike, zad her sal li erdekê çê dibe, lê sal bi sal zadê teze derdikeve, giya û kulîlkên nû pê re hêşîn dibin, kereng û pîvongên nû li dora kortikên kevin derdikevin. Beriya şeş heft salan, bi awakî din min li van tiştên ha dinêrî... Lê niha tu dibêjî qey ez merovekî din im... lê miheqeq ev tiştana jî ne yên berê ne!

Qursa Royê her bi her mezin dibe û ber bi rojava da diçe, ewrên sivik jî li dorê tên ser hev, weke xêzikan li dorê çêdikin. Şêrzad serê xwe rakir... wa...! Çi ye lo...? Tu ê bêjî eyn xelekên çiyayê Torosê ne, şiklê di pirtûka wî de, piçekî jî ferq nake... Lê ewrê din, yê li hember... Sibhane-el-la!... eyn zilamekî bi kum û koloz e, tu ê bêjî qey wî zilamî rahiştiye tevşokî mezin û pê ketiye, wî çiyayî diherifîne! Şêrzad bêhnekê rawestiya, çavên xwe firikand û dîsa li wî şiklê dora qursa royê hatiye hev, nerî... Haho...! -Xweziya xwe daqurtand- Tiştekî

dûrî aqilan e! Zilam tehteke mezin ji çiyê birî, lê ew teht, hêdî hêdî di qursa royê de tê veşartin, ji hêla Şêrzad ve nema perçekî mezin jê tê xuyakirin, li ser dibe sî. Te digot qey nava Şêrzad hebekî ricifî, weke yekî ku sermayê bixwe. Tevzînokên sar jî laşî wî girtin. Ji bo ku wan «tiştên vala» ji serê xwe derxe, pirtûka xwe vekir û di ber xwe de bi dengekî bilind got:

- Qey gotinên pîrika min rast bûn ku digot: «Xwedê teala heywanatên mizir ji erdê dikşîne ezmana, ji bona ku mezeretê negêhînin insan!»

Roj hêdî hêdî dere ava, zerayî li şûna wê dimîne. Ji aliyê gund ve, mayêmayê keriyên pez, reyandina kûçikan, dikeve guh. Tozek giran jî serê gund girtiye, tu ê bibêjî qey du kerpîçên sax li ser hev tê de ne mane, tev bûne ax û xwelî, toz û ecacok. Şêrzad dîsa pirtûka xwe girt, berê xwe da mal. Ewî bi kul û hesret di ber xwe de got û mitale kir:

- Îro jî çû, vala!.. Ev du roj in derbas dibin, min hîn pelek jî di wan de ne xwend! Vê şevbihêrkê çi anîn serê min? Xwedê! Hişt ku xwendin li ber çavê min reş bibe, hişt ez ecêba bi çavên serê xwe li ezmana bibînim; bê çawa hût xwe didin ber şewqa royê û dixwazin bixwin; hişt ez çiya û zilamên rastîn di ewran de bibînim; hişt ez bala xwe bidim şopa xwe li ser rê; hişt ez li dengê çûk û beratan guhdarî bikim...

Şêrzad ji nû ve şevbihêrk ji serî heta binî anî bîra xwe:

***

Pêr êvarê bû. Gava Şêrzad weke her roj ji xwendinê vegeriya mal, bi rê de, lawê cîranê wan Mervanê Ezîzo pêrgî wî bû û jê re got:

- Şêrzad, mêvanekî me yî pir ezîz û delal hatiye, ma tu naxwazî bê, ji xwe re lê guhdarî bikî? Wî Berzanî dîtiye, ji wir tê!

Êvarê, Gava Şêrzad çû mala Ezîzo, ma behetî, hema te digot qey temamê gundiyan hati bûn ser hev, rê û rêwanî di hundir de tune bû. Hemû li ser qelavîska rûniştî bûn, ji bilî yekî tenê, ew jî yê mêvan bû. Ciyê wî, ne ewqas fireh bû, li vi alî û wî alî wî du balgeh di bin kêleka wî de bûn, weke tu wî têxe nav du dîwaran. Heger balgehek din bidana kêleka wî, serê mêvan jî nema dihat xuyakirin. Yên ku ne li hemberî wî

rûniştî bûn, ji qotê wî pêve, tu derinê wî ne didîtin. Zilamekî hûrik û simbêl zirav bû. Tenê kefiyeke bê egal û cilên wî yên paqij, dihişt ji gundiyan bê kifşkirin.

Şêrzad gava derbas bû, silav kir û destê xwe ne da tukesî, lê wî texmîn kir ku yê mêvan bi nerîneke din li pentolon û gumlikê wî yê bajarvanî nerî.

Yê mêvan gotina xwe bir serî... « Zimanê me yek e! Erdê me yek e û bi ser hev ve ye, em miletekî cuda ne, em ne tirk in ne ereb in û ne faris in... Welatê me Kurdistan e, ciyê xêr û berketê ye, hemû maden û zîv û zêr e... Hinek dibêjin: ku Berzanî, kane di şev û rojekê de bigêhîje vê derê! Em û hemû kurdên li cîhanê deqekê jî ji bîra wî naçin!»

Şêrzad weke di xewnekê de bû, bawer ne dikir ku ev ew bi xwe ye û zilamekî ji cem Berzanî hatiye, van gotinan jê dibihîze. Wî ji xwe dipirsî: «Gelo ev zilam kî ye? Ji kuderê ye? Xwenda ye, yan ne? Heger xwenda be, çi xwendina wî heye? Çi xwendiye?..» Lê di gel van pirsan jî, baweriyek pê re çêbû, wekî ku li dawiya xelkê bimîne û pirsina ji xwe re jê bike. Û carina jî, ji xwe re digot: «Helbet ev meroveki mezin e û gelekî qîmeta wî li cem Berzanî heye, loma baweriya xwe pê aniye û şandiye nav xelkê. Heger ew bibîne ku ez pirsên hêja jê dikim, belkî ez têkevim serê wî û hema ji min re bêje: Karê xwe bike, ez te bi xwe re bibim!»

Gelek caran, gotinên mêvan ew ji civatê dûrdixist. Dihişt li ser tiştê dîtî û nedîtî bifikire. Gava mêvan behsa hinek qehremaniyên pêşmergan dikir, ew jî hema li ser wî bayî diçû... Xwe didît pêşmergakî di rext û fîşekan de pêçayî, keleşînkofek di dest de ye û raberî neyaran hatiye û wan weke zadê tu bi dasê biçinî, dide hev û dikuje... Hingî nav û deng pê dikeve, Berzanî bi xwe dişîne pê û pê re dipeyive. Destê xwe li pişta wî dixe... «Ha ji te re neynika ku meriv teyara jî pê dixîne!...» Şêrzad diket xem û xeyalên kûr û dûr. Lê carina jî, ku li çavê mêvan dinêrî û gotinên wî yên liblibî diketin guhê wî, ji xwe bawer ne dikir ku kari be tiştekî ji van gumanên xwe bîne cî. Wê çaxê jî bi melûlî li xwe vedigerand: «Ez hîna biçûk im, hîna xetê simbêla min derneketine... Heger ez ji mêvan re tiş-

tekî wilo bêjim, ew ê li min guhdarî neke... Ew meheqeq zilaman dixwaze, zarokên wek min, ji wan re nabin.» Ew, her weke di xewnekê de bû, ji xwe bawer ne dikir ku tiştekî wilo bibîne. Gava çavê wî li yên hevalê wî Mervan ket, hebekî mizicî û di dilê xwe de got: «Mala te hezar carî ava be, te ez anîm vê civata xweş.»

Wî her li mêvan guhdarî dikir û di ber xwe de jî pirs ji xwe dikir. Gava dihat bîra wî ku pirsina bike, qirika wî ziwa dibû, ditirsiya ku hinek ji gundiyan jê re bibêjin: «De here sêwlekê heram, zarokê do ye, xwe çi şareza dibîne!» Loma jî gotinên xwe û pirsên xwe tevde di dilê xwe de dihişt.

Yekî ji haziran, gotina mêvan birî û pirsî:

- Erê pismam, ma gelo ku Berzanî bi ser me de ne hat, yan nikari be... em ê bi xwe çi bikin? Ciyê me erdekî rast e, eskerek tenê, kane me giştan bide ser hev?

Yê mêvan hinekî rawestiya, mizicî û te digot qey awirê wî vegeriyan ser Şêrzad, weke yekî ji xwe re bêje, «Tu ji xwe re li aqilê wî, çi pirsan dike?!» Şêrzad jî bi xwe dixwest pirseke wilo bike, lê wî di xwe dernexist ku pirseke wilo li telê wî tê, ew jî, hebekî mizicî û piyê xwe hejand. Yê mêvan, bi pirs dest bi bersivê kir:

- Ezbenî, te navê dewleteke weke Hindistanê bihîstiye?

Şêrzad, wê çaxê xwe firfitand û kire ihte-iht, lê yê mêvan bi xwe berê xwe dayê û pirsî:

- Bi aqilê min hejmara wan 300 mîlyon e, ne ?

Şêrzad wê çaxê gûman ne kir, wekî pirs ji wî re ye, vegerand:

- Na, na, îsal dersa Hîndê, bi me re derbas bû ye, jimara wan 580ê mîlyon e!

- De min ne got -mêvan berdewam kir- vê dewletê, ma hûn zanin ka çawa xwe serfiraz kir?.. Zilamek tenê bû, zilamek! Navê wî, Mahatma Gandî, hemû miletê xwe ji bin destê îngilîz derxist. Ew jî çawa?.. Carekê, Gandî hîna biçûk bû, di emrê vî pismamê min de bû -mêvan destê xwe ber bi Şêrzad kir- Hîna xwîna wî germ bû, têr merîfet ne bû bû... lê qehra zilma îniglîz, nema tehmûl kir. Carekê ew ji mal derket û ne-

bedî bû. Dê û bavê wî, nema zanî bûn bê li kuderê ye? Çi dike?.. Lê wî, xwe ji ber tukesî venedizî bû. Ew çû nav gund û bajarên Hindistanê, digeriya, xortê mîna xwe xwîngerm sor dikir ku dest bi şer bikin, li dijî çavsorî û zulma îngilîzan. Gandî geriya, geriya,... rastî çend hebên weke xwe hat. Wan soz dan hev ku dest hilînin û şer bikin. Demek çû, Gandî pir nerihet bû, kar zû bi zû ne digiha ser hev. Rabû qerar sitend ku here malê, bona hinek alîkariyê ji dê û bavê xwe bistîne, wan jî bibîne ku dilê wan têkeve cî. Gandî, beriya ku here malê, nameyek şand, tê de nivisî bû ku ew ê filan rojê bigihêje malê. Roja Gandî hat, diya wî derketi bû pêşiya wî. Wê rahişti bû qetek hesin û kevirekî sotinê pê dixist! Gava Gandî ev tişta dît, ma behetî! Ji diya xwe pirsî:

- Dayê, tu çi dikî? Ev çi hesin û kevirê sotinê ye di destê te de?

Diya Gandî bi dilovanî lê vegerand û gotê:

- Lawikê min, ez dixwazim şûjin û derziyan ji mala me re çêkim!

- Lê tu zanî ku tu salekê jî çêkî, tu xelas nakî?! Yê hazir li sûkê weke axê ne, li her dikanê hene, difroşin!

Gandî, di ber dilê diya xwe da, lê ew di wê baweriyê de bû ku hişê diya wî kêm bûye û xurifiye. Lê diya wî, bi şarezayî lê vegerand:

- Lawo, ez jî weke te, tiştê îngilîzan çêkiriye, hazir li dikana dibînim, kirîna wan jî, hêsantir e ji çêkirina van derzî û şûjinên ku ez ê çêkim. Lê ma em ê çawa bikari bin îngilîzan ji welatê xwe biqewitînin, gava hemû kirîn û firotina me bi wan re be? Em tiştê xwe pir bi erzanî difroşin wan, dûre duqat buhatir, çêkirî, ji wan dikirin. Heger em xêrûbêra welatê xwe, bi xwe hilînin û deynin, çêkin û bifroşin miletê xwe, tu karê îngilîzan li vir, li welatê me namîne!

- Dibêjin, -yê mêvan berdewam kir- ku Gandî bû wek yekî ku serê wî li tirbê keve, nas kir ku çi gerek e û ji çi dest bi şerê îngilîzan bike. Wî jî ji mala xwe dest pê kir. Nema bi filsekî tiştekî îngilîzan kirî û ne tiştekî mala xwe firot wan. Û helbet milet bi ya wî kir, wî çi bixwesta, milet jî weke wî dikir. Û we-

ke dibêjin, «milet bi qaîdê xwe ye»! Heger qaîd riya baş û rast da pêşiya milet û ew bi xwe li pêşiya milet meşiya, milet ê gişt bide pey wî... Vêca, çi ji me tê xwestin? Divê em çi bikin? Serokê me çi dixwaze ji me?.. Gelek ji me baş nizanin û ji hev dernaxin!

Gava Şêrzad ev çîrok bihîst, mûyên laşê wî rabûn. Wî baş bala xwe dida ser gotinên mêvan, lê di dilê wî de bû hesret, gelo cilên mêvan bi xwe yên dikanan e, yan wî bi xwe dirûtiye. Carina bi nerînên hûr li kincên wî dinêrî, lê şewqa lampê nizm û dûmana cixaran ne dihişt ew tişteki ji hev derxîne.

Şevbihêrka wê şevê dirêj bû. Yê mêvan gelek çîrokên din weke çîroka Gandî li ser Berzanî jî got. Lê Şêrzad wek yekî ku xwe di dunyayeke nû de bibîne, cara pêşîn şevbihêrka wilo pir xelk û ezûmet, li ser miletê xwe yê kurd hazir dibe.

***

Şêrzad serê xwe yê giranbûyî ji pirsan rakir, dît ku dîsa Mervanê Ezîzo pêrgî wî dibe, jê re got:

- Mervan, tu bi Xwedê dikî, heger careke din ev mêvanê we bê, min haydar bike, ez ê dîsa bêm ji xwe re guhdarî bikim, çi şevbihêrkek xweş bû!

Mervan, wekî arifekî rîsipî, bi şarezayî û bawerî vegerand:

- Hey ehmeq, tu di guhê gê de î, ev ne şevbihêrk bû. Şevbihêrka ku tu dikarî bi pîrika xwe re biqedînî, gava di zaroktî de ji me re çîroka «Gur û rovî» digot. Ev civîn bû, civîn!... Civîna partiya me bû, te nas kir?!...

Şêrzad, ma sar û cemidî, serê wî ket ber, û te digot qey bû bizmar di erdê de, nema tevger jê çêbû... Û şevbihêrk bû girêkek mezin ji têderxistinoka, di serê wî de digeriya, disincirand. Gotin û çîrokên tê de bihîsti bû, dawiya wan ne dihat. Û di wan rojên girîng de, yên berî taqekirdinê, her roj danê sibê û danê êvarê Şêrzad radihişt pirtûkek xwe û dida ser riyan... lê xwendin qet ne li ser bala wî bû. Bû bû weke teyrê ku ji refê xwe bimîne, hertim di mitale û bîrên kûr û dûr de bû. Her roj şiklên nû di ewrên ezmên de li ber çavên wî çêdibûn û te bombe jî li ber wî biteqanda, wî nerîna xwe ji wan qut ne dikir.

Weke demsaleke nû şûna yeke kevin bigire, Şêrzad jî pelek bû û ji dara xwe ket, tu ramanên berê di serî de ne man. Te digot qey ne ew Şêrzadê berê ye ku «Dixwest yekemînê dersxana xwe derkeve» nema du xêz û hevok ji pirtûkên xwe xwend... Gava bû wexta taqekirdinê, wî karê xwe û bajêr jî ne kir.

# RESÛL

Berî sê mehan, Resûl bû bû melê gundê Avsîra. Ew jî piştî tifaqa gundiyan bi bavê wî re, Şêx Tace-dînê Kerkundî. Çend rojên pêşîn, Resûl bi qedir û qîmet li gund derbas kirin. Gundiyan, ne dihişt ew danekî bi tena xwe li mal rûne. Her roj li malekê bi şîv dibû û civat li dora wî digeriya. Çendak derbas bû, Resûl bû weke yekî ji gund, bi ser sixletê hemû gundiyan ve bû; nas kir bê kî çi halê wî ye, kî çi kul û derdê wî ye. Lê yekê tenê hişê wî biri bû; nizanî bû wekî ew herdu keçikên ciwan û bedew yên ku ji mala Hecî Hemîdo derdikevin, kîjan ji wan keça wî ye û kîjan jina wî ya piçûk e! Yekê ji wan dilê wî dikewgirand. Şeva ku li mala wan jî bi şîv bû, her ku çavên wî li yên wê diketin neqrîsk ji dilê wî diçû, lê helbet, weke melekî şareza ne dihişt ku kes pê derxe.

Gundiyan jê re digotin «Seyda», lê navê wî yê rastî Resûl bû. Xortekî 25 salî, bejinzirav û bilind bû. Hingî dêmê wî zer bû, te ê bigota, te ew di quşûfê de kiriye. Zerbûnê, bilatim

avêti bû zelaliya çavên wî û dihişt ku merov zelûltiyeke kûr û bêsînor di wan de bibîne. Tenê şaşika wî ya sipîboz û temîz ku bi hostayî li serê wî hati bû pêçan, dihişt ku merov hinekî bi ûcaxî û zîyaretî manê bide wê zerbûna quşûfî.

Resûl bi xwe tu feqetî û meletî di jiyana xwe ne kiri bû, şerîet jî li tu deran ne xwendi bû. Tenê şeş sinifê medresê tewaw kiri bû, ew jî bi teşqele û çetinî, ji ber ku di zaroktiya xwe de pir mizir bû, fêlonek bû. Bevê wî jî, şêxekî bi nav û deng bû, ditirsiya ku Resûl di dibistanan de xisletê wî hîn xerabtir bibe, ew ji dibistanê derxist û wê çaxê ji xwe re digot:

- Heft zarokê min hene, evaya jî bila bibe bi goriya wan. Hesêb bike ku çênebû. Birayên wî, el-hemdûlîl-lah, ji dîn û dunya xwe jî ne man. Lawek xeys derket, wê Xwedê rizqê wî jî bişîne!

Resûl mezin bû, bû zilam, lê tu meremên bavê xwe bi cî nanîn. Ji nişkê ve Xwedê deriyê fereca xwe vekir: Xelkên gundê Avsîra hatin cem, xwe avêtinê da ku melekî ji wan re bişîne. Wê çaxê Şêx Tacê-dîn, hema kurt birî û lawikê xwe, Resûl şand û ji xwe re digot: «Belkî Xwedê teala, wî talî-emir hidayet bike û ew jî bibe weke hemû birayên xwe yên din, melekî zane û bi şîmet!»

Niha jî ku Resûl bi tena xwe carina dimîne, ji xwe re dibêje: «Bavê min ez kirim mele jî, lê min bi nêta xwe, tiştek ji xwe re ne kiriye! Gelo ne ehmeqî bû min bi ya wî kir!... Çima min jî weke gelek hevalên xwe, ji xwe re karekî din ne dît?...» Û carina jî, ji xwe re digot: «Ez bi kêrî tiştekî ne hatim, loma divê ez ya bavê xwe bi cî bînim?»

Ji «mele» Resûl re, ne gelekî çetin bû ku awayê melê «heftilmî» bike. Ew di maleke oldar de mezin bû bû. Helbet hinek ji awayên melan, di serî de man. Niha jî dizane divê çi bike, ta ku gundî jê razî bin, qedrê wî bigirin... Heger carina di civatan de, hinekan pirs jê dikirin wî yekser bavê xwe dihanî bîra xwe, bê çawa bersivên xelkê dida. Ew jî, teqnekê difikirî, li dêmê pirsker ne dinêrî û bi teqil û giranî bersîva wan dida.

Erê mele Resûl şerîet baş nizanî bû, lê wî xweşik zanî bû

awayê melan bikira. Di civatan de pir giran bû, kêmlebat û peyv bû. Xwe tev hemû kar û emûrên dunyayê ne dikir. Lê di hundirê xwe de, qijeqij ji nava wî dihat. Ji xwe re digot, «Ez ê awayê melan bikim, heta ez bibim melê rastîn.» Lê carina jî bi xwe dikeniya «Ez weke roviyê awayê şêran bike, gelo heye rovî bibe şêr!»

Ku Resûl bi tena xwe dima, bi kul û êşên xwe dibiliya. Tu kesî bi derdê dilê wî nizanî bû. Ew di jiyaneke dunyayî de difikirî. Jiyanek ku demên wê, yê wî ba, awayê tu kesî ne kiri ba. Kengî çi xwesti ba, goti ba; çi bi destê wî hati ba kiri ba. Lê niha jê tê xwestin awayê melan bike, ji bona dawiya salê zikata xwe bistîne. Tenê vê yekê dihişt dêmê yê rastîn were veşartin û dêmê nimûne kifş bike. Di meha sisiyan de mele Resûl pir nerihet bû bû. Hema ku li nav gundiyan rûdinişt, jê werê ku laşê wî girêdaye, yan ne yê wî ye. Ew nikare her tevgerê bike, her gotinê bêje... Di mejiyê xwe de tim gotinên xwe hildibjêre... vê gotinê divê ez bêjim, vêya divê nebêjim... Ev ya melan e, ev ne ya melan e... Bavê min digot, filan meleyî weha digot! Divê ez awayê wan bikime ku ez bêm xuyakirin, mîna melekî şareza, zana, «heftilmî»...

Ji ber vê teklûfeta ku mele Resûl xwe tê de didît, wî nema gelekî dixwest tev li gundiyan bibe. Êvaran, hema ku limêja eşa li pêşiya gundiyan dikir, tevdîra çûna mal dikir; ji bo ku bi tena xwe bimîne, awayê kesî neke, çawa bixwaze welê jî bike. Gava digêhîşt xaniyê xwe jî, yekser şaşika xwe davêt, tazî diket nav ciya û diket mitalê kûr û dûr. Ew bi tana xwe dima, lê weke xwe jî dima, bê şaşik û rûçikê meletiyê. Çi dixwest dikir û kî bixwesta dihanî bîra xwe.

Carina destê xwe di ser laşê xwe re dibir û Resûlê biçûkê fêlonek dihanî bîra xwe. Û di dilê xwe de jî carina digot: «Min tiştek heta niha bi nêta dilê xwe ne kiriye, lê Xwedê kerîm e, va ye mûsim hat, ez zikata xwe distînim û berê xwe didim bajêr. Ji xwe re karekî din dibînim! Ma ez weke Îsayê mele Mihemed nabim ku ji xwe re dikanek vekiriye, melek jî ne bi halê wî ne?... Xwedê kerîm e!... Hecî Hemîdoyê kal, êvaran dikeve nav pêxîlê vê keçika bedew û ciwan, û Mele

Resûl bi tena xwe di nav van livînên sar û cemidî de vedimale, dilerize... Ax, ma ev rastiya Xwedê ye!?... Kalekî pîr, mêrê du jinan e û xortekê 25 salî, destê xwe di ser laşê xwe re dibe û tîne, di hesretan de ye!»

Roj bi roj ev halê Resûl e, her roj hema limêja eşa li pêşiya gundiyan dike, dere mal û dikeve mitalan. Roj bi roj jî, dêmê wî zertir dibe, tu dibêjî qey tu wî di quşûfeke nû de dikî. Gundiyan jî, ev leza Mele Resûl bi hawakî din fêm dikirin. Gava hinekan jî ji hev dipirsîn, Sofî Ebaso gundiyê wan û mirîdê Şêx Tace-dîn bi xwe bû, yekser bersiva wan dida û digot:

- Mele Resûl weliyekî Xwedê ye, van şevê dirêj pêde, tena xwe, di limêj û îbadetê de derbas dike. Dunya hîç ne li ser bala wî ye. Xwedê me têxe ber xêr û bereketa vê malê!...

Sofî Ebaso, limêjek çi ye, bê cemaat ne dikir. Û karê wî, li nav gundiyan, behsa mala Şêx û zarokên wî dikir. Wî digot: «Ev heft salê min e ku ez mirîdê vê malê me, hûn dibêjin ev zerbûna dêmê mele Resûl ji çi ye?... Ev îşareteke ji ba Xwedê ye... Yê me gundî, hema em limêja xwe ji hustuyê xwe derdixin, em dikevin dunya bi qirêj, dîsa gunehan dikin. De Mele Resûl di vî emrê xwe de, şevên dirêj di zikir û îbadetê de diqedîne, bi melayîketan re di suhbetê de ye!... Ewliyayên Xwedê giştik weha ne, kêm gotin in, lê pirîbadet û emel in!...»

Zikrê Mele Resûl û hêbeta wî, di nav gundiyan de baş bela bû bû. Ew ji ser zimanan ne diket. Wey li wî îcar, yê kari be ji wî wextê Mele Resûl yê hindik, deqekê ji xwe re lê guhdarî bike, waezeke wî bibihîze, têkeve suhbeta wî!

Hinekan ji gundiyan guman dikirin, «Wekî Şêxê mezin here rehmetê, meheqeq wê Mele Resûl şûna wî bigire!» Gava ev ilmê xêrê digiya bavê wî jî, ew bê per û bask difiriya û ji xwe re digot: «Xwedê teala rûçikê me sipî kir!»

Xelkê Avsîra keti bûn tatûlekê. Wey li wî be, yê ku kari be xewnekê bi melê gundê xwe bibîne. Hela pîrekên gund, her roj xewn pê didîtin: Hinekan didîtin, Mele Resûl ji şaşikê bigire heta solê, di gewr de pêçayî û weke melayîketan li ser kursiyeke ji zêr û zîv, di nava bihuştê de rûniştiye. Dibişirî, şewq û nûr jê dibarî. Hinekan jî digotin, ew dîtine bi kesk pê-

çayî, di nav gûl û baxê bihuştê de, bi per û bask difiriya. Lê jina Hecî Hemîdo ya mezin, rebenê gava dibihîst ku xelk van tiştan dibêjin, ew diket tatûleka xwe û digot: «Xwedêyo! Tu bike ku şevekê Mele Resûl, bê xewna min û hema destê xwe yê bi bereket, di ser laşê min re bide û ez bi hemil bibim; ji bo ku ev bêbava hêwiya min, hupîhazir, li ser mala ku min bi xwêdana eniya xwe daye ser hev, rûnenê!»

Xewnê gundiyan pir dibûn û gotinên wan li ser melê zêde dibûn. Ta extiyarê Hecî Hemîdo bi xwe jî kete wan gumanan ku Mele Resûl jê re «nivişţekê binivîse, belkî Xwedê teala lawekî bideyê, yan na -Xwedê bi rehm e, lê ez bi qurbana Xwedê bim- va jina biçûk jî, salek wê qedyaye, hîna jî newqa wê weke hungulîskê ye! Divê meriv li halê xwe bipirse ku Xwedê lê were rehmê!»

Mele Resûl jî, pêre pêre xewnên gundiyan û gotinên wan, di rêya Sofî Ebaso re dibihîst û pêre jî dihisiya ku qeyd û merbet di jiyana wî de pir dibin. Halê wî jî ji ber wan xerab dibe, lê wî tehmûl dikir û xwe li hêviya mûsim radigirt.

Di gund de, ji bilî Resûl kesekî bi xwendin û nivîsandinê nizanî bû. Ew bi xwe, bi awakî di dunyayê de difikirî û gundî bi awakî. Carina ji xwe dipirsî: «Gelo heta kengî ez ê bikari bim bimînim weke ewliyayên bê guneh, mîna di xewnên van gundiyên bê hiş de? Min çi anî serê xwe, bi ya bavê xwe kir? Çima min xwe bi qeyd û merbetên van gundiyên nezan û ehmeq girêdaye? Hezar kar ji min tê û min xwe xistiye tora xewnên vala û bêrûmet! Ez di cehenima Xwedê de me û xelk min di bihuştê de dibînin!»

Êvarekê, beriya ku roj here ava, Mele Resûl dîsa weke hercar, bi jiyana xwe ve mijûl dibû. Geh li hundir diçû û dihat û geh li ber pencerê radiwestiya û ji xwe re li tevgera nava gund dinêrî. Carekê ji nişkê ve dît ku ew keçik bi xwe ye... Ya ku dîti bû ji mala Hecî derdiket. Jinikê komek berxik dabû ber xwe û hêdî hêdî bi meşek nazik di ber camiyê re derbas dibû... «Ax... gelo ew jî xewnan bi min dibîne? -Mele Resûl keserek kûr kişand û nerîna xwe ji reşê jinikê qût ne kir- Bi Xwedê, madem gundiyan tevda xewnên salihan bi min dîtine,

helbet wê jî niha tiştin anîne ber çavê xwe. Ah...! -Bi dengekî bihîstî Resûl got û kesereke kûr kişand- Îro rojeke reş e, rojeke neqewimî ye di jiyana min de; îro ji min re divê ez xwe nas bikim. Ez kî me? Çi ji min re divê?... Îro divê navekî nû li xwe bikim, yan jî, bimînim Mele Şeytan, yê ku diçe dikeve xewnên pîrekên gund!»

Demeke kurt derbas bû. Ew pîreka beriya gavekê di ber re derbas bû bû, dîsa di şopa xwe re vegeriya... Mele Resûl lê dinêre û keseran dikişîne... Tilmikê laşê wê, bi nazikî direhelin û serê wê jî weke mihîna berdayî, bilind û bi kubarî li ba dibe... Resûl, li ber pencerê bû weke darekî bêruh û dilê wî di sînga wî de bê hemdî wî direqisî... Jinik jî, te digot qey bi ser wî ve bû bû. Wê jî, bêyî ku gumanê bîne ser tevgera xwe, di bin çavan re lê dinêrî... Dît, destek li ber pencerê îşaretekê dideyê, lê wê serê xwe hejand û bi riya xwe de çû. Reşê jinikê ji ber çavê Resûl ket û hêdîka bi gavên sist ji ber pencerê bi şûn de vegeriya... Çogên wî direhilîn û xwîna gevez, bi xurtî di tamarê wî de digeriya. Xwe li ser sîcadê ramedand. Destekî xwe xist bin serê xwe û ji nû ve, jinik, bi goştê xwe ve û bi tevgera xwe ve di serî de geriya.

Jinik di serî de digere û «Tebê şîrî, heta pîrî» Resûl destê xwe di ser canê xwe re dibir û «Resûlê fêlonek» tanî bîra xwe. Xwe diqulipand vî alî û wî alî, te digot qey agir di laşê wî de ye... Jinika ku nêzîkî wî ne bû bû, pê re dipeyivî... «Bi şev û bi roj ez di xem û xeyalên dîtina te de me!...» Ew jî, bû firtefirta wî li ser sicadê, xwe dibe û tîne ..A..A..A..h Ah... Ahhh...!

Ev cara yekem bû ku Mele Resûl di gund de, li xwe xweş dihanî.

Bê deng û his, Resûl teqnekê li ser sicadê ma veketî. Li kêleka wî, mêşek mezin, di sêniya mast de dikir vingeving, wî lê nerî, di ber xwe de keniya û got:

- Mêşê! Tu bimirî jî, ez te dernaxim, bi per û baskê xwe, xwe xelas bike. Yê min, ehd li ber Xwedê, ez nema alîkariyê ji kesî dixwazim û alîkariya kesî jî nakim! Ez xwe ji werta Avsîra derxim, ez ê jiyaneke nû bibînim û bi çavên serê xwe li dunyayê binêrim. Bavê min, xwe bikuje jî, ez bi ya wî nakim!

Tu jî, bi xwe, xwe xelas bike!

Resûl di vezelandina xwe de, sist û pûç bû bû. Jinik nema li ser bala wî bû. Lê serê wî sincirî bû, di awayên rengoreng de difikirî. «Kîjan qehpebavî û qehpebavê ez di bihuştê de dîtime? Ez çêtir bi xwe zanim, gerek ez li ku bim!»

- Heger ez bi ya xwe nekim, ez ê tim û tim di vî halî de bim! -Resûl ji xwe re digot û dibiland. Li derve ro çû bû ava, tariyê xwe bera erdê dabû. Mele Resûl bi kotekî xwe da ser nigê xwe, rabû. Destê xwe avêt neynikê, pê li dêmê xwe nerî:

- «Sîmatûn fî wicûhîhim min eserî el-su-cûdî»- Zerbûna dêmê salihan, ji nimêj û taeta pir e!... De ka ez herim li pêş van ehmeqan, limêja cemaetê bikim, ji welitiyê re hindik maye, va mûsim hat!

Weke her roj, Mele Resûl li pêşiya gundiyan limêja cemaetê kir û di dilê xwe de ji wan re siqêf kir. Lê Hecî Hemîdo û Sofî Ebas, dilê xwe xweş dikirin, wekî limêja xwe bi weliyekî ji ewliyayê Xwedê re dikin. Piştî limêjê, gundî ji hev belav bûn, lê Sofî Ebas hebekî xwe ragirt. Gava Mele Resûl karê xwe kir ku rabe û here mal, Sofî ber bi wî hat, dilê xwe pê şewitand û got:

- Seydayê min, ez qurban!... Xwedê ne gotiye xwe bi taetê bikujin! Yekcar xwîn di dêmê te de ne maye!

Mele Resûl mizicî û di dilê xwe de got «Ehmeqê ehmeq!» lê hinekî serê xwe rakir û bêyî ku awira xwe bi carekê re têxe ya Sofî, jê re got:

-Sofî Ebas! Madem sehet tehmûl dike, divê merov qusûrê nexe wacibê Xwedê. Wê rojek bê, em ê nikari bin bi vê sehetê wacibê xwe bi temamî bi cî bînin. Xwedê çi kiriye betal nabe!

Sofî xwe firfitand, da kêleka Mele û bi hev re dû sê gav avêtin. Gava ji camiyê derketin, Sofî Ebas, bi şerm û fediyeke melûl, pirsî:

- Seydayê min, min efû bike... Ez... Li min negire... Li min negire...

Mele Resûl, bi serbestî lê vegerand:

- Bêje, Sofî Ebas, fedî neke!

- Laneta Xwedê li pîrekan bê... Serêşa dunyayê hemû ji ber serê wan e... Pîreka Hecî Hemîdo ya piçûk, Zînê, xwe avête min ku ez ji te re bêjim, wekî tu ji fedil û keremeta xwe re jê re kaxezekê çêkî, ji bo ku Xwedê lê bê rehmê, ewladekî bideyê!

Hîna Sofî gotina xwe ne biri bû sêrî, xwîn bi gujîn di laşê Mele de tev rabû û lerzeke sar bi bedena wî girt ku hişt mûyê laşê wî rabe. Resûl hilmek dirêj kişand û teqnekê rawestiya. Di deqekê de, te digot qey dunya tevde di ser hev re qulapt. Ew gewdê pîreka têrgoşt; tilmê laşê wê yê weke cewdikê berxweş av li pêş û paş wê direhilîn; meşa tenatena nazik... gişt li ber wî di rûçikê Sofî de weke dûmanê tên ser hev... Gişt niha li ber wî ne, gişt mane li bende gotinekê...

Gotineke ku ew ê niha bihêle ew hemû xeyalên wî bibin rastî û di nav de vegevize.

Sofî Ebas li bende gotineke Mele devjihevî ma.

- Hêêê!...

Mele Resûl bê mad lê vegerand:

- Ez ê bifikirim, sibê ji te re bibêjim.

Bi gavên giran, Mele Resûl ji Sofî dûrket... Lê zimîniyeke weke zengilên deh keriyên pez di guhê wî de digere. Ew zengilekî tenê ji wan xweş nas dike, kifş dike. Ew jî weke vizeviza baskên mêşeke ku di nav dimsê de ma be, yan jar xwari be... dike vizîn û baskên wê gewdê wê bilind nake. Hema Resûl gêhîşt mal, du sê deqan li hundir çû û hat, dûre nivênên xwe danî, xwe di nav de kire weke tîpa (C) û xwe da ser hev. Te digot qey tayeke sar pê girtiye, tu deng û hîs jê ne dihat û serê wî her bi her giran dibe. Tê de şerekî mezin dibe û tu rê ji ber naçin... Gund... Bajar... Zikat... Hecî Hemîdo... Namûs... Nav û deng... Welî... Melayîket... Laşê pîrekên bi goşt... gişt di serê wî de, di ser hev re diqulipîn, tevlihev dibûn. Her yek, zimîniyekê ji ber guhê wî tîne û her yek jî pirsekê pê re çêdike, lê pirsa mezin ji bîra wî naçe... Ez kî me, çi ji min re divê, gerek ez çi ji xwe re bi nêta xwe bikim?

Roja din, sibehê, xelkê Avsîra li ser dengê dîkan şiyar bûn. Dengê Melê gund nekirin û pêjna wî jî nema hat. Ew wê şevê

ji gund çû... Û her yekî, ji gundiyan, ji xwe re tiştek digotin... û hinekan jî wê şevê di xewnên xwe de dîti bûn ku Mele Resûl firiya û bi erş û ezmana ket.

# SEYRO

Heger merovekî bêgane di sûka cil û caw, ya bajarê Amûdê re derbas be, nabe ku li himber dikana Hecî Gênco raneweste, pirs pê re çênebe, yan jî nemîne matmayî. Di wê rêza ku dikana Hecî Gênco tê de ye, ji bilî wî tu kesên bi şal û şapik tunene. Zilamekî emirmezin, nêzîkî 65 salî, di dikaneke fireh, mezin, vala û duderî de rûdine û karê wî bawişka vedide. Refikên dikana wî wusa mane ku merov dibê qey dixwaze tev dikana xwe, here rehmê. Her sê danê rojê, jinkek navsere tev firaxên xwarinê, tê firavîna Hecî didiyê, teqnekê rûdine û dûre radihêje firaxên vala û dîsa li rêya xwe vedigere. Nema tê bîra herkesî ji xwediyên dikanan, bê ji kengî de ev rûdan tê kirin li cada wan. Lê extiyarên di emrê Hecî de dibêjin, hema ji cerga ku bûye rûniştvanê bajêr!

«- Erê, ji zûde ye... hema piştî em hatin, bi salekê, serxet û binxet çêbû.» Hecî bi xwe weha ji pirsvanê xwe re dibêje, dema ku hinek jê dipirsin.

Wê çaxê, Gênco, Seyro da pê xwe û hat bajarê Amûdê. Û li gundê wan, hinekan digotin, ew daket binxetê ji ber ku warê wî lê ne hat! Û hinekan jî digotin, ji ber dê û bavê xwe bazda, ji bo ku ji wan cihê bibe! Û hinekan jî digotin, ew bindestê jina xwe ye, jina wî bibêje çi, ew nabêje na! Lê Gênco û Seyro tenê zanî bûn ji ber çi dev ji welatê xwe berdane û çûne biyanîtiyê. Li Amûdê jî tukes bi esl û feslê Gênco nizane, loma jî hemûyan jê re digotin «Gêncoyê mihacir», yan jî «Gêncoyê kurdunde»

Çend salên pêşîn Gênco bi wan quruşên ku bi xwe re hanî bû, îtarî dikir. Dûre zêrên Seyro firot û pê dikanek biçûk vekir. Ji wê çaxê de heta niha, gelek sal derbas bûn, gelek tişt hatin guhertin. Dikan berê biçûk bû, dûre mezin bû, dûre dîsa hat ser hev... lê jiyana Gênco û Seyro tişt jê ne hat guhertin. Her roj sê danan Seyro radihêje firaxên ji xwarinê dagirtî û di nav bajêr re diçe cem mêrê xwe û piştî teqnekê firaxên vala vedigerîne malê.

Li ser mala Hecî Gênco, niha gelek tişt tên bihîstin, lê piraniya gotinan li ser zimanê wan tên kirin, bêyî ku haya wan jê hebe. Ew bi xwe, mîna hundirekî girtî ne, kêm li ser halê xwe dipeyivin, kêmgazin in... Piştî ku Gênco halxweş bû, çû Hecê, ji deriyê camiyê û dikana xwe pêve pêl tu deran ne dikir. Merovekî bêmervan e, ne di xêr û ne jî di şerê xelkê de ye.

Berê hersal havînê diçû Heleb û Şamê, cil û caw dihanî. Dikana wî xemilandî û tim dagirtî bû. Rihela ku ji dikana wî bihata kirîn, rihel di ser re tune bûn. Lê van salan hertişt hat guhertin. Sehet, nema wek ya berê ye, hal ne ew hal e, dikan jî ne ew dikan e. Xelkê bêgane ku di ber dikana wî re derbas dibin, dimînin ecêbmayî. Dikaneke mezin, vala, heciyekî salmezin bi kum û koloz tê de bawişkan vedide. Hecî bi xwe vê yekê zane, zane ku kenê miriyan jî pê tê. Lê destê wî bi carekê re ji dunyayê û ji malê dunyayê nabe. Tu dibêjî qey bi rûniştina xwe ya di dikanê de, emrê xwe û dikana xwe dirêj dike... Ruh şêrîn e û malê dunyayê jî şêrîn e!

Havîneke germ e, bi wexm e û bi ecac û toz e. Tu dibêjî

qey ecacokê mala xwe nas kiriye û xwe li ber deriyê dikana vala vemaltiye. Lê kî dizane ji kuderê radibe û li kuderê zîz dibe? Hinek bênderên nîskê xwe didêrin, hinek refikê dikanên xwe paqij dikin, hinek rihelan dikirin... Hecî Gênco jî di vê demê de tim dibîne ku toz li ser refikên dikana wî radibe... Gelo li ber çavên wî tê sêwirendin, yan tûmana waca nava wî ye?.. Ew ji çi be jî, Hecî nema di xwe re dibîne topên cil û cawên xwe paqij bike. Hêdî hêdî rengê wan têne guhertin, dirizin...

Hecî hêdîka xwe da ser gopalê xwe, bêhnekê li cil û cawên xwe yên kevin nerî, lê di xwe re ne dît ku toza ser wan paqij bike. Bi dengekî nizm di ber xwe de digot:

- Nema hêja ye, divê ez êdî nêzîkî Seyro rûnim, payîza emr e!

Halê Hecî van rojan xerab e, diponije, dikuxe, tayê digire, lingên wî nema wî hildigire. Gava xwe dide ser gopal, bêhnekê radiweste, direhile. Îro, bi zorê ji ser kursiya xwe rabû, di ber xwe de dûa kir, entîn pê ket û bi halekî xerab xwe giyand malê.

Havîneke germ e, bi ecac û toz e. Wexmeke wilo nayê bîra Gênco ku di jiyana xwe de dîtiye. Hundir nayê tehmûl kirin û ji derve çavên saxlem jî ber xwe nabînin. Wê rojê Seyro zanî bû bê fêde ye ku livînan li ser banî dayne, «Ew ê mişt toz û ecacok bibin...» Gava Gênco gêhişt devê derî, Seyro berî ku tu gotinan jê bibîhîze, pê re rabû, destê xwe xist binçengê wî, bê his û deng alîkariya wî kir ku sola xwe dayne.

- Hecî malavawo, ka em ê doktorekî bixwazin?!

Hecî hêdîka di bin çavan re bi dilovanî li Seyro nerî, te digot qey dilê xwe bi Seyro dişewitîne. Weke deqekê bêhna xwe girt, dûre nefeseke kûr kişand... Di wê deqê de Hecî hemû êşa dilê xwe ji bîr kir û bi temamiya xwe kete xema îş û qedera Seyro. Di wê deqê de, ma çi hat bîra wî û çi ne hat, te digot qey di vê deqê de, salên dirêj, şev û rojên emrê xwe yên bi Seyro re buhurandî, temam anî ber çavên xwe. Teqnekî ma bê deng, di pê re bi gazinî got:

- Seyro... na! Ne hêja ye, êdî dereng e... Karê ku Xwedê bi-

ke, meriv nikarin betal bike... Lê tu Seyro... Sey...

Gênco di jiyana xwe de gelek caran Seyro xeyidandiye, dilê wê hiştiye, lêxistiye... Carekê beriya ku dikana xwe veke, gava hîna îtarî dikir, ereba xwe ya tek li ber derî sekinandi bû, lê Seyro pê ve ne hati bû. Wê çaxê Seyro di ser bendê re li daweteke cîranan dinêrî. Dîlan geriya bû, xort û keçikan destê hev girti bûn. Seyro jî qet li xwe danedihanî ku bêyî mêrê xwe têkeve dîlanê, yan jî here dora govendê û bisekine. Wê tenê di ser bendê re sebra xwe dihanî, dinêrî. Gênco jî, ji qestî deng bi xwe ne xist. Xwest bizani be ka Seyro bêyî wî çi dike. Gava wî Seyro di wî halî de dît, yek ne kir dudu, hema bi qamçiyê hate Seyro. Ji lêxistinê hişt ku ji ser hişê xwe here. Dûre Seyro heftekê derneket derveyî devê dêrî, laşê wê, dêmê wê, reş û şîn bû bûn. Ew ne cara pêşîn bû û ne jî cara dawîn bû ku Gênco li Seyro dixist. Lê herduyan jî, riza xwe bi hev dihanîn. Tiştek bê yê din ne dibû. Gênco zanî bû ku Seyro jina malan e û «Sitûneke zêr e di mala wî de» û Seyro jî, xwe bi xwe digot: «Zilam serkar e, jin bindar e.»

Niha devê Hecî nema digere ku tiştekî ji Seyro re bêje. Zane ku wê ew gelekî tehemûl kir; wê sitûna mala wî ragirt û mal jê re çêkir. Lê malê dunyayê çi ye, xwezî her tişt weke peran bihata û biçûya.

Hecî Gênco di xwe difikirî... salên dirêj, xweşî û nexweşî,... jiyana xwe giştî tîne bîra xwe, çavê wî dikutkutin, tên girtin û vedibin Seyro her û her di mêjiyê wî de ye.

Seyro nema zanî bû bê çawa bike. Rabû livînê Hecî rast kir, destekî xwe da ber pişta wî û bi yê din jî gopal da dest:

- Hecî, ka rabe têkeve nav ciyên xwe, tu ê li ser kulêv hişk bibî!

Bi teqla ku Hecî xwe xiste nav ciyan, Seyro lihêf kişand ser. Lê çavê wî hema zûq li Seyro dinêrîn. Gelek êş û kulan dixwaze ji Seyro re bêje... lê Seyro tu dibêjî qey di dil de ye, naxwaze Hecî bêşe û keseran hilîne. Xwest ku Hecî bêhna xwe bîne ber xwe û rehetiya xwe bistîne.

- Hecî, ma te tiştekî giran hilgirt, ya te çi kir wilo hat serê te?

- Keçê payîza emr e! Ma çi bikim?.. Ev sê meh bûye ku min destê xwe ne daye topên caw, ez hilnekişiyame ser nêrdewanê, min toza wan jî paqij ne kiriye! Qeder hatiye... Seyro... qeder!

- De bes xwe bitirsîne, Hecî, niha qedehek çay vexwe, tu ê xwêdanê bidî û rihet bibî!.. Ma madê te naçe xwarinê, min hinek pincar çêkiriye?

Hecî Gênco, bêhnekê bêdeng ma. Seyro sêniya pincarê anî, danî ber. Lê zanî bû ku Seyro ji darekê ketiye, di xema seheta wî de ye... Seyro destê xwe danî ser eniya wî û dûre danî ser destê wî. Hecî destê xwe yê din, ji nav lihêfê hêdîka kişand û hêdî hêdî destê Seyro xist nav herdu destên xwe û bi hemd serê xwe ber bi wê bir, bi nerîneke nerm lê nerî, dîsa çavên xwe girt û ket mitalan.

Erê ji zû de ye... kê zanî bû ku zeman, dem û dolab ê weha bigere. Û Gêncoyê delalî ê li biyanîtiyê, di dawiya emrê xwe de, ji merivên xwe kesî li ber serê xwe nebîne. Serxet li ku û binxet li ku! Ji hevalê wî yên kevin, li binxetê, ji bilî Mele Mehmed kes ne maye, ew jî li Qamîşloyê ye. Kî ê bişîne pey? Lê, ma ku ew jî bê, ew ê çi bike? Tenê ku yasînek li ser min bixwenda, hema ez fetîs neçûma?

Hecî çavên xwe vekir û bi nazikî ji Seyro re got:

- Seyro, tê bîra te, kê mara me birî?.. Rehma Xwedê lê be, Mele Îbrahîm, bavê Mele Mehmedê tacir, niha li Qamişloyê ye. Xwezika çavê min lê keti ba, hema weke min merivên xwe gişt bidîta! Rehme li bavê te be Seyro, tu ê sibe ji hinekan re bêbêjî, yên ku diçin Qamişloyê, bira ilm bigihînine wî, ew texsîr nake, heger karê wî gelek tune be, ew ê were. Bila jê re bêjin; destbirakê te nerihet e!

Hecî dîsa xwe ker kir. Çavê xwe girtin, lê destê Seyro her di nav destên wî de ma.

Ji cerga ku Mele Îbrahîm mara wan biriye, heta niha, ji bilî wê, ji kesekê hez ne kiriye, kes jê bêtir pê re ne westiyaye; hejartî pê re ne dîtiye. Erê gelek sal derbas bûn, gelek tişt jî hatin guhertin, lê Seyro ma Seyro. «Ez ê wesiyetnama xwe ji cîranan re bêjim, bila tenê ev keser bi min re nere gornê!»

Sê roj derbas bûn halê Hecî Gênco roj bi roj xerabtir dibû. Ji xwarinê bi carekê re qut bû, rojê carekê Seyro bi zor qetek qimerdîn nerm dikir û gulpekdudu bera qirika wî dida, wexta limêjê jî, Seyro destê xwe dida pişta wî û wî rûniştî limêj dikir. Lê van rojên dawîn bi vî awayî jî nema kari bû limêj bikira, hema dirêjkirî fatîhe û şehadeta xwe dixwend.

Gava ilmê nexweşiya Hecî Gênco gêhîşt Mele Mehmed, wî ji ber xwe ve nameyek ji merivên wî yên serxetê re nivîsand û da yekî qaçaxçî ku bigêhîne gundê wan. Mele Mehmed di namê de weha nivîsandi bû. «Hecî Gênco di xeterê de ye, li ber mirinê ye, zû xwe bigêhînin ser. Mal û milkê wî û dikana wî ê bi xelkê bimîne, ecele, ecele, divê hinek ji we bi ser de bên!» Û ji ber ku Mele Mehmed zanî bû ku heta niha merivên wî carekê jî ne hati bûn cem wî, navnîşana xwe li jêrî namê danî.

«Tûmayî birakuj e!», ne sînoran nas dike ne kuştin û ne bombe, tiştek nikare wê kêm bike... Pere, qirêja dunyayê ne, merivê ku li wan bigere tu sînor jê re tune. Qirêj li ku derê be, xwe lê digire. Meriv jî bê qirêj û bê gemar çênabin!.. Ewqas sal çûn û hatin merivên Hecî Gênco lê ne pirsîn. Ne dixwestin rûçikê merivê kurdunde bibînin, ditirsiyan ku bela wî li wan jî keve. Û niha jî qirêj di merselê de ye! Gava bihîstin ku merivê wan dike bimire û ji bilî kevnejinekê kesek ê li şûna warê wî nemîne, giştan xwe dan hev, yekî berî yê din xwest xwe bigêhîniyê. Çar pênc roj derbas ne bûn, qeflek merivên Hecî Gênco xwe dan ser hev û hatin li mala wî rûniştin, seetên jiyana wî dijmartin. Her yekî ji wan, tiştek di çav xwe re kiri bûn. Hinekan çavê xwe berda bûn xanî, hinekan perê hişk, hinekan dikan û hebûn, tew hinekan nêta xwe li jina wî jî xerab kiri bûn.

Du rojê mêvanan qediyan, Hecî Gênco dikira ji kêf û eşqa merivên xwe, ji nav livînên nexweşiyê rabûya. Û kî dizane, belkî rihet jî biba! Lê mêvanan ecele kir, li wan dereng ket. Hinekan hesabê xwe û du sê rojan tenê kiri bûn! Rojekê veşartin, yekê hejandina xêrê, ya sisya ji bona eyb û arê dunyayê, diviya bû li şûna wî bimana û di wê rojê de jî, tiştên nayên hil-

girtin bifrotana û vegeriyana mal.

Roja sisiyan, Mele Mehmed karê xwe û çûna mal kir. Bi laqerdî ji Hecî re got:

- Birako, te çav li merivên xwe xist, nema êdî mirina te heye, bi Xwedê tu roj bi roj li xwe zêde dikî!

Birayê Hecî Gênco yê mezin Xelo, wê çaxê bi qerfî got:

- Mele Mehmed, ku ne ji te ba, bi Xwedê me rê jî ne dihanî ser mala Hecî, de ka her em hatine, em ê îşev jî bi hev re şevbihêrka xwe bikin, heta sibê Xwedê mezin e!

Mele Mehmed qanî bû û wê şevê jî ma. Êvarê piştî şîvê, Hecî Gênco, te digot qey çavên xwe kil kiri bû, şewq ji dêmê wî diçû. Heta navê, di binê lihêfê de, ji navê û berjor jî şip li qûn rûniştî bû. Bi mirûzekî xweş û devliken bi mêvanan re xeber dida:

- Bi xêra hatina we û berketa dîtina we, Xwedê hêzeke nû û teze xiste nav laşê min. Ewqas sal û zeman bihurî, me hevdu ne dît. Kî dizane, gelo heye carek din em hevdu bibînin yan na? Her hûn hatine, ez ê wesiyetên xwe li we bikim. Serbilindiyeke mezin bû ku hûn di sf r sînoran re hatin, we jiyana xwe xiste bin xeterê ku hûn min bibînin. Mervatî heqê we, hûn ji wir heta vir di ser serê min re hatine. Ez ê îro gotina xwe ya dawîn ji we re bêjim! Mele Mehmed jî, ne xerîb e, me biçûkaniya xwe bi hev re qedandiye, ew jî weke pismamekî me ye.

Do û pêr ez bêkêf bûm, min nikarî bû bi we re xeber bida, min tenê li we guhdarî dikir. Şikir, El-hemdû lîllah, hûn bûne eşîrek, halê we xweş e, gişt xwedî mal û jin û zaro ne. Lê yê min, Xwedê ev sosirmet bi serê min de anî. Şikir dîsa ji te re ya Rebî, ziriyeta me maye! -Hecî destê xwe ber bi jor vegirt-

Hecî Gênco hebekî rawestiya, kesereke kûr kişand û dîsa gotinên xwe berdewam kir:

- Mele Mehmed, -berê xwe pê de kir- hêvî û rica min ji te ew e ku tu wesîyeta min li cem xwe binivîse û ji bîr neke!

Mele Mehmed bi teqil û dilovanî lê vegerand û got:

- Tişt nabe Hecî, va ye komek merivên te rûniştine, Xwedê li ser her gotineke te be, ew ê wilo bên cî!

- De baş e, Mele Mehmed, merivno! Ez ê îro çîroka xwe ji serî de bêjim... ji serî de: Seyro... Seyro... -Hecî hêdîka ban kir- Rehme li bavê te, tu ê hebekî bi pêş de werî. -Zilaman tevde bi hev re gotin: Seyro, Seyranê, Rehme li bavê te, tu ê dilê Hecî nehêlî!- Seyro hat li nik Hecî rûnişt.

Hecî, wek yekî ku hemû hêza canê xwe û baweriya xwe bide ser hev û giştî têxe ser gotina xwe, got:

- Merivno... wesîyeta min li we... Seyro, Seyro, Seyro... - Hebekî kelogirî bû, kesereke kûr kişand û pêde çû- Malê min... Milkê min... Jiyana min... dikana min... hertiştê min ji Seyro re... hertiştê min... Hertişt!

Mêvan û Mele Mehmed tevde ji darekê ketin! Xelo di ber dilê birayê xwe da:

- Hecî, çi qewimî ye, tu ecelê li xwe dikî. Em komek merivên te li te vehewiyane, Seyro namûsa me ye, em wê bi tu deran de bernadin!

- Na, na... birayê min! Pîrek darê şikestî ye. Dunya gişt li alîkî û Seyro li alîkî!

Mele Mehmed xwe xist nav peyvê:

- Heciyê delal, şerha Xwedê tiştek ne hiştiye, her hesab tê de heye.

Hecî bi bêhntengî lê vegerand:

- Amentû bîl-lah, lê tiştê di navbera min û Seyro de, di navbera tu kesên din de ne buhuriye... Seyro ne sitewr e! Seyro hîna qîz e, qîz e... Seyro QÎZ E! Hîna min ew mar ne kiriye... Hûn têgihîştin, merivno, Seydayê delal?! Hemû malê min li Seyro helal û zelal be, ew çi dike wê bike. Ew... çi... d...i...k...

Çavên Hecî zûq man vekirî, di kortikên xwe de sar bûn... hustuyê wî xeliya, ket ser balgehê... Mir.

## XIJ-XIJONEKO

Min haziriya xwe dikir ku herim Yêrîvanê... Wê êvarê, ez bi tena xwe di oda xwe de rûniştî bûm. Hawirdorî min qaryolên vala ne, kaxezên kovar û rojnaman di hundir de belawela ne. Ez di xwe re nabînim ku wan bidim ser hev û bavêjim. Rûniştime, mitale dikim, deqan dijmêrim... wexta derketinê ê kengî bibe ku xwe bigêhînim trênê. Tiştek di bala min de tune ji bilî Yêrîvanê, «Rêya Teze», «Radiyoya Kurdî»! Vê yekê jî, ne dihişt ez baş bala xwe bidim ser pirtik-mirtikê dora xwe, weke bi rûsî jî dibêjin: «Hewasa mêvanan girêdayiyê çentan e».

Ûnîvêrsîtê kaxeza qebûlkirinê daye min: Divê ez mehekê sax, di rojnama «Rêya Teze» de kar bikim, wekî bêm jimartin ku min «praktîka xwe bi cî anî», lê dilê min natebite: Meheke sax... perê kêm... bajarekî nenas!... Erê, hat û ez li wir bê pere mam, wê çi bi serê min bê? Weha carina ji xwe re dibêjim û difikirîm. Min bê sûc û sebeb ev karê zêde ji xwe re çêkir. Ma

min jî weke hemû xwendevanan praktîka xwe di rojnameyeke bajarê Moskvayê de bikira, ne çêtir bû? Çi lazim e ev serêş û ev dewxa ha?... Carina dilê min weha ji min re digot û ez kerr û gêj dibûm... Lê kî yê vê hesretê ji dilê xwe derxe? Kê ji min bêtir dixwest kurdê Sovyetê bibîne, bi wan re bipeyive?... Tewkelî bi Xwedê, hema çi dibe bila bibe! Bêyî serêşan û zehmetiyan dunya ji çi re ye?! Ji ber van ramanan, beriya ku ji mal derkevim jî, min ji hevalekî xwe re li têlê xist, wî hevalî bêhna min fire kir û bi bawerî ji min re got:

- Xeman nexwe, heger tiştek ji bo te pêwîst be, ji min re li têlê bixe, an jî namekê bişîne, ez li ber te me!

Dawiya êvarê, endîşa min hat birîn. Nema tu fikran dikim. Min bilêta xwe berî rojekê kirî bû, ketim trênê, tu li ku û Yêrîvan li ku! Rê dirêj e, ji Moskvayê heta Yêrîvanê nêzîkî 70'ê seetî dom dike û sefer jî zehmetî ye, lê xweş e.

Çend seetên pêşîn derbas bûn, hêdî hêdî bêhna min vedibû. Min çend merivên dora xwe nas kir, bi wan re ketim gotin û galegalê. Piraniya wan ji bajarê Yêrîvanê bûn, ji min re behsa dîroka bajêr, jiyana wî ya teze, comerdiya binêlê wî û sipehîbûn û xweşikbûna avahiyên wî dikirin. Gotinên wan merivan, hinek fort û payebûn jî tê de hebû, lê dihiştin ez bidim ber hev, du şiklê rengoreng: Şiklê Yêrivana birîndar mişt kul û xem di dîrokê de û şiklê wê yê teze ku min hîna ne dîtiye; yê weke di pesnê dengbêjê kurd de, Aramê Dêkranê ku bi xwe ermenî ye, dibêje: «Gul şêrînê Hayestanê, bûka salê Yêrîvanê».

Di trênê de wext giran diliviya. Min û xelkê bi min re, me di oda fargonê de wext bi pirs û bersivan derbas dikir. Me serî ji hev kiri bû, lê em ji gotinên hev têr ne dibûn. Wan ji min, li ser jiyana ermeniyên welatê me dipirsîn, min jî li ser kurdên Ermenîstanê. Gava dibû wexta xewê, me şevxweşî li hev dikir, ronahî vedimirand, lê xewê zû bi zû ne digirt ser çavê min. Tim û tim di mitalan de me... Seetekê berî seetekê bigêhêm Yêrîvanê, redaksiyona «Rêya Teze» bibînim, xwe bi cî bikim û serîkî jî bidim Radiyoya kurdî!

Êvara dawîn, rê gelekî bi min tade hat. Ez qerimî bûm, ço-

gên min nema dişuxulîn. Me nêzîkayî li Yêrîvanê dikir, lê bîranînên dûr û kûr nav cergê min de dikewgirîn, weke şîrqeşîrqa lingên trêna ku di binê me de, tiştê dûr û nêzîk digêhîne hev, wê bîranîna min jî dihişt ku ez dûr û nêzîk bifikirim:

***

Di pêşiya dehsalên 60î de bû. Ez wê çaxê biçûk bûm, şeş heft salî bûm û radiyoya tranzîster li gundan pir kêm bûn. Li gundê me yek tenê hebû. Carekê, êvarê, hîna tarî baş ne keti bû erdê, gundiyên me li dora wê tranzîstorê civiya bûn, li radiyoya Yêrîvanê guhdarî dikirin... Geh sitran, geh axaftin... heta kutasî hat. Gava spîkerê radiyoyê gotinê xwe yên dawî gotin: «Programa me îro xelas bû, de ma xatirê we!», gundî bi carekê re kirtînî ji wan ne hat. Heger te derzî bavêta, ew ê dengê wê bihata. Her yek ji wan di ciyê xwe de melisî û di ber xwe de difikirî, heta yekî bi pirs û kenê xwe ew bêdengî birî:

- Hûn ji min re nabêjin gelo, ev bêbav çawa giyaye wan derina?

Berê tu kesî deng ne kir, lê te digot qey xortekî bi xwe naxwoş anî. Wî bi hêrs got:

- Apê delal, ev merivê ku di radiyoyê de dipeyivî, ne bêbavekî ji van deran e, ew ne ji Qamişloyê ye, ne ji Amûdê ye. Cî û warê wî, wir e; ew li wir çêbûye, li wir mezin bûye û li welatê xwe di radiyoya xwe de kar dike. Kurd li Ermenîstanê û li Sovyetîstanê gelek in, ew li wir zimanê xwe dixwînin, pirtûkên dibistanê bi zimanê wan derdikevin!..

Hîna yê xort gotina xwe ne biri bû serî, zilamekî din pirs kir:

- Gelo hûn ji min re nabêjin, ew jî weke me musulman in, yan kafir in?

Diyar bû ku xort nikarî bû bersiva wî bida, wî devê xwe tev bir û anî, lê yekî din gotin ji ber girt û got:

- Kuro, çima we bi serê hev girtiye û hûn dikevin qirika hevdu? De ka werin vê xij-xijoka radiyoyê bişkînin û ji mêrik bipirsin, bê ew ji kuderê ye, çi eslê wî ye, musulman e yan kafir e?

Ji nû ve bû bêdengî... te digot qey hinekan yeqîn kir û hi-

nekan ne kir. Lê yên ku yeqîn ne dikirin, mecalên wan tune bûn, nikarî bûn gotinên xwe bi cî û war bikin. Wê çaxê yê xort, qeherî, bi xeyd rabû ser xwe, dev ji civatê geriya û çû. Gundiyan wê rojê qirik li hev qetandin. Her yekî ji wan tiştek digot: Hinekan digotin: Dengê wî weke dengê filankesê, filankeso ye, yê ku bîn û berata wî ji zû de qut bûye; û hinek jî, her li ser ya xwe man û digotin: Evana, miheqeq şeytanên biçûk in û di van sindoqên biçûk de dikin xijexij; geh dikenin, geh digirîn, geh distirên û dipeyivin! Û ji ber vê yekê, guhdariya wan jî heram e!

Ez jî wê çaxê biçûk bûm, min çi bibihîsta, dixist serê xwe; lê piştî wê civatê min guhê kalikê xwe qul kiri bû. Gav û seet min jê pirs dikir. Li ser van kesên di radiyoyê de dipeyivin. Tim jî, min jê dixwest ku min bibe cem radiyoyê, li sitranên kurdî guhdarî bikim. Carekê wî bi henekî ji min re got:

- Emir qesifyo, xij-xijoneko! Ev cilê we, hûn mezin bibin, hûn ê dunyayê li ser serê me xera bikin... Tu wilo distirê, hawê radiyoyê dibêjî, ez ditirsim tu mezin bibî, tu ji dest me derkevî, bigêhêjî van bê îmanên ku di radiyoyê de dipeyivin.

Erê... Wê çaxê ez biçûk bûm, min nizanî bû meriv çawa bikari be here welatê ku bi kurmanciya sor di radiyoyê de distirên, dipeyivin, henekan dikin... Ma kê wê çaxê dizanî bû ku ew ê qismetê min çê bibe û ez ê wan deran bi çavê serê xwe bibînim?... Lê va ye ez li ser rê me... derim Yêrîvanê... ciyê xij-xijoneka ku xeyala min bi demeke dirêj li ser qut ne dibû.

***

Roja sisiyan ji seferê, ez gêhîştim Yêrîvanê. Pêre jî, benê endîşa min hat birîn û rawestiya. Hinek ji meremên min hatin cî. Pirsa ku pê hati bûm jî, Xwedê li hev anî. Min bi dehan xort û keçên kurdên Sovyetê jî nas kir. Li gundên wan geriyam. Min nasiya xwe da gelek şaîr, nivîskar, rojnemevan, zana û ronakbîrên kurd, yên ku şopa xwe li ser ruyê çand û wêjeya kurdî hiştine. Dostê min çêbûn, di radiyoya Yêrîvanê de jî. Wan dostan carekê ji min xwestin ku dîtina xwe ya li ser Yêrîvanê, ji guhdarên radiyoyê re bi lêv bikim, min jî qebûl kir.

Gava li ber mîkrofonê rûniştim, min kesereke kûr kişand...

û dibe ku hinekan ji karkerên radiyoyê, wê çaxê bi manake din fêm kirin, lê min wê çaxê gotinên kalikê xwe anîn bîra xwe: «Emir qesifyo, xij-xijoneko!» û hema tune bû ku kela dilê min, bi hêsran der biba, lê ji şermê, min xwe girt. Min qoziya çavê xwe paqij kir û dest bi gotina xwe kir: «Êvara we bi xêr û dema we xweş be gelî guhdarên hêja û delal! Ez filankes im, (!) ji filan gundî me... Gelek silavê min li we hene... Ez silavê xwe dişînim ji dê û bavê xwe re... Ev der Yêrîvan e... Gelekî xweş e!... De ma xatirê we, heta dîtineke nêzîk!»

Min gotina xwe xwend lê dilê min ne tebitî, gelo heye hinekan ji guhdaran silava min venegerand û texmîn kirin ku ez jî «Xij-xijonekek im di radiyoyên wan de û wan dixapînim?!»

# REDWANÊ ALÎ KÎ YE

Redwanê Alî, di sala 1955an de li Cizîra binxetê ji diya xwe dibe. Heta sala 1972an xwendina xwe ya pêşîn û lîseyê dike. Dûre sê salên di navbera 1973-1976an de ji alîkî ve li Ûnîversîta Şamê, beşa Huqûqî dixwîne û ji aliyê din ve jî mamostetiya dibistanên hinek gundên Cizîrê dike.

Piştî demekê diçe Yekîtiya Sovyetiyê û li wir şeş salan 1977-1983 li Moskvayê, Fakûlta Rojnamevaniyê dixwîne û bi awayekî serbilindî dîploma xwe ya rojnamevaniyê bi dest xwe dixe. Heta sê salan jî 1983-1986 di warê rojnamevanî û torevaniya kurdî de xwendina xwe ya doktoratiyê dike.

Piştî doktora xwe ya rojnamevanî û torevaniya kurdî, Dr. Redwanê Alî ji sala 1987an û vir de li Fransayê dijî. Kar û xebatên ku Redwanê Alî di warê çand û torê de kiriye, ne hindik in:

* Ji dîroka pêşveçûna rojnamevaniya kurdî (teza doktorayê) 1986, bi zimanê ûrisî.

* Cîgerxwîn, neynika jîyana gelê kurd e, (birişûr) 1986, bi zimanê erebî.

* Pirtûka Zinar Silopî (Qedrî Cemîl Paşa), «Fî sebîl Kurdistan» ji zimanê ûrisî wergerandiye zimanê erebî 1987.

*Weşanên Welat*

*Pirtûkên ku derketine*

**KEÇA KAPÎTAN**
**A. Pûşkîn**
*roman*

*

**MIRINA KARMEND**
**A. Çêxov**
*kurteçîrok*

*

**ARDÛ**
*Ji kurteçîrokên gelêrî*
**Nivîsende: Hesenê Metê**

*Pirtûkên dê derkevin*

**MERIVÊN REBEN**
**F. Dostoyevskî**
*roman*

*

**SMIRNOFF**
**Hesenê Metê**
*Kurteçîrok*

*WEŞANÊN WELAT*



6 Wan e ew xelkek in û zimanê wan hemûyan yek e, û
tiştê ku ew dixwazin bi ser kevin jî ev e; ji vir û weha her
çi tiştê ku wan dil hebe û bikin, bila rê li ber neyête
girtin. 7 Werin, em dakevin, ji bo ku ew serwextî zimanê
hevdu nebin, li wir em zimanê wan tev li hev bikin.

TEKVÎN 11: 6-7